

# folklora kurdan

Zargotin zêrgotin e,  
Zêrgotin zorgotin e!

Sal: 2  
Hejmar: 6  
Nîsan  
Gulan  
Hezîran  
2016



KURDÎ-DER  
NAVEND



ŞARÊDARIYA BAJARÊ  
MEZIN A AMEDÊ



9-A

Yusuf  
Allan

Elî Tico

**Kovara Folklorê ya  
Sê Mehane**  
Sal: 2 Hejmar: 6

**Xwedî:**

Li ser navê Şaredariya  
Mezin a Amedê,  
Gultan KIŞANAK

**Edîtor:**

Eşref KEYDANÎ  
Ronya BEWRAN

**Redaksiyon:**

Ridwan DÎZMAN

**Berpîrsa Nivîsan:**

Zeyneb YAŞ

**Desteya Weşanê:**

Mahpûs SERHEDÎ  
Şemsa ÎLBAŞ  
Weyî ARCAGOK  
Asmîn ÜYANIK  
Mem MUKRÎYANÎ  
Jêhat ROJHILAT

**Wêneyê Bergê:**

Îskan ALTIN

**Wêne:**



Ferhat ASLAN  
Îskan ALTIN


**Xêz:**

Yusuf ALKAN  
Kawa (Ergin KAYA)



**Têkilî:**

**Navnîsan:** Huzurevleri Mah.  
Doktor Sıtkı Göral Cad. 13. Sok.  
No: 4-1 Kayapınar-Diyarbakır  
Tel: 0530 301 11 53


 folklorakurdan@gmail.com

 kovora folklorakurdan

 kovarafolklorakurdan

**Her nivîskar ji nivîsa xwe  
berpîrsiyar e.**

**Çap:** Gün Matbaacılık  
Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Kü-  
çükçekmece İSTANBUL  
Tel: 0212 580 63 81



- 3 Ji Edîtoriyê
- 4 Mît û Efsane, **Ridwan DÎZMAN**
- 12 Gotinên Ser Mehan, **M. Emîn HEZER**
- 13 Di Zurekerî, Kundire û Lên, **Ugur SERMÎYAN**
- 14 Pisîk û Gavan, **Weysî ARÇAGOK**
- 16 Tenûr, **Erdogan UÇAR**
- 20 Fatima Îsa, **Zeynep YAŞ**
- 24 Dewrêşê Şêx 'Evdî, **Seidê ÛSIV**
- 39 Tay Zewtî Hêni ra, **Weysî ARÇAGOK**
- 40 Mîqo, **Mahpûs SERHEDÎ**
- 47 Werdene, **Surya HÛMAN**
- 48 Dawetên Herêma Mûşê, **Ozan AKTEKÎN**
- 52 Paşa û Dizd, **A.Hamit ŞALO**
- 55 Sersal, Bîra Me ya Hîn Neçikayî, **Eşref KEYDANÎ**
- 64 Gulê Dêran, **Fadil BOTAN,**
- 68 Islahkirina Gurê Hov, **Sidîq GORÎCAN**
- 69 Serhildana Xanê Kelmişî, **Şoreş REŞÎ**
- 72 Mebêje Heywan e, bê Zar û Ziman e, **Bahoz BARAN**
- 74 Heso û Beso, **Yasemîn ELBAN**
- 77 Hin Dua Ji Meşketankê, **Mem ARTEMÊT**
- 78 Rovî û Pîrê, **Asmîn ÛYANIK**
- 81 Çîrokên Navlêkan 5, **Mem MUKRÎYANÎ**
- 89 Sê Qewlêrk, **Enes MEÇÎN**
- 90 Sê Lîstik, **Nuredîn VURAL**
- 92 Rovî, Bet û Ker, **Wîldan SEVÎM**
- 93 Sêva Mêxekrêj, **Beroj MUKRÎYANÎ**
- 96 Terzî, Marangoz û Mele, **Onder DEMİRASLAN**
- 98 Newala Çorî, **Ozlem EKÎNBAŞ**
- 101 Kilama Osê Husên Axa û Bedewê, **Mahmut YUCEDAG**
- 104 Bersivdank



## *Dostno.*

Bi xêr û xweşî be, emrê me bihareke din jî dît. Me navê, em bi gotinên dûr û dirêj serê we ezîzan biêşînin. Jixwe pêşîyan ji me paşîyan re tiştek nehiştiye.

Karê me ew bû em li ser soza xwe bimînin û kovara we derînin çiku em li ser şopa wan pêşîyan in. Wan gotiye; heywan bi bend, meriv bi qisê tên girêdan. Em jî li ser qîsa/soza xwe man.

Bila îcar hindik û rindik be.

Ji ber qehr û qotikên dinyayê, di dilê me de cî ji gotinê re nemaye. Em ê guhê xwe bidin gel û xatir ji we bixwazin bi vê sêxiştiya Xoresanê.

Dilê minê têr û tiji,

Natê ewran degurmiji,

Hêstir tune ew biriji.



Peyva mît ji zimanê Grekî ye, awayê wê yê resen “mîtos” e, û tê wateya “gotin-galegal”ê. Ji hêla Heredot ve ev peyv wekî têgeh hatîye bikaranîn û wisa hatîye pênasekirin: “Gotinên ji hêla dîrokê ve, bênirx û biguman”. Platon jî gotîye: “Mît; çîrokên derew, nerast, vala û qerfî ne”

### Destpêk

Mît û efsane xwedî bandoreke mezin û girîng in li ser gelên cîhanê û gelê Kurd. Di nav folklor, çand, bawerî, ol û civaka Kurdan de nîşan û şopên mît û efsaneyan, mirov dikare bi hêsanî bibîne. Bawerîyeke Kurdan heye ku çî Misilman be, çî bawermendê oleke din be, li her dera Kurdistanê mirov rastî şopên vê bawerîyê tê. Di civaka Kurdan de heke mirovek avê bi ser êgir de birijîne her dibêje; “bîsmîla, bîsmîla, bîsmîla...” gotina “bîsmîla” bi Erebi ye û gotineke pîroz a ola Îslamê ye. Herwiha di bawerîya Îslamê de agir ne pîroz e û tu rêzikeke wisa tune ye ku Misilman wisa şev bigerin. Çavkanî û koka vê mînakê berçav û belavbûyî digihîje mîtên Arî. Ji van mîtên qedîm ên Kurdan berîya van an piştî van ol, efsane, tore, ravêj û rêgezên civaka gelê Arî û herwiha di bin banê gelê Arî de yên gelê Kurd çêbûne.

Mît di netewebûna gelan de xwedî rol û peywîrên girîng in, efsane jî ji vê yekê feyzê digire û li gor van taybetîyan, kesayet û karaktera gelan dîyar dibe.

Em ê di vê gotarê de qala mît û efsaneyan bikin. Xebatên derbarê vê çûre û zanistê de parve bikin. Têkilîya wan û folklorê bikolin û fikrên zanyaran bidin ber hev û nîqaş bikin. Mînakên mît û efsaneyên Kurdan di nav dabeşkirina mîtan de bi cî bikin û pênaseyên wan li gor agahî û nîqaşan çêkin. Ji ber tevîhevîyan em ê mît û efsaneyê bidin ber hev û li têkilîya wan bikolin.

Em dema vê gotarê amade bikin, wekî çavkanî berê xwe bidin çavkanîyên derheqê civaka Êzîdî, Yaresan, Zerduştî û hwd de hatine nivîsîn. Ji xebat û pirtûkên derheqê van civakan de hatine

kirin û nivîsîn, sûdê werbigirin. Em ê herwiha berê xwe bidin çavkanîyên derheqê pêşiyên gelê Kurd ên wekî Arî, Med, Hûrî û hwd. de hatine nivîsîn. Bi vî awayî em ê hewl bidin ku cîyê Kurdan di nav mît û efsaneyan de peyda û kifş bikin.

## 1. Mît-Mîtoloji

Peyva mît ji zimanê Grekî ye, awayê wê yê resen "mîtos" e, û tê wateya "gotin-galegal"ê. Ji hêla Heredoî ve ev peyv wekî têgeh hatîye bikaranîn û wisa hatîye pênasêkirin: "*Gotinên ji hêla dîrokê ve, bînîrx û biguman*". Platon jî gotîye: "*Mît; çîrokên derew, nerast, vala û qerfî ne.*"<sup>1</sup>

Fuzulî Bayat derheqê mîtan de wisa dibêje: "*Razên gelan bi saya mîtan veguherîne û bûne sîmgeyên mît û nîfş bi nîfş hatîne îro, tiştên têgihîştina wan zor in; ji hêla gel ve bi zimanê sîmgeyan hatine ravekirin.*"<sup>2</sup> Mirovên pêşîn ên gelan xwestine tiştên li derdora wan diqewimin bi saya tiştên dizanin watedar bikin û tê bigihîjin ango bi zanîna xwe Xweda, gîyanên pîroz, bûyerên xwezayî rave bikin. Herçiqas ji zanistên îro dûr xuya bike û mirovan bûyer wekî pîroz û derxwezayî nixandibin jî dîsa xwestine bi mantiqê ve girê bidin. Bi vî awayî em dikarin bibêjin mirov wekî zanista yekem li ser mîtan xebitîne û mîtoloji ava bûye.<sup>3</sup> Ango peyva mîtos û logos ku logos tê wateya zanîne, hatine cem hev û zanista mîtoloji pêk hatîye.<sup>4</sup> Giranî û nîrx mîtên Grekan ji navlêkirinê tê famkirin ku di nav mîtên cîhanê de cîyê wan taybet e.

Bi giştî mirov li ser pênasê, nîqaş û mînakên mîtan hûr bibe, erkên mîtan yê derdikevin pêş ev in: Mît ji hêla mirovên hov, kevin û pêşîn ve hatine çêkirin. Mirovan xwestine tiştên li derdora wan diqewimin rave bikin ku ew bîngê û razên wan tiştan nizanin. Her gelî; tişt li gor xwe, cîyê ku lê ye, tiştên ku rû bi rû dimîne bi rêya mîtan rave kirine. Hêzên veşartî û nikarin rave bikin xistine dirûvê mirov û tiştên dizanin dûre çîrok lê zêde kirine û xwestine bi mantiqê ve girê bidin. Mît ne tenê bi gotinê; bi rêya rît, bawerî, teşe, peyker, reqas û stranên jî hatine çêkirin. Di mîtan de behsa afirandina Xweda, gîyanên pîroz tînin kirin. Di her gelî de netewetî derdikeve pêş û di nav mîtên her gelî de gelê xwedî mît li ser gelên din an pîroz an jî bav û kalên gelên din tê hesabandin.

Bi van erkên mîtan mirov dikare mîtan wisa rave bike. Mît; di demên qedîm ên gelan de, ji hêla mirovên pêşîn ve ji bo li ser xwezayê serdest bin bi rêyên devkî, hunerî û folklorîk li gor rewş, cî, netewe û taybetiyên gelan; ravekirina Xweda, ger-

dûn, cîhan û razan e. Ew zanista li ser mîtan dixebite jî mîtoloji ye.

### 1.1. Mît û Folklor

Wekî ku me li jor dîyar kir mît bi rêyên devkî, hunerî û folklorîk xwe gihandine îro. Bi gotina gellek zanyaran ve jî berhemên herî kevn ên gelan in. Ji ber vê yekê bîngêha gellek cureyên beşên folklorê yan li ser mîtan ava bûne yan jî mît wekî hêman ketine nav berhemên folklorîk. Hin folklorzanan mît xistine navenda teorîyên xwe yê folklorê, hinekan jî sûd wergirtine. Peyrewên birayên Grîmm xebatên wan bi pêşde birine û teorîyeke bi navê "Teorîya Mîtoloji" dane zanista folklorê. Adalbert Kuhn li ser mîtên Hînd-Ewropî xebitîye û li bîngêha folklorê di nav mîtan de gerîyaye û teorîyeke bi navê "Teorîya Pêşveçûna Meteorolojîk a Mîtan" ava kirîye û teorîya xwe li ser bûyerên meteorolojîk ava kirîye. Herwiha Max Muller teorîyeke bi navê "Teorîya Mîtên Rojê" ava kirîye û folklorê bi mîtên rojê re têkildar rave kirîye.<sup>5</sup> Li gor hin folklorzanên wekî Sîr Edward Tylor mît çavkanîya hemû berhemên folklorîk e. Li gor Lord Raglan jî ku ew afirînerê "Teorîya Mît-Rîtuêl" e, mît ji rîtuêlên olî derketine.<sup>6</sup>


Herwiha gellek zanyarên din jî mît ji bo xebatên xwe kirine alîkar û bîngêh. Sîgmund Freud teorîya xwe ya bi navê "Psîkoanalîtîk" li ser mîtên wekî Elektra, Oedîpus û hwd. ên Grekan ava kirîye.<sup>7</sup> Gellek zanyarên wekî V. Propp, M. Meletinskiy, N. Braginskiy xwestine hemû mînakên folklor, hunerên bedew, ol û wêjeyê bi mîtan ve girê bidin.<sup>8</sup>

Gellek cureyên wêjeya gelêrî û cureyên din ên beşên folklorê wekî şanoya gelêrî, destan, çîrok û hwd. wekî amûrên mîtan dixuye. Lê folklorê tiştên ku ji mîtoloji girtine veguherandine hişmendîya folklorê, êdî jî ber ku ew tişt ji mîtolojiyê derketine, bûne folklor.<sup>9</sup>

Mît di nav gellek cure û berhemên folklorîk de carinan dibin hîm carinan dibin stûn û carinan jî dibin alîkar, lê bandora mîtan teqez li ser folklorê heye. Mît di nav bawerî, cureyên wêjeya gelêrî, şanoya gelêrî, jîyan û hwd. de xwedî cîyê girîng e. Ev yek gellek caran dibe sedema tevîhevîyê jî. Wekî mînak mirov têgehên mît, destan, çîrok, efsane, dîrok, rît, bawerî, antropolojî û hwd. tevîhev dike.

### 1.2. Dabeşkirina Mîtan

Mît ji hêla gellek kesan ve curbicur hatine dabeşkirin. Dabeşkirina herî serkeftî béguman ya Stith Thompson e. Stith Thompson di navbera salên 1932-1936'an de berhema xwe ya bi navê *Motif*



*Index of Folk Literature* amade kirîye. Di vê dabeşkirina berhemên folklorîk a giştî de di bin beşa Motifên Mîtolojîk de mît bûne 13 beş û ji bo cureyên mîtan jî hejmar hatine veqetandin. Herwiha ji bo cureyên dê bên peydakirin jî hejmarên vala hatine terxankirin.<sup>10</sup>

Wekî din jî mît ji hêla gellek zanyaran ve jî piranî bi awayê Kozmogonîk, Teogenîk, Eskatolojîk û hwd. tên dabeşkirin. Em li vir dabeşkirina Fuzulî Bayat parve bikin ku wî mît pêşî kirîye du beş; beşên giştî û beşên taybet. Cureyên mîtan ên beşên giştî di nav hemû gelên cîhanê de peyda dibin, lê cureyên mîtan ên beşên taybet di nav hin gelên cîhanê de peyda dibin û di hinan de jî nabin. Beşên giştî di navbera xwê de dibin 4 par û beşên giştî jî di navbera xwe dibin 5 par.<sup>11</sup> Em ê li jêr van beşan rêz bikin û cureyan jî bi mînakên mîtolojîya Kurdan rave bikin.

### 1.2.1. Beşên Giştî

#### 1.2.1.1. Mîtên Kozmogonîk

Kozmogonî îro wekî beşeke astronomî tê zanîn ku ev beş tiştên kozmîk, çêbûna gerdûnê vedikole. Mîtên derbarê afirandina cîhan û gerdûnê de di vê beşê de cî digirin.<sup>12</sup> Mirov dikare van mîtan wekî mîtên pêşîn binirxîne. Li gor hin gelan cîhan û ger-

dûn ji tofanê, ji hêkê, ji avê, ji cendekê Xwedê çêbûne. Ev tişt herçiqas li gor gelan biguhere jî armancên van mîtan yek e û pesndayîna xwedîyê afirîneriyê ye.<sup>13</sup> Di nav Kurdan de li civaka Êzîdîyan, gerdûn ji durê spî çêbûye. Xwedê pêşî dur durist kir, paşê heft melek afirandin ji wekşemê heta şemîyê û ji Ezazîl ango Melekê Tawis dest bi afirandina milyaketan kir, dûre dur pişîkî û gerdûn çêbû.<sup>14</sup> Gellek kes dikarin bibêjin ev yek ol e û ne mît e, lê di bawerîya Êzîdîyan de navekî din ê Melekê Tawis, Ahreman e ku ev Ahreman navekî din ê Angra Mainyu ye ku ev Angra Mainyu di mîteke Îranî de cî digire û sembola xirabîyê ye.<sup>15</sup> Herwiha Ahreman di Avestayê de Xwedayê şer e û wekî dêwan tê sêwirandin.<sup>16</sup>

#### 1.2.1.2. Mîtên Afirandina Mirovê Pêşîn

Piştî mîtên kozmogonîk, gellek caran bi awayekî kronolojîk; erd, esman, çîya, dar û hwd. tên afirandin, ango ji bo ku mirov bê ser rûyê erdê hemû amadekarî tên kirin. Li gor mîtolojîya Gayomart a bawerîya Mazdeîzmê ku gelên Med û Hurrî bawerîya xwe pê dianîn; Xweda Ahûra Mazda, Gayomart afirand. Berîya wî jî ji bo ku wî bi şîrên xwe mezin bikin dewar afirandibûn. Gayomart û Ahreman şer dîkin û Ahreman wî dikuje, lê Gayomart



jê re dibêje; "mirov dê ji min peyda bibin." Û tovên xwe li erdê direşîne. Ji vê derê gihayek şîn tê û ji vê gihayê jî du mirov şîn dibin, navên van mirovan Maşî û Maşanî ne.<sup>17</sup> Sediq Sefîzade Burekeyî dîyar kirîye ku di hîj metnên kevn ên Yaresanan de di dewsa navên Adem û Hewayê, Maşyeh û Maşyaneh hatine bikaranîn, ku li wir jî Hewa ji perçeyeke parxana çep a Adem hatîye afirandin.<sup>18</sup>

### 1.2.1.3. Mîtên Welidînê

Derbarê bingeha gelê Kurd de di Şerefnameya Şerefxan de agahîyek hatîye dayîn. Li gor wê agahîyê li Kurdistanê hukimdarekî bi navê Dehhak hebû ku li ser herdu milên wî mar derketibûn. Herroj ji bo ku Dehak qenc bibe mejîyê ciwanekî didin wî, lê paşê bi mejîyê mîhan wî dixapînin û ciwanan dirvînin çîyan. Ji wan ciwanên revîyabûn çîyê, gelê Kurd pêk hatîye.<sup>19</sup> Herwiha dîsa di mîtolîya Arî de qala Dehak û Ahreman tê kirin, li vir navê Kawa jî derbas dibe. Ahreman li gor vê mîtê dixwaze heyfa xwe ji gelê Arî hilde ji bo vê yekê alîkarîya Dehakê Ereba dîke û ji milên wî du heb maran derdîne, Dehak dîsa li vir jî ji bo ku qenc bibe herroj mejîyê du ciwanên Arî dixwe, lê li gor vê mîtê berevajî mîta Kurda a Newrozê, Kawa Dehak nakuje, bi daxwaza Ahûra Mazda qehremanekî bi navê Ferîdûn ê ji cîsnê Cemşîd, Dehak têk dibe û Keresaspayê milyaket bi fermana Xweda Ahûra Mazda, Dehak dîkuje.<sup>20</sup>

### 1.2.1.4. Mîtên Salnameyê

Ev cure mît bi awayên devkî û şêwazên din qala pîvandî, bikaranîna dem û salnameyên pêşîn dîke.<sup>21</sup> Li gor bawerîya Yaresanan Havenkar heftên afirandin, ango heft milyaket. Ji bo roj û şev, Havenkar herdu milyaketên ku ji çavên xwe afirandibûn, kirin şêr û ga, cîhan jî li ser van bi cî kir û ji enîyên van ajalên du kaseyên birqok derxistin, roj û heyy jî li ser van bi cî kirin. Afirandina Havenkar roja Şemîyê dest pê kir û pêşî Cebrail hat afirandin, ji ber ku afirandin wê rojê dest pê kir roja herî pîroz şemî ye. Roja yekşemê 6 milyaket hatin afirandin. Ji duşemê heta şemîyê herdu alem, cin, perî, dêw û ji xeynî mirov tiştên din hatin afirandin. Afirandina hemû tiştan di 8 rojan de pêk hat. Roja nehan serê salê ango Newroz bûye.<sup>22</sup>

### 1.2.2. Beşên Taybet

#### 1.2.2.1. Mîtên Teogonîk

Ev beş derheqê afirandina Xwedayan de ye. Ev beş bi mîtên Kozmogonîk re têkildar e, piranî derbarê afirandina gerdûnê de li ser peywîrên Xwedayan in. Di van mîtan de qala afirandina van

Xwedayan tê kirin. Mîtên derbarê Xwedayan de herî bi hûrgulî di civaka Grekan de heye ku berîya zayînê di sed sala 8'an de Hesîodos di pirtûka xwe ya bi navê *Theogonî* de qala Xweda û peywîrên wan bi giştî kirîye. Jixwe vê beşê navê xwe ji vê pirtûkê wergirtîye.<sup>23</sup> Di bawerîya Yaresan û Êzîdîyatîyê de behsa Xwedayên cuda nayê kirin, lê di şûna Xwedayan de heman peywîr li ser milyaketan barkirî ne. Dîsa ji bo van milyaketan di hin mîtên Arî de ew milyaket wekî Xweda tînin binavkirin. Herwiha mirov dikare Ahreman mînak bide ku Ahreman di herdu bawerîyan de wekî Milyaket tê binavkirin lê di Avestayê de wekî Xwedayê Şer derbas dibe. Dîsa di Avestayê qala Xwedayê Exretê "Yîma", Xwedayê Şîfayê "Sîyem", Xwedayê Xêr û Qencîyê "Ahorâ" û Xwedayê Adanê "Ard" tê kirin ku hemû xwedî peywîrên cuda ne.<sup>24</sup>

#### 1.2.2.2. Mîtên Etiolojîk

Mirov dikare vê beşê bi Kurdî wekî mîtên Binyadê bi nav bike. Bi gotina Bayat mirov dikare vê beşê di bin beşa giştî de bi cî bike ji ber ku di piranîya gelên cîhanê de ev cure mît peyda dibin.<sup>25</sup> Jixwe armanceke mîtan ev e ku eşkerekirina sedemên qewimîna tiştan e, lewma gellek mît dikevin bin banê vê beşê. Di van mîtan de wekî me got sedem û encamên bûyeran bi mantiqa mîtî, bi hev ve hatine girêdan, hatine zelalkirin û eşkerekirin.

#### 1.2.2.3. Mîtên Eskatolojîk

Ev cure mît derbarê roja Qiyametê de ne. Di bawerîya Yaresanan de piştî afirandina Adem û Hewa, keçeke wan çêbû. Ev keçikê bi navê Anaq bi îblîsekî re zewicî û ji vê zewacê cinawirekî duserî çêbû û heta ku Cebrail hat û ev cinawir kir du perçe, di navbera vî cinawirî û nebîyên Adem de şer dom kir. Piştî duperçekirina Cebrail, perçeyeke vî cinawirî çû piştî çîyayê Kafê û ji perçeya din jî cin û dêw çêbûn ku ev cîns bi navekî giştî "Yecuc û Mecuc" hatin binavkirin. Ev Yecuc û Mecuc ji hêla Îskenderê ku ew reenkarnasyonê Îsrafil bû, piştî Tofana Nuh hatin sekinandin. Perçeya ku bû ejderha jî di roja qiyametê de dê bibe agirê dojhê.<sup>26</sup> Di nav gellek bawerîyan de ji bo roja qiyametê behsa Yecuc û Mecuc tê kirin ku ev nişaneyên roja qiyametê ne.

#### 1.2.2.4. Mîtên Totem

Di mîtên bi vî awayî de pêşîyên gel wekî ajal tînin hesibandî û ev ajal wekî ruhê pîroz ê wî gelî û herwiha parêzvanê wî gelî ye, carinan jî Xwedayê wî gelî ye. Piranî mîtên bi vî awayî di nav gelên debara xwe bi berhevkarî û nêçîrvanî dikin, çêdibin.<sup>27</sup>

### 1.2.2.5. Mîten Qehremanî

Ev cure mît derbarê jîyana qehremanan de ne û qala çêbûn, jîyan û piranî qalabûna qehremanan tê kirin. Di nav gelê Kurd de em dikarin destana Kawa wekî mînak bidin, herçiqas em jê re dibêjin destan jî bi rastî ev mît e, lê wekî gellek mîten qehremanî bûye destan. Ev mît ne tenê ya Kurdan e, ev mît bi gelemperî mîta gelê Arî ye.<sup>28</sup>

## 2. Efsane

Peşva "Efsane" ji zimanê Farisî tê qebûl kirin. Hin caran wekî "fesane" jî tê bikaranîn ku herdu peşva jî heman tişt in. Li welatên rojavayî ev cure bi navê "legendus" ku koka wê ji Latîni ye, tê bikaranîn.<sup>29</sup>

Demâ Pertev Naîlî Boratav hêmanên folklorê dabeş dike, di bin beşa "wêjeya gelêrî" de, efsaneyan bi serê xwe nakirîye cureyek, di bin sere navê "Berhemên nebûne wêjeyî, lê dibe ku bibe" de bi cî kirîye. Herwiha teqez dîyar kirîye ku bi bawerîyan re neyê tevîhev kirin.<sup>30</sup> Di pirtûka *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî* de dema berhemên folklorê Kurdî tîna dabeş kirin navê efsaneyê qet derbas nabe.<sup>31</sup> Ew cureya wêjeya gelêrî ku em bi navê efsane bi nav dikin, di nava gel de wekî çîrokên gelêrî jî tê binav kirin. Christine Allison jê derxistîye ku di nav civaka Êzîdîyan de efsaneyên ku Êzîdî bawerî pê tînin û wekî rastî dinirxînin bi navê çîrokê bi nav nakin, dema çavkanîyê Êzîdî dixwaze efsaneyê vebêje piranî navê efsaneyê bi navê lehengan bi lêv dikin wekî "Êzdî Mîrza", "Derwêşê Evdî" û hwd.<sup>32</sup> Herwiha gelê Kurd tevahî jî gellek caran bi vî awayî bi nav dikin.

Birayên Grimm efsaneyan wisa pênase dikin: "*Efsane ew çîrok in ku derbarê kes, bûyer û cîyên rast an jî sêwirandî de tîna vegotin.*" Li gor Max Lüthi: "*Ef-*

*sane ew çîrok in ku qala bûyerên pêkhatî dikin.*" Kenneth W.-Mary W. Clarke dibêjin: "*Efsane ew çîrok in ku qala kes, cî û bûyerên bi bawerîyên rast yan jî bi bawerîyên biguman hatine honandin dikin.*" Robert A. Georges jî dibêje: "*Efsane ew çîrok in ku wekî di demên nêz û demeke dîrokî de qewimîye xuya dike, derbarê vebêjer û guhdar de û ji hêla wan ve rast tê qebûl kirin.*"<sup>33</sup> Ji van pênaseyan û li gor agahîyên derbarê efsaneyan de ev tişt dertên ku; Efsane vegotinên gelêrî ne. Kesê vedibêje û guhdarî dike bawerîya xwe pê tînin. Di nav xwe de qewimînên derasayî dihewîne. Efsane xwerû ne. Gellek caran ji hêla gel ve nêzî olê yan jî wekî qaîde yan jî agahîyeke olî û pîroz tê qebûl kirin. Herwiha ji hêla gel ve bi hişmendîya çêkirina mîtan hatine çêkirin. Bi van agahî û jêderan mirov dikare efsaneyê wisa pênase bike: Efsane; ew çîrokên kurt, xwerû, rast û pîroz in ku ji hêla gel ve di demên nêz û dîrokî de, derbarê kes, cî û bûyerên derasayî de bi hişmendîya mîti hatine çêkirin.

### 2.1. Efsane û Folklor

Efsane bixwe di nav hêmanên folklorê de di bin beşa wêjeya gelêrî de wekî cureyeke wêjeya gelêrî cî digire, lê ji aliyê gellek folklorzanan ve piranî di nav cureya çîrokan de wekî beşek hatîye qebûl kirin. Aarne dema çîrok dabeş kirine bi navê "Çîrokên bi Şewaza Efsaneyan" bi nav kirîye.<sup>34</sup> Sedemên vê yekê ev in ku efsane di nav gellek cureyên wêjeya gelêrî de heye, piranî jî di nav çîrokan de. Herwiha mînakên wisa hene ku herçiqas ji hêla gel ve bi materyal û vegotinên çîrokan hatibe xemilandin jî efsaneyên xwerû cudabûna xwe dîyar dikin. Heke em li vir mînakên bidin li herdera Kurdistanê û di nav gelên din de jî mînakên "Latên Bêmirazan" hene ku bi kurtasî qala du hez kirîyên ku ji neyaran direvîyan û ji bo ku nekevin ber destên wan kesên, Xwedê ew kirine kevir.

Demâ mirov li ser efsaneyan hûr dibe jê derdixe ku pêşî ji hêla gel ve efsane bi awayekî pir kurt tîna çêkirin paşê hunerên çîrok û vegotinê lê zêde dibin. Hêmanên wekî kes, cî, dem û bûyer zelaltir û berfirehtir dibin heta ku varyantên ji hev cuda derdikevin, tiştên cuda jî lê zêde dibin û ew tevîhevîya çîrok-efsane, mît-efsane, destan-efsane, ol-efsane û hwd. çêdibe. Ji bo piştrastkirina vê yekê em dikarin vê mînaka berhevkarîya Mustafa Gazî bidin: "Tê bawer kirin ku "roj" lawik e, "hîv" qîzik e. Tê gotin, ji ber ku qîzikê (hîv) bi xebera diya xu nekiriye, diya qîzikê hevîr avêtiye ser çavên wê û loma jî dibêjin hîv wisa belek e."<sup>35</sup> Ji vir dixuye ku ev mînak xwerû efsane ye, hîn tiştêk lê zêde ne-





bûye û nebûye çîrok an jî tiştêkî din. Bi vî awayî tenê dibe ku bi mîtan ve tevîhev bibe. Bi saya zîmanê xwerû û kurtbûna wê jî em dikarin ji mîtan cuda bikin. Herwiha çîroka gelêrî "Pepûk"ê gellek tişt li xwe zêde kirine û bûye çîrok. Bi kurtasî heke em vê çîrokê veguhezînin vira, çîrok wisa ye; Keçîkek û kurîkek hebûn dêya wan dimire û bavê wan dêmarî tîne. Dêmarî zextan li wan dike. Rojêkê ji bo ku li wan bixe, tûrê qul dide piştê wan û dişîne kerengan. Ji ber ku tûr qul e, hemû kerengên wan berhev kiribûn dikevin erdê. Dema dibe êvar, dikin vegevin malê, lê keçîk dibîne ku tûr vala ye. Ew jî birayê xwe sûcdar dike. Birayê wê dibêje; "heke tu bawer nakî ku min nexwarîye were zikê min biqelêşe û lê mêze bike. Keçîk jî wisa dike, zikê birayê xwe diqelêşe, lê mêze dike ku tiştêkî de tune ye, bang li birayê xwe dike lê birayê wê êdî mirîye. Keçîk jî poşmanîyê li çokên xwe dixê dibêje; "kê kuşt, min kuşt, kê şûşt, min şûşt, min kuşt, min şûşt." Û dûa dike ku Xwedê wê bike tiştêkî din. Xwedê wê dike çûk û navê wê jî dike pepûk. Ji wê demê heta niha pepûk li her derê şîna birayê xwe dike.<sup>36</sup> Gellek varyantên cuda yên vê çîrokê li gellek deverên cuda yên Kurdistanê bi zaravayên Kurmancî û Kirmanckî hene. Pêwîst e, em li vir dîyar bikin ku folklorzanên Tirk vê efsaneyê yan jî çîrokê di nav folklorê xwe de dihesibînin, lê wextê em li dever û çavkanîyên wan mêze dikin, dîyar dibe ku li Kurdistanê û ji Kurdan hatine berhevkirin. Derheqê vê çîrokê de di pirtûka Muharrem Kaya de du varyantên cuda hatine berhevkirin "Pepuk Kuşu", "Keko Kuşu" ku herdu jî malên Kurdan in. Mînakên vê yekê gellek hene ji ber ku ev yek dê me, ji mijara me dûr bixe, em ê zêde nekevin navê mijarê.<sup>37</sup> Awayê çîroka Pepûk ê efsane

tenê ew e ku keçîkekê birayê xwe kuştîye, Xwedê jî ew kirîye pepûk lewma ew çûk herdem wisa dibêje pepûûû, peppûûû...

## 2.2. Dabeşkirina Efsaneyan

Derbarê efsaneyan de ji sedsala 19'an heta niha gellek xebat li ser rûyê cîhanê hatine kirin. Herwiha ji bo dabeşkirina efsaneyan jî gellek xebatên giranbuha hatine kirin. Yek ji van xebatên girîng a Antti Ararne ye ku wî efsane û varyantên wan ên Fînîyan kirine neh beşên sereke û di nav wan de jî ji bo cureyan hejmar dane. Lauri Simonsuuri jî li gor mijara wan efsaneyên Fînîyan, efsane kirîye 15 beş. Xebatên bi vî awayî yê takekesî heta sala 1959'an domîyane. Piştî sala 1959 û heta 1969'an kongreyên navneteweyî ên Folklorê pêk hatine. Di encama kongreya Bûdapeşteyê ku di sala 1962'an de pêk hatîye ji bo xebatên dabeşkirina efsaneyan ya navneteweyî encamên gellek baş hatine bidestxistin û dabeşkirina efsaneyan wekî li jêr hatîye qebûlkirin.<sup>38</sup> Ji ber ku ev karê dabeşkirinê heta niha ji bo efsaneyên Kurdî nehatine kirin û ev dabeşkirin jî ji hêla gellek zanyarên giranbuha yên cîhanê hatine kirin û ji alîyê gellek neteweyan ve jî hatîye qebûlkirin, mirov ji bo efsaneyên Kurdî jî bi hêsanî dikare bi kar bîne.

I. Efsaneyên derbarê afirandin û qiyameta cîhanê

II. Efsaneyên dîrokî û efsaneyên derbarê dîroka mirovahîyê

- A Efsaneyên bingeha cî û alavan ên derbarê mirovahîyê de
- B Efsaneyên derbarê hin cîyan de
- C Efsaneyên derbarê pêşdîrok (prehistorya) û

demên pêşîn de

D Efsaneyên şer û karesatan

E Efsaneyên kesên bijarte

F Xirabûna pergalekê

III. Efsaneyên hêz û heyberên derxwezayî / Efsaneyên mîtî

A Qeder

B Mirin û Mirî

C Cîyên neewle û xeyalet

D Şer û tevmeşa xeyaletan

E Niştecibûna li axiretê

F Ruh, perî û cin

G Xeyaletên li cîyên şareza

H Heyberên guherî

I Şeytan

J Ruhên nexweşî çêdikin û nexweşiyên ruhên xirab

K Kesên xwedî hêzên derxwezayî

L Ajal û gihayên efsaneyî

M Xezîne

IV. Efsaneyên olî / Efsaneyên derbarê Xweda û lehengan de

### 3. Danberhevîya Mît û Efsaneyan

Berê ku em mît û efsaneyan bidin ber hev divê em têkilîya mît û efsaneyan di serî de binirxînin û nîqaş bikin. Berîya her tiştî mirov dikare bibêje çavkanîya mît û efsaneyan yek e, ango çavkanîya herduyan jî gel e. Bi saya mît û efsaneyan gel dixwaze derbarê sedem û razên tişt, bûyer, cî û xwezayê de serwext be. Herdu têgeh jî ji mirovan pêbawerbûnê dixwazin û mirovan jî bi rastî bawerîya xwe pê anîye û tînin jî. Em îro dema li "ol"an dinêrin, hin "ol"an bingeha xwe bi mîtan çêkirîye û hîm danîne û bi efsaneyan hin tişt li ser xwe zêde kirine. Herwiha di bin vê serenavê de armanca me ew e ku herdu têgehên ji hev derxin lewma li jêr xal bi xal em ê cudahiyên mît û efsaneyan rêz bikin.

- Dema qewimandina bûyerên efsaneyan li gor dema mîtan nêziktirî îro ye.
- Îro hîn jî çêbûna efsaneyan didome, lê mît çênabin.
- Di mîtan de cîhana ku bûyer lê diqewimin, cîhaneke cuda ye, cîhana berê ye, lê

cîhana efsaneyan piranî wekî cîhana sed an du sed sal berê tê sêwirandin.

- Mît qala Xweda û Nîvxwedayan dike, lê efsane qala qehremanên dîrokî û nîvdîrokî dike.<sup>39</sup>
- Mît berê xwe dide mijarên xwezayî, lê efsane piranî berê xwe dide bûyerên civakî.
- Mît berîya efsaneyan çêbûne û mîtan derbarê mijarên civakî de ne, carinan veguherîne û bûne efsane.
- Di nav mîtan de hin tişt veşartî û nezalal in, lê efsane jê zelaltir in, ji ber ku gel dikare di nav efsaneyan de kêmasîyan temam bike.
- Dîroka efsaneyan tune ye, lê hişmendîya dîrokê tê de heye û kesê guhdarî dike kêma zêde dîroka efsaneyê ji hev derdixe.
- Mît dixwaze afirandina cîhanê, welidîna mirovan, derketina pêşiyên cisnan, roja qiyametê û sedemên çêbûna alavan bi awayekî gelemperî vebêje, lê efsane li dora kes û tiştên taybet digere û vegotina xwe bi awayekî herêmî vedibêje.
- Lehengên mîtan, kesên bijarte ne, lê yên efsaneyan hem bijarte hem jî mirovên asayî ne.<sup>40</sup>
- Bawerî pêanîna gel a efsaneyan ji ya mîtan zêdetir e.
- Efsane piranî bi ola gel a îro ve girêdayî tê qebûlîkirin, lê mît dîsa wekî ol û bawerîyeke kevn tê qebûlîkirin.
- Efsane ji bo guherandin û afirandinê amade û guncav e, lê mît êdî nayên guherandin.
- Mît behsa qencî û xirabîyê nakin, derdekî mîtan a bi vî awayî tune ye, lê efsane dixwaze peyamên qencîyê bide û mirovan ji xirabîyê dûr bixe.
- Lehengên mîtan bêqisûr in, wekî Xweda ne, lê yên efsaneyan xwedî taybetiyên însanî ne.
- Mît li gor efsaneyan dirêj in, efsaneyên xwerû pir kurt in.
- Efsane li gor mîtan xwerû û nêzî zimanê gel e.

## Encam

Derheqê mît û efsaneyan de em gihîştin vê encamê ku mît û efsane ji gel welidîne û herwiha bandor li gellek zanist û cureyên wêjeya gelêrî dikin. Mirov dikare baweriyên wekî, Mazdaîzm, Êzîdiyatî, Zerduştî, Yaresanî... wekî çavkanîyên mîti yên Kurdan bijmêre. Gellek zanyaran berên xwe dane mîtan û mît xistine navenda lêkolînên xwe. Herwiha gellek teorîyên giranbuha û yên zanistên din ên civakî jê çêbûne.

Ji vê xebatê derket ku mît zanista yekem a gel e ku mirovan pê xwestîye tiştên li derdora wan pêk tînan watedar bikin û di hişê xwe de bi pergaleke qedîm ve girê bidin. Efsane jî bi heman hişmendî û rêyan dîsa ji hêla gel ve hatine çêkirin lê çêbûna wan wekî mîtan neqedîyaye; efsane hem çêbûna xwe didomîne û hem jî wekî hêman û hîmekî wêjeya gelêrî di nav berhemên folklorê de cî digire.

## ÇAVKANÎ

- 1 Kaya, Mitolojiden Efsaneye Türk Mitolojisinin Türkiye'deki Efsanelerde İzleri, Weş. Bağlam, çap 2., Stenbol, 2011, r. 11.
- 2 Bayat, Mitolojiye Giriş, Weş. Ötüken, çap. 4., Stenbol, 2013, r. 12.
- 3 H. b., r. 13.
- 4 Kaya, Mitolojiden Efsaneye Türk Mitolojisinin Türkiye'deki Efsanelerde İzleri, Weş. Bağlam, çap 2., Stenbol, 2011, r. 11.
- 5 Çobanoğlu, Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş, Weş. Akçağ, çap 6., Ankara, 2012, r. 105-112.
- 6 Hikmet, "Li Gor Teorîyên Nûjen Nêrîneke Giştî Li Ser Folklorê Kurdî", Edebiyata Kurdî ya Gelêrî Dîrok-Teorî-Rêbaz-Lîteratur-Berawirdî-1, Weş. Avesta, Stenbol, 2015, r. 58.
- 7 Yıldırım & Pertev & Aslan, Ji Destpêkê Heta Nîha Folklorê Kurdî, Weş. Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü, Stenbol, 2013, r.46.
- 8 Bayat, Mitolojiye Giriş, Weş. Ötüken, çap. 4., Stenbol, 2013, r. 14.
- 9 H. b., r. 72.
- 10 Çobanoğlu, Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş, Weş. Akçağ, çap 6., Ankara, 2012, r. 128-131.
- 11 Bayat, Mitolojiye Giriş, Weş. Ötüken, çap. 4., Stenbol, 2013, r. 14-15.
- 12 Kaya, Mitolojiden Efsaneye Türk Mitolojisinin Türkiye'deki Efsanelerde İzleri, Weş. Bağlam, çap 2., Stenbol, 2011, r. 104.
- 13 Bayat, Mitolojiye Giriş, Weş. Ötüken, çap. 4., Stenbol, 2013, r. 15.
- 14 Omerxalî, Êzîdiyatî Cîvak Sembol Rîtûel, Weş. Avesta, Stenbol, 2007, r. 17.
- 15 Seyidoğlu, Mitoloji Üzerine Araştırmalar Metinler ve Tahliller, Weş. Dergah, çap. 6., Stenbol, 2014, r. 88.
- 16 Xemgîn, Kürdistan'da Mitoloji ve Dini İnançlar (İslamiyet Öncesi), Weş. Doz, Stenbol, 2005, r. 73.
- 17 H. b., r. 97.
- 18 Hamzeh'ee, Yaresan (Ehl-i Hak) Bir Kürt Cemaati Üzerine Sosyolojik Tarihsel ve Dini-Tarihsel Bir İnceleme, (Werger ji İngilîzî: Ergin Öpengin), Weş. Avesta, Stenbol, 2009, r. 132.
- 19 Xemgîn, Kürdistan'da Mitoloji ve Dini İnançlar (İslamiyet Öncesi), Weş. Doz, Stenbol, 2005, r. 50.
- 20 Seyidoğlu, Mitoloji Üzerine Araştırmalar Metinler ve Tahliller, Weş. Dergah, çap. 6., Stenbol, 2014, r. 81-91.
- 21 Bayat, Mitolojiye Giriş, Weş. Ötüken, çap. 4., Stenbol, 2013, r. 15.
- 22 Hamzeh'ee, Yaresan (Ehl-i Hak) Bir Kürt Cemaati Üzerine Sosyolojik Tarihsel ve Dini-Tarihsel Bir İnceleme, (Werger ji İngilîzî: Ergin Öpengin), Weş. Avesta, Stenbol, 2009, r. 127-130.
- 23 Bayat, Mitolojiye Giriş, Weş. Ötüken, çap. 4., Stenbol, 2013, r. 16.
- 24 Xemgîn, Kürdistan'da Mitoloji ve Dini İnançlar (İslamiyet Öncesi), Weş. Doz, Stenbol, 2005, r. 73.
- 25 Bayat, Mitolojiye Giriş, Weş. Ötüken, çap. 4., Stenbol, 2013, r. 16.
- 26 Hamzeh'ee, Yaresan (Ehl-i Hak) Bir Kürt Cemaati Üzerine Sosyolojik Tarihsel ve Dini-Tarihsel Bir İnceleme, (Werger ji İngilîzî: Ergin Öpengin), Weş. Avesta, Stenbol, 2009, r. 131-132.
- 27 Bayat, Mitolojiye Giriş, Weş. Ötüken, çap. 4., Stenbol, 2013, r. 16.
- 28 Seyidoğlu, Mitoloji Üzerine Araştırmalar Metinler ve Tahliller, Weş. Dergah, çap. 6., Stenbol, 2014, r. 81-91.
- 29 Sakaoğlu, Efsane Araştırmaları, Weş. Kömen, çap 2., Konya, 2013, r. 21.
- 30 Boratav, Halk Edebiyatı Derleri, Weş. Tarih Vakfı, çap. 2., 2013, r. 52.
- 31 Yıldırım & Pertev & Aslan, Ji Destpêkê Heta Nîha Folklorê Kurdî, Weş. Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü, Stenbol, 2013, r. 143-144.
- 32 Allison, Yezidi Sözlü Kültürü, (Werger ji Kurdî û İngilîzî: Fahriye Adsay), Weş. Avesta, Stenbol, 2007, r. 131.
- 33 Sakaoğlu, Efsane Araştırmaları, Weş. Kömen, çap 2., Konya, 2013, r. 21-22.
- 34 H. b., r. 49.
- 35 Gazî, "Baweriyên Batil", Folklorê Kurdan, Hejmar 1, Stenbol, 2015, r.55.
- 36 Dîzman, Xwendin û Nivîsandin 1, Weş. Aram, Stenbol, 2014, r. 172-173.
- 37 Kaya, Mitolojiden Efsaneye Türk Mitolojisinin Türkiye'deki Efsanelerde İzleri, Weş. Bağlam, çap 2., Stenbol, 2011, r. 136-137.
- 38 Sakaoğlu, Efsane Araştırmaları, Weş. Kömen, çap 2., Konya, 2013, r. 25.
- 39 Sakaoğlu, Efsane Araştırmaları, Weş. Kömen, çap 2., Konya, 2013, r. 37-38.
- 40 Bayat, Mitolojiye Giriş, Weş. Ötüken, çap. 4., Stenbol, 2013, r. 112-122.

# Gotinên SER MEHAN

Tir Şivatê<sup>1</sup>  
Adar hatê

Sêzdê Kanûnê  
Rojê berê xwe da havînê

Roj bîne sal  
Zik bîne çal  
Kabanî<sup>2</sup> bîne beqqa<sup>3</sup> (Tîrmeh)

Xwişka adar  
Bide min rojek û daneke sar  
Ca ez gîskî bikeme dar

Adar e  
Meheke sar e  
Pê nayêt bihar e

Xizîran xinzirî  
Giya li erdî kizzirî

Mamkê Nisan  
Bînderê hemû pîsan  
Berfê bete kîsan

Kanûn e  
Şîba gayê kîn<sup>4</sup> e  
Germ çî nîne

Şivat e  
Befir ba tê  
Kicik<sup>5</sup> ji giya tê

Gulan e  
Mehek can e  
Gula hemû baxçan e

Çirî ye  
Mehek e cindî ye  
Karê zivistanê kirîye

Çil Çile ye  
Bîst beçe<sup>6</sup> ye  
Hîndî heye  
Hîndîtir jî heye  
Pêşî hat hewar  
Paşe hat bihar

Herêm: Gundê Axespiyê/Gever/Colemêrg  
Dem: 2015

- <sup>1</sup> Sibat
- <sup>2</sup> Kebanî, bermalî
- <sup>3</sup> Dikandar
- <sup>4</sup> Hêrsok
- <sup>5</sup> Keciç
- <sup>6</sup> Bîst rojên sar ên dijwar ên pistî cileyê

**Berhevkar:**  
Mehmed Emîn  
HEZER



## DI ZUREKERÎ, KUNDIRE û LÊN

Arêkerdox:  
Ugur SERMÎYAN

Di hevalî ware de bîyê. Bîyo payîz, o jû vano "Defê<sup>1</sup> sêrê<sup>2</sup> dewe, hala dewe de çik esto çik çin o?"

Tekino, êno ke cawo ke wele risnenê, tey kundire bîya. Sono sê keno<sup>3</sup> ke kundire zaf girs a. Sonò çê<sup>4</sup>, hîrê mordemon cêno êno ebi torcênan a. Hîrê mordemî hata san gurînê, dimê kundire zor a birnenê. Birnenê ama kundire çitu vecê? Hîrê citê gawû girêdanê, kundire kas kenê, mênê<sup>5</sup> gayî jû şîkîno.

O bîn gos dano cî, qî vey nêkeno.<sup>6</sup>

Tenê ke findenê, o bîn vano ke: "A serre mi rê ley<sup>7</sup> lazim bî, şîyo Erzingan, mi va leyî xo rê virazî, leyêdê baqirînî. Şîyo vano çarşûyê baqircîyon. Çar ustaî zerrê jû leyî de ronîştî yê, çakût sanê ra, vengê çakûto nêsono jûbîni." O wayîrê kundire vano ke: "Heq adirê to de bo! Zura nîyanêne<sup>8</sup> caro beña?" O bîn vano: "Heq adirê pîyê to rê! Ma kundira henêne<sup>9</sup> rê leyo nîyanên bibo ke tey bigirîyo."

**Çime:** Sey Babilo KURESIC (Yusuf AKBAYIR)

**Serrê aye:** 85

**Perwerdeyî:** Wende

**Herêm:** Xozat/Dêrsim

**Serre:** Amnon 2015

<sup>1</sup>Yew rey, reyêk

<sup>2</sup>(Ez) şira

<sup>3</sup>Seyr keno, ewnîyeno, qayt keno

<sup>4</sup>Keye

<sup>5</sup>Mîyane


<sup>6</sup>Veng nêkeno

<sup>7</sup>Lên

<sup>8</sup>Winasî, no tewir

<sup>9</sup>Asarên, o tewir

# PISİK Û GAVAN



Amadekar:  
Weysi ARCAGOK



Şêxmûz Axa xwediyê gund e. Li ber rêya gund de kaniyek daye çêkirin. Rojek Xwedê kurikekî dide wî, Şêxmûz Axa gelek şa dibe, ji wî kurikî pîrr hez dike. Hema ji gund derdikeve diçe bajêr ku ji jin û kurê xwe re, ji gundiyan re diyariyan bîne. Di vegeerê de tî dibe, tê li ber kaniya xwe disekine, avê jê vedixwe, tîna xwe pê dişkîne. Bala xwe dide ku hin tûrist hatine li nêzikî kaniyê, seyranê dikan. Silavekê dide wan û dibihîze ku dengê pisîkan tê. Dinihêre, pisîkek spî ye û çar çêjikên xweşik jî li der û dora wê difîzin. Axa bi dest û çavan dide fahmkirin ku ji wan çêjikan yekê bidin wî. Gerok jî çêjikekî nêr didin. Axa pê şa dibe, wî pisîk bi xwe re tîne gund. Dem derbas dibe pisîkê me mezin dibe. Kurê Axayê biçûk hîn di nava dergûşa xwe de ye, pisîk diçe dev li tiliya kurik dike, kurik dike hawar. Axa û malbat digihîjin ser, pisîkî digirin. Bala xwe didin ku pisîk tiliya kurik birîndar kiriye û di nava xwinê de hiştiye. Şêxmûz Axa hêrs dibe, dibêje:

- Gazî gavan bikin bila bilezîne were.

Gavanê gund tê. Navê wî Sofî ye. Şêxmûz Axa jê re dibêje:

- Gazî kûçikên gund bike, bila tev bi te re werin. Vî pisîkî têxe têlîsê, bi hev re herin çolê. Pisîk di nava kûçikan de berde, bila kûçik wî perçe loqme bikin, vegere were gund.

Sofî pisîkî digire, diçin. Li çolê kûçik li Sofî dicivin. Sofî pisîk berdide. Pisîk dinihêre ku xelasbûn tune ye, xwe diavêje ser serê Sofî. Kûçik di jêr de diewtin, pisîk di jor de dinewne, ser û çavên Sofî di xwinê de dimîne. Sofî dike nake pisîk jê naqete, ew û pisîk û kuçik bi hev re tînin gund. Li gund pisîk direve diçe dikeve nava kîlerê. Şêxmûz Axa dêrî lê digire, çoyeke stûr dide destê Sofiyê ser û çav bixwîn û jê re dibêje:

- Tu bikeve hundir, bi ço bikeve ser wî, hetanî nekûjî dernekeve ha!

Sofî dikeve hundir, derî lê tê girtin. Pisîk çawa ku çoyê dibîne diçe ser kûpê qeliyê. Sofî lê dixwe, pisîk xwe diavêje ser kûpê dimsê. Çoyê Sofî li kûpê qeliyê dikeve, qelî tev dirije. Sofî careke din lê dixwe, pisîk xwe ji ser kûpê dimsî diavêje ser kûpê rûnê. Derba Sofî li kûpê dimsî dikeve, dims dirije. Bi vî awayî hevdu dibin û tînin, li kîlerê kûpekî sax namîne. Pisîk dinihêre ku xelasbûn tune ye, xwe diavêje ser rûyê Sofî, dev li pozê wî dike. Dibe hawara Sofî. Rebeno dike nake pisîk jê naqete. Giraniya pi-

sîkî tê ser pozê wî, canê Sofî bêtir diêşe. Bi her du destan qûna pisîk digire û wî bilind dike ku êşa wî sivik be. Şêxmûz Axa jî dibêje qey Sofî pisîk kuştiye, derî vedikin. Çawa ku derî vedibe, pisîk pozê Sofî berdide direve dikeve kadînê. Şêxmûz Axa bala xwe dide ku qelî û dims û rûn û penêr tev li nava hev ketine, lê ji Sofiyê pozbixwîn re tişteki nabêje. Li pey pisîkî dikevin û wî digirin. Şêxmûz Axa ji Sofî re dibêje:

- Vî pisîkî têxe têlîsê, bibe di nava çem de, ku der pîrr kûr be, di wir de berde û were. Sofiyê ser û çav û poz bixwîn têlîsa xwe li piştê xwe dixwe û berê xwe dide çem. Diçe tevî têlîsê dikeve nava avê, tê de diçe diçe, tê cihekî kûr, devê têlîsê vedike û pisîk berdide. Pisîk bala xwe dide ku dê di nava avê de bifetise, berê xwe dide Sofiyê reben. Sofî jî hîn zêde ji pisîk dûr neçûye. Dinihêre ku pisîk bi ser wî de tê, xwe bera avê dide, dikeve binê avê, lê bêhna wî diçike dîsa dertê. Ew çiqas dikeve binê avê, pisîk ewqas bi nêz de tê. Bi vî awayî zêde naçe, di dawiya dawî de pisîk dîsa tê xwe diavêje ser serê Sofiyê belengaz. Sofî dîsa xwe dike binê avê, bêhna wî diçike, derdikeve pisîk jê neqetiyaye. Pisîk pencên xwe bêtir di serê Sofî re dike, dev jê bernade. Sofî difikire, dibêje:

- Piştî ku pisîk ji min naqete, hetanî ez dimirim xwe didim ser pisîkî, ji avê derkevîm çêtir e.

Dîsa pisîk li ser serê Sofî ye, bi hev re tînin gund. Çawa ku Şêxmûz Axa çav li pisîkî dikeve, hêrs dibe dibêje:

- Ev şeytan hîn jî nemiriye? Bilezînin, tifinga min bînin.

Sofiyê xwehiliser ji tirsan dibêje:

- Di nava avê de biçûma çêtir bû, ji ber vî pisîkê bênamûs ez ê bimirim.

Dengê teqînê tê, pisîk li ser serê wî dibe sê perçe. Şêxmûz Axa tola kurê xwe bi destê xwe ji pisîkî hildide, lê birînen li ser çav û poz û serê Sofî bi salan baş nabin.

**Çavkanî:** Yasîn YUCE

**Temen:** 70

**Perwerdehî:** Xwende

**Herêm:** Farqîn/Amed

**Dem:** 2013



Erdogan UÇAR \*

# TENÛR

Tenûr li orteya maltenûrkê  
tê bicîkirin. Li her du aliyên  
tenûrê milikên tîn çêkirin.  
Milikê çepê ji ya rastê  
firetir e. Teşta hevîr li ser  
milikê çepê tê danîn.  
Bi heman awayî nanê  
ji tenûrê tê derxistin jî li ser  
milikê çepê tê raxistin.  
Ji bo vê jî rûhevîrk li pişt  
teşta hevîrê tê raxistin.

\* Girtîgeha Fiyê ya Bucaya İzmirê



Li hin derên din ên cîhanê tenûr hene yan nîn in, ez nizanîm. Lê tenûr weke parçeyêke jiyanê bi Kurdan re belavî gelek cihan bûye. Ji ber salên dirêj di zindanê de me, min nedîtiye lê li gora ku min bi-hîstîye êdî li ser avahiyên bilind ên bajarên jî tenûr hatine lêkirin. Kurd û tenûr çima ewqas bi hev ve girêdayî ne hêjayî lêkolînê ye. Ji ber şertên zindanê ez li ser lêkolînên hatine kirin venebûme û çî encam hatine derxistin nizanîm. Lê bawer im lêkolîneke wisa dê bi hêsanî xwe li çanda jinantiyê qirase bike.

Tenûrê weke îcadeke neolîtîkî li ser civakbûyîn û sazkirina civakê bandoreke berbiçav kiriye. Hema bibêje hemû hêmanên civakê bi awayekî bi tenûrê re têkildar in.

### Tenûr û Jin

Tenûr encama berhemdariya hunera jiyanê ya jinan e. Dema ku mirov li dîrokê dinêre du çandên paralelê hev pêş dikevin hene. Yek jê çanda mêrî (*nêçirvanî*) û ya din jî ya jinê (*çandîni*) ye. Di civaka neolîtîk de çandîni yanî çanda jinê serdest bû. Hemû amûr û rêgezên jiyanê ji aliyê dayikê ve dihatin rêxistinkirin. Pirsgirêkên jiyanî (*civak, debar, strîn, zayendîtî û hwd.*) hemû rojeva jinê bûn. Ji ber vê jî her qadên jiyanê weke forûm digirt dest û

nîqaş dikirin. Tenûr jî yek ji van forûman bû. Niha jî dema ku mirov li parvekirinên ber tenûran tên kirin dinêre bermahiyên vê çandê hê jî giyanwer in. Hê jî ténûrek li ku derê were dadan herî kêmtir çar-pênc jinan ber bi xwe ve dikişîne û mijarên civakî dibin xalên parvekirinan. Ji ber ku îcadeke jinane ye, ti car tenûr ji jinan re xerîb nayê.

Gelek jin ji ber ku tevî parvekirinên ber tenûran bûne ji hêla hevserên xwe ve rastî lêdan û tundiyê hatine. Tîrsa serdestan tim ji bindestên wan heye, tim lihevkomîna çend bindestan ji xwe re xetere dîtine. Ev taybetmendiyêke desthilatdaran e. Ji ber ku feraseta bavîksalar, lihevkomîna û axaftinên li ber tenûrê weke xeyb û paşgotinê bi nav kiriye, lê îcada jinê li ber dîlê wê şêrîn e. Tenûr e ev. Tu bi heft werîsan jî girêbidî dê jin nesekine û here ber tenûrê. Diya min diçû. Jinên nas dikim hemû diçûn. Bawer im ku feraseta bavîksalar li ser raza tenûrê vebûbûna dê tenûr xirab bikirina û dê tenûr jî negihîştana roja îro.

Pir tiştên ku serdest ji hev û ji bindestan veşêrin hene. Lê tiştêkî ku bindest ji hev veşêrin nîn e. Germahiya tenûrê zimanê bindestan vedike. Belkî jî tenûr cihê xwe rêxistinkirin, berxwedanê û pêşxistinê bû. Roj bi roj forma xwe guherand û niha



weke derd û kulên xwe û hemû pirsgirekên jiyânê yê bi mêr ve eleqeder parve kirin weke bermahiya wê çandê bin. Jin li ti derê bi qasî ber tenûrê xwe di ewlehîyê de nabînin. Ji ber ku derên ku raz tê de hebin bêbawerî jî tê de heye. Dera ku bêbawerî tê de hebe mirov nikare xwe di ewlehîyê de bibîne. Tenûr bixwe sira jiyânê ye. Ji bo vê jî ti sirên din napejirîne.

Forûmên jinan tim bandora xwe li ser jiyana civakî kirine. Di hêla maddî û manevî de ruhekî hevpar diafirîne, ji hevîrtirş parvekirinê heta bi arduyên tenûrê parvekirinê hemû komunalîteyekê îfade dikin.

Lê tenûr tenê ne wextê dadayî be jinê ber bi xwe ve dîkşîne. Ji dema ku hê xwelî ye heta ku dîsa bibe xwelî bi jinê re têkildar e. Ji bo vê divê ku mirov li çêkirina tenûrê jî binêre.

### Çêkirina Tenûrê


Herçiqas di roja me ya îro de tenûr çêkirin û firotin weke pîşeyekê bi cî bûbe jî di nava civakê de çêkirina tenûrê jî weke rengekî din yê sosyalîzasyonê ye.

Dapîra min tenûrên xwe bi xwe çêdikirin. Em nêviyên wê, biharan jê re weke endezyarên axê dixebitîn. Em ji ku hîn bûbûn nizanîm lê me ew ax bi piranî bi rêya kolemişkan didît. Piştî ew dapîr dihat, li axê dinihêrt, di nava tiliyên xwe de dibir û dîanî, bêhn dikir û biryar dida. Pîvanê wê çî bûn hê jî nizanîm. Lê dema ku "erê" bikira me dizanîbû çêkirina tenûrê dest pê dika.

Xwelîkol vekirin karekî hêsan nîn e. Baldaî û hêza fizîkî dixwaze. Heta tu li ser damara xweliya sor (*axa bigel*) vebibî divê tu xweliya din ji xwelîkolê derdixî. Piştî ku axa sor ji xwelîkolê derdiket li gora perspektîfa dapîrê li qunceke eywanê yan jî li kadîne dihat raxistin. Demek dirêj wisa dima. Ji bo ziwa nebe carcaran av lê dihat kirin, ji bo çî ewqas dima nizanîm, lê tê bîra min ku digot; "divê tirş bibe." Îca xwelî çawa tirş dibe ew jî qadeke pisporiyê ye.

Dema ku biryara tirş bûye derdiket, êdî heyva Gulanê dihat. Wê çaxê li berojka xanî sêpê dihat girêdan, axa tirşbûyî (*bi qasî ku têra qora yekemîn bike*) li ser naylonê dihat raxistin. Metên min ên ciwan delingên xwe hildidan û destê xwe diavêtin weris an jî kindirê bi sêpêve ve daleqiyayî û axa sor bi lingên xwe distrandin. Heta ku ev ax dibû weke melhemê diviyabû bihata strandin.

Vî karî hemû jinên cîran ên pîr û ciwan li xwe kom dikirin. Ew jî weke forûmeke bi parvekirinê dihat bi navekî kirin. Jinên ciwan hev di ber strandinê diwestandin û heta axê tewfîsa xwe digirt henek bi hev dikirin, stran digotin, dikenîyan jinên pîr jî li ser pîvanên tenûrê ên geometrîk û çawanîyên wê dixavîn û behsa tenûrên herî baş li gund kîjan in dikirin. Sohbet çawa li hev dizivirî kesî nedizanî lê axir mijar bi awayekî dihat ser mijarên pevreyîyên. Di ber van axaftinan de şoravka hatibû amadekirin li axa di bin lingê jinên ciwan de dieciqî dihat kirin, piştî qederekê karê strandinê dihat kirin piştîre kaya qesela ceh û heke hebûya bijiyên hespan,



tune bûya mûyên bizinan li nava heriya hatiye strandin dihat xistin. Bi van re jî dîsa qederek dihat strandin.

Piştî karê strandinê diqediya cûmikên<sup>1</sup> heriyê dihatin amadekirin. Û dapîrê dawa xwe hildida û qora yekemîn dadinî. Her qorek ji erdê panzdeh bîst santîm bilind bû. Tenûr di pênc-şeş qoran de dihat qedandin. Ev jî tê wateya karê strandinê herî kêr pênc-şeş caran dihat dubarekirin. Ji ber ku heta qorek ziwa nebe ya din li şer nayê danîn. Ger ku herî baş ziwa nebe di bin giraniyê de ditewe, xwar dibe. Ji bo vê her qorek hema bibêje pênc-şeş rojan li ber tava havînê dima.

Çêkirina tenûreke pûtepêdayî<sup>2</sup> û saxlem mehekê didome. Lê bi vê jî naqede hema bibêje havînê sax li ber tavê dimîne. Dawiya havînê piştî ku tenûr baş ziwa bû pêdivî bi hêza zilam ya fîzîkî tê dîtin. Dîvê ku tenûr êdî têkeve cî.

Pêşi ya kevin bi koling û biviran tê xirakirin û ji cî derxistin. Piştî ku bi alîkariya çend zilamên li hev kombûyî tenûr hat bikeyskirin karê zilaman xilas dibe. Dîsa kar radestî jinan tê kirin û sewaxa wê dest pê dibe.

### Maltenûrk

Ji bilî herêma Serhedê hema bibêje li her derê Kurdistanê tenûr di maltenûrkan de tîn bicîkirin. Maltenûrk weke şaneşînê aliyekê wê vekiriye. Lê sê aliyê wê dîwar û banê wê bilind e. Stareya tenûrê ye. Him tenûrê him jî nanopêjan ji berf û baranê diparêze.

Tenûr li orteya maltenûrkê tê bicîkirin. Li her du

aliyên tenûrê milik tîn çêkirin. Milikê çepê ji ya rastê firehtir e. Teşta hevîr li ser milikê çepê tê danîn. Bi heman awayî nanê ji tenûrê tê derxistin jî li ser milikê çepê tê raxistin. Ji bo vê jî rûhevîrk li pişt teşta hevîr tê raxistin.

Milikê rastê ji bo ava pêwîst, hêk, kuncî, reşreşk û herwekî din tê bikaranîn.

Piştî tenûra nû hat bicîkirin û sewaxa dora wê jî rojek du rojan ziwa bû êdî ji dadanê re amade dibe. Lê ku agirekî pir gur bê dadan dê tenûr biterike. Ji bo vê divê ku bi agirekî nerm tenûr were sincirandin. Wê çaxê çawaniya tenûrê derdikeve holê. Tenûra ku baş hatibe strandin û tîn xwê be, emrê wê tenûrê dirêj e. Lê ger ku baş nehatibe strandin û tîn nehatibe xwêkirin bi sincirandinê re şil davêje û dema nan tê lêxistin xwelî di binê nan ve dimîne.

Li herêma Serhedê her malekê tenûra xwe heye. Lê li herêmên din di gundekî de çend maltenûrk hene. Ji bo vê jî dora tenûrê heye. Dora tenûrê jî bi qevdek qirşik an jî ardûyên li ber tenûrê tîn danîn tê diyarkirin. Bi piranî jî herçî jina ku hevîr kiribe qevdek qirşik dixê ber kelpîçên dîwarê maltenûrkê û li benda dora xwe dimîne. Heta hevîrê wê tîrş dibe bi kar marên din ve mijûl dibe.

Tenûr rengê jiyana kurdewar e. Her roj tenûr tê dadan û ev domana jiyanê dide rabihîstin.<sup>3</sup> Gund û warên ku bêhna nanê tenûrê bi ser ketibe hemû çanda Kurdîni li wir tê jiyandin. Bi hêviya bêhna nanê tenûrê ti wextî ji ser gund û bajarên me xalî nebe.

<sup>1</sup> Teşeyê ji herî ye, dirêj tîn çêkirin.

<sup>2</sup> Tiştê bi kedekê zêde û bi hişyarî çêbûyî.

<sup>3</sup> Hîskirin, pêhesîn, hay jê çêbûn.





(1933-2010)

Zeyneb YAŞ

## Fatima Îsa

Meyla gotina stranê li ba Fatima Îsa ji zarokatiyê dest pê dîke. Ji rojên dawet û şevbêrkan ku gundî li hej kom dibûn û wê li wan guhdar dikir lê eyan dibe. Dengê wê yê.zîz û zela naşibe yê hîç kesekî. Xwedî damaxek qayîm û zîrek bûye, çî stran, kilam û teqalîda bihata gotin û pêkanîn wê li hişê xwe dinivîsand. Herdem, gava di gund de dawetek çêdibe, Fatima di nava koma qîz bûkan de bûye, ew gula govendan bûye. Stranên xwe yê pêşin jî li van dawet, şahî, civînên xort û qîzan dibêje, cara pêşî li van govend û şevbêrkan bi nav û deng dibe.

## Jînenîgarî

Fatima Îsa, di sala 1934'an de li Ermenîstanê, li gundê Erezdeyanê, ku bi ser navçeya Vêdiyê ve ye hatiye dinyayê. Bav û kalên wê bi eslê xwe ji Bakurê Kurdistanê, ji herêma Serhedê ne. Ji ber zilm û zora Roma Reş mişextî Ermenîstanê bûne. Ji binemala Qerka ne, ku şaxek in ji eşîra Brûkan.<sup>1</sup> Vê gavê navê gundê wan bi Yêrasxavan û yê navçeyê jî bi Ararat guhertine. Ev gund nêzîkî Bajarê Îxdirê, li hember çiyayê Agirî ye.

Navê dayîka wê Başa Lelo û yê bavê wê Îsa Îsivê Elo ye. Ji dê û bav Fatima Îsa û xwişkê xwe Gurçek hebûne, ji dayîka wê jî bi navê; Fadil û Bacxanim xwişk û birayek wê hene. Zarokatiya wê ji ber mişextkirin û fermana Stalîn ya 1937'an, di nav tengasî û zehmetiyan de derbas dibe. Kurdên Misilman li Ermenîstanê bêtir li nêzîkî sinorê Bakurê Kurdistanê diman, sedemê fermana wan jî ew bû ku xwedêgiravî Kurdên Sovyetê bi dizî têkilî bi Kurdên li wî aliyê hidûd re datanîn.

Di 6 saliya wê de bavê wê diçe ser dilovaniya xwe. Piştî mirina bavê wê bi du salan jî dayîka wê emrê Xwedê dike. Mamê wê Mihemed li wê û xwişkê wê xwedî derdikeve, xwedan dike heta mezin dibin.

Malbata Fatima Îsa sala 1943'an, di dema şerê cihanê yê duyemîn de ji gundê xwe Erezdeyanê derdikevin û diçin gundê Hemzelûyê, bi navê xwe yê niha Marmaraşên, ku bi ser navçeya Masîsê ve ye. Ew li wir heta sala 1959'an dimînin, paşê diçin gundê nêzîkê bi navê Nêjirlûya Jêrin, ku dîsa li vê navçeyê ye.

Fatima Îsa, di temenekî piçûk de bi kurxalê xwe Hemzê Sincê Bava re şû dike.<sup>2</sup> Jinxala wê (xesûya wê) Xatûna Mehmed ji Fatimayê gelek hez dike û jê re dibe weke dê û ew her behsa xesûya xwe dike ku çiqas jê re baş bûye. Zarokên wan çênabin, mêrê wê jê hez dike û naxwaze jin bîne ser, ji ber ku ew jineke ciwan, bedew, bîaqil, zane û xwedî kemal bûye, lê paşê ji ber paşeroja malbatê difikirin û Fatima destûrê dide malxweyê xwe ku ji xwe re jineke din bîne. Ji vê zewaca mêrê wê 6 zarok çêdibin. Ev 6 zarok jî heta mirina Fatima Îsa jî weke diya xwe jê hez dikin û di extiyariya wê de lê xwedî derdikevin, qedr û qîmetê wê digirin.

## Dengbêjî

Meyla gotina stranê li ba Fatima Îsa ji zarokatiyê dest pê dike. Ji rojên dawet û şevbêrkan ku gundî li hev kom dibûn û wê li wan guhdar dikir lê eyan

dibe. Dengê wê yê zîz û zelal naşibe yê hîç kesekî. Xwedî damaxek qayîm û zîrek bûye, çî stran, kilam û teqalîda bihata gotin û pêkanîn wê li hişê xwe dinivîsand. Herdem, gava di gund de dawetek çêdibe, Fatima di nava koma qîz bûkan de bûye, ew gula govendan bûye. Stranên xwe yên pêşin jî li van dawet, şahî, civînên xort û qîzan dibêje, cara pêşî li van govend û şevbêrkan bi nav û deng dibe.

Di salên şestî de berpîrsên Radyoya Êrîvanê dik-evin nav liv û tevgerê ji bo peydakirina dengên nû û bi taybet jî dengê jinên Misilman, ji ber ku ji sala 1955'an heta 1964'an dengbêjên weke; Gulîzara Etar, Sûsika Simo, Belga Qado, Tûqasa Xemo, Zafîna Şekir, Aslîka Qadir û hwd. jinên Êzîdî bûn, ku dengê wan li ser radyoyê belav bûbûn, lê dengê jinên Misilman nebû. Di sala 1964'an de berpîrsê radyoyê Xelîlê Çaçan Mûradov diçe gundê Nêjirlûya Jêrin û dibe mewanê mala berpîrsê Malhebûna (Kolxoz) Mehmedê Silo. Bi pêşniyara tiyê Fatima Îsa, bangî wê dikin, li gund Xelîlê Çaçan li dengê Fatima Îsa guhdar dike û teklîf dike ku ew stranên xwe li radyoyê bêje û wisa jî gava pêşî bi dengbêjiya profesyonel di jiyana Fatima Îsa de tê avêtin.

## Kilama Miho

Dema Fatima Îsa li radyoyê bi kilama xwe ya *Miho* distrê, tevî berpîrsên radyoyê hemû li hemberî dengê wê heybetmayî dimînin, lijneya Radyoyê biryar dide ku dengê wê tomar bikin. Ew li radyoyê 5 stranên xwe distrê: *Miho*, *Şêro Dîno Lewendo*, *Lo lo Gede*, *Her Deme Deme*. Bi van stranên wê dengê wê li ser Radyoya Êrîvanê belav dibe, lê kilama wê ya *Miho* dibe efsane li ser zarê Kurdan. Fatima Îsa, strana *Miho* ji ser zarê xesûya xwe fêr bûye, ku xesûya wê ji Rojhilatê Kurdistanê, ji hêla bajarê Makûyê bûye û çîroka vê stranê li wir qewimiye.

Fatima Îsa, ji gencîneya xwe ya dewlemend hew van 5 stranên ji bo radyoyê distrê, lê folklorîst û pisporê zargotina Kurdên Kafkasyayê; Celîlê Celîl, Nûra Cewarî û Tosinê Reşîd ji ser zarê wê gelek stran, kilam û teqalîdên Kurdewarî dinivîsin.

Sê sînemakarên navdar vê strana Fatima Îsa ya bi navê *Miho* di filmên xwe yên sînemayî de bi kar tînin. Yilmaz Guney, di sala 1978'an de, di filma xwe ya bi navê *Kerîde*; Sêrgêy Parancanov, di sala 1968'an de, di filma xwe ya *Rengê Hinarê de*, Frûnzê Dovlatyan, di sala 1990'î de, di filma xwe ya bi navê *Hisret* de bi kar tînin. Herweha ev stran, di albûma Dengê Jinên Kurd ya ji aliyê Kom Muzîkê ve hatî belavkirin de jî hatiye danîn.

Di dîroka destanên Kurdî yê li ser evîne de strana *Miho* yek ji wan kêr serpêhatîyan e ku evîndar bi bext û mirazên xwe di dawiyê de şa dibin. Belkî jî ji ber vê yekê ye ku di nav gel de ev stran hatiye çespendin, hezkirin û bûye straneke gelêrî. Lê bi deng û şîroveya Fatma Îsa ev strana eşqê bûye efsaneyek di nav Kurdan de. Lewra jî bi vê kilamê ew hate naskirin û qîmetkirin wek dengbêja gelêrî hate çespendin û ev stran li seranserî Kurdistanê belav bû.

### Xatirxwastina Fatima Îsa

Bi destpêka şerê di navbera Ermenî û Azerîyan û Qerebaxê de rêwşa siyasî û aborî ya Kurdên li wan dewletan jî têk diçe. Malbata Fatima Îsa jî koçber

dibin û diçin Rûsya, li herêma Krasnodarê, li navçeya Korênovskê li bajarokê Platnîrovskê di-hêwirin. Îro di vî bajarokî de 200 mal hene ku nêzikî 1000 kesî jê Kurd in.

Fatima Îsa, di maleke sade de, bi xeml û xêza xwe ya Kurdewarî, bi zargotin, stran û kilamên Kurdî têt û tije, ku tu carî çûn û hatina mêvanan ji mala wê xalî nabe û ew li ser qedr û qîmetê xwe diji. Di 15.01.2010'an de, ji ber nexweşiya dil, di 76 saliya xwe de diçe ser dilovaniya xwe. Heta têt alîgorkirin stran û kilaman li ber serê wê dibêjin û wê bi stranên wê binax dikin. Tirba wê li nav mexbera Kurdan a vê herêmê hatiye çêkirin û hêkelê wê li ser tîrbê hatiye danîn.

<sup>1</sup> Brûkan: Birokiyan

<sup>2</sup> Şûkirin: Mêrkirin / Ji bo jinan zewicîn.



## Miho

Erê Miho, li me daye stêrka xûl e, stêrkê li me daye, stêrka xûl e  
 Hê Miho, şewqê daye guhera Şêx Resûl e'w  
 Şewqê daye guhera Şêx Resûl e  
 Hê Miho, were herdu xwînê mala bavê min e li ser mala bavê te ne'w  
 Hê kuro, gede were ramûsanekê mi keremke pêşve mi qebûl e  
 Miho wî wî wî, wî wî wî, wî wî wî'w

Hê Miho, vê bilûrê guveguv e, Mihemedo vê bilûrê guveguv e  
 Li ber simbêla Mihokê min a zer e, zer dilive  
 Hê hege, hûn ê Mihokê min nas dike wê nas bike  
 Hûn nas nakin, gustîla destê Mihokê min a argaşiv e  
 Miho wî wî wî, wî wî wî, wî wî wî'w

Hê Miho, dilê mi sêleke di hesinî, der dizeke havê min î  
 Dilê mi sêleke di hesinî, der dizeke havê min î  
 Hê de binêr dasekê dabû destê şiv hespa hespê Mihokê xwe ra gîha jê diçinî'w  
 Hare kuro gede were hîva sorsedînê wa nemîne ti vî bejinî  
 Miho wî wî wî, wî wî wî'w

Ware Miho, w'ez ê çûme goma jorîn, goma miyan e  
 W'ez ê dilivîme goma jorîn, goma miyan e  
 Hê Miho, morî û minciqên zenda zer qetyane  
 Morî û minciqên zenda zer qetyane'w  
 Hê şevêkêê, di êvar da wextî ez û qîzmetê lê geriyane  
 Li guhêra, şax û keta, di salixa, di sûlîxa cêba Mihemedê mi da salix dane'w  
 Miho hey wî wî wî wî wî wî wî  
 Miho wî wî wî, wî wî wî wî'w



## Şêro Dîno Lewendo

Sebyan bajêr hizhizî bi lê canê lê canê  
Binya bajêr hizhizî şêro dîno lewendo

Şûşa dilê'm derizî bi lê canê lê canê  
Şûşa dilê'm derizî şêro dîno lewendo

Derdê'm keçika bi kezî bi lê canê lê canê  
Derdê'm keçika bi kezî şêro dîno lewendo

Serya bajêr bi genim e bi lê canê lê canê  
Binya bajêr bi genim e şêro dîno lewendo

Sê siyara himehim e lê canê lê canê  
Van siyara bi himehim e şêro dîno lewendo

Derdê'm keçika hakim e lê canê lê canê  
Derdê'm keçika hakim e şêro dîno lewendo

Serya bajêr bi sûs e bi lê canê lê canê  
Binya bajêr bi sûs e şêro dîno lewendo

Sê siyar têne casûs e lê canê lê canê  
Sê siyar têne casûs e şêro dîno lewendo

Derdê'm keçika nêmiş e lê canê lê canê  
Derdê'm keçika nêmiş e şêro dîno lewendo

Bîra Muzîka Kurdî Ya  
Konservatuara Aram Tîgran  
No: K-088  
Çavkanî: Fatma Îsa  
Dîroka Notadanînê: 21.11.2015

Notadanêr: Êrîş Dervîşoğlu  
Sererastkirina Notayan: Evren Koç

♩ = 120

Amûr...

7

Seb yan ba jêr hiz hi zîb lê ca nê

12

lê ca nê bin ya ba jêr hiz hi zî şê ro dî no le wen do

### Jêder:

- Ji lêkolîna rewşenbîr û rojnamevan Pîrskê Miho ku ji bo Tv'ya Kurd1, bernameya "Dengê Axê" lêkolîna wê kiribû.
- Ji broşura kasetê ku Kom Muzîkê Çapkîrî ya bi navê "Dengê Jinên Kurd, Gulşenî"
- Ji berhevkirina lêkolîner û nivîskar Mahmut Begîk ev berhevkarî hate berdest kirin.
- [Http://www.semskiasireti.com/?Syf=15&cat\\_id=126&baslik\\_nâme=RKFUTUEga](http://www.semskiasireti.com/?Syf=15&cat_id=126&baslik_nâme=RKFUTUEga)
- [www.yuksekovahaber.com](http://www.yuksekovahaber.com), Fatma Îsa hayatîni kaybetti.

# Dewrêşê Şêx 'Evdî



Berhevkar:  
Seîdê ÛSIV

Cime'eta hazir bira niha bêje Cesîmê Dengzêrîn, ez ê niha ji we ra kilama Dewrêşê Şêx 'Evdî bibêjim, dixwaziya mi ew e hûn jî gu[h]ê xwa<sup>(1)</sup> bidnê.



Ê lê yadê wê, dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
 lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo dilê mi liyan e  
 Serê dilê mi bi çul û derd e gidî binê dilê mi dûman e  
 Birawo bi gotinê gotinbêja dibê Se'îd û elhano bira ne  
 Ez bala xwa didimê keko dibê du fidan in  
 Rêbbê mutehelî Xwadê da dane  
 Birawo zeman zemanê bêbavan e  
 Heyam heyamê bed 'eslan e  
 Geleka pîlanê inda<sup>(2)</sup> kirina her di<sup>(3)</sup> zilama hevdi ra qirar dane  
 Yê mezin Se'îd e navê yê piçûk<sup>(4)</sup> elhan e  
 Se'îd kire gazî go elhano bira eva welatê hanê welatê namerdane  
 Oxil<sup>(5)</sup> bike tivdarekê kewrane<sup>(6)</sup>  
 Em ê berê xwa bidne xîmê binê beriyê çiyê lihing û hûtan e  
 Lawo mêrkê camêr nebîne derdê bê dermane  
 Li vî mi hûtê hanê kese nahejîne qevzê jîmane  
 Kes nasekine ber alafê<sup>(7)</sup> mêrane  
 Wêl wêl wêl wêl wêl xeyo!



Cesîmê Dengzêrîn

Ê lê yadê wê, sed car dilê mi liyan e  
 Se'îd û elhan ho kirin deve, qantira mîratê methepanyane<sup>(8)</sup>  
 Birawo ketne serê rê û dirbane  
 Mi bala xwa dayê heft roja ajotin bi rê da ne  
 Dayê rêka dûri dêraz e<sup>(9)</sup>, gele[k] gotinê girane  
 Ro kete rojê heyştane  
 Bala xwa didayê mi go rastek e rast wusan e  
 Yeqîn dikim qûm li çokê hespan e  
 Jê ra dibêjin xîmê binê beriyê çiyê lihing û hûtan e  
 Mi dîn û bala didayê dibêje êlekê daniye li serê rast û bestan e  
 Dîn û bala xwa bidê dibê hetanî mi go sê hezar mal di hêşya çonê girane  
 Hela tu bala xwa bidê dibê çonê li ser tacê çonan e  
 Birawo di orta çon da heft hew<sup>(10)</sup> perde girê dane  
 Ez ê ji we re ayrî ayrî<sup>(11)</sup> bidim salîxê van perdane;  
 Keke birincî<sup>(12)</sup> perde yêra<sup>(13)</sup> rûniştandina 'egad û 'irfata,  
 boxe berana, serega, nijdevan e<sup>(14)</sup>  
 İkîncî<sup>(15)</sup> yêra xaniman û caryan e  
 Birawo ûçûncî<sup>(16)</sup> yêra tewngirê<sup>(17)</sup> diki nexş û nemûşê girane  
 Ez ê ji we ra bêjim dortincî<sup>(18)</sup> çalê li ber çonan e  
 Birawo bêşincî<sup>(19)</sup> hozê miyan e  
 Altîncî<sup>(20)</sup> kozê berxan e  
 Di\* pişt perda da ayreten<sup>(21)</sup> yêra tewla mi go meregiyan e<sup>(22)</sup>  
 Ez bala xwa didimê dibê du hew kevirê luxlux antîke bi tê ra bi dardan e  
 Qîzi bûkê Kîkani, Mila lê top dibin ber dîkin nexşî nemûşê girane, waê

Ê lê yadê wê, sed car dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
 lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo dilê mi liyan e  
 Mi bala xwa didayê Se'îd gote got elhano bira vegere derê vî çonê hanî girane



Oxîl îro hêf[t] roj e em dajone serê rê û dirbane  
Lawo ji birçîna taqetê me tune, qudûmê çokê me nemane  
Lawo destê me nagre dizgînê hespane nigê me nagre rikêfê zenguyane  
Mi bala xwa didayê hêr di zilama ho kire devane mîratê methenyane  
Ajtine derê wî konê girane  
Bala xwa dayê mi go pêşiya van zilama sêsid mêrê xwuyê kulik, 'ebane  
Birawo dibêje çêkirine birincê Qereçamê dûvê hilikan e<sup>(23)</sup>  
Zendê wan hêtanî 'enîşkê di doni rûn da mane  
Selam dawûne<sup>(24)</sup> cima'eta wane  
Kêsekî nego evna xerîb in ne j' êlê ne, ne j' 'evrê<sup>(25)</sup> ne, ne j' van deran e  
Mi bala xwa didayê dibê kesekî nego evna xerîb in ne j' êlê ne, ne j' 'evrê ne, li van derane  
Ji bo Xwadê bixwun qote nane<sup>(26)</sup>  
Se'îd çav kire elhane  
Go elhano bira eva welatê hanê welatê namerdan e  
Oxîl vegere ez bala xwa di[di]me kulik, 'ebayê serê van zilama me ş' xwa ra nakin golikvanê  
guhê gundane  
Lawo qote nan nadne me hêr di rêwiyane  
Lawo welatê me axirdewran e  
Mi bala xwa didayê Se'îd û elhan ho kirne deva û qantira mîratê methenyane  
Birawo menzîlekî ajotin memzîleke girane  
Bala dîna xwa didayê konêkî tek danyê li serê rast û bestane  
Kalekî nûranî rûniştiye derê kon da ne  
Birawo riyê wî spî ye li ser çokan e  
Mi bala xwa didayê tizbîke sed û yek lib di destan e  
Li ser postekî nimêjê rûniştiye ji xwa ra dikşîne selawat û urdane, waê

Ê lê yadê wê, sed car dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo dilê mi liyan e  
Se'îd kire gazî go elhano bira bajo derê vî konê hane  
Lawa ez texdîra vî merivî dinêrim merikî Busilman e<sup>(27)</sup>  
Oxîl ji bo Xwadê îro hêf[t] roj e birçîna taqetê me tune,  
qudûmê çokê mi nemane  
Lawo mi go peya [be] em bixwun qote nane  
Mi bala xwa didayê Se'îd û elhan ho kirne devane, qantira mîratê methenyane  
Ajtine derê wî konê girane  
Selam dane wî kalê nûranî, ew kalê nûranî hema rabû ser darê piyane  
Go lawo ji bo Xwadê derbas nebin mi go peyabne konê girane  
Mi bala xwa dayê ew kalê nûranî dibêje mi go malxirabo,  
ew kalê nûranî girtiye serê hespane  
Dibêje kete bin milê Se'îd û elhane  
Peya kiri mi go alê konane  
Doşgeke qûştûkî<sup>(28)</sup> navîtye binê wane  
Zîn û pûsatê hespa li piştê mi go vekirin  
Ev heywanê hanê berdane serê rast û bestane

Ê lê yadê wê, dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo dilê mi liyan e  
Ew kalê nûranî li pêşya Se'îd û elhan diçe tê jê ra dike xizmeteke girane  
Îja<sup>(29)</sup> Se'îd jê suwal kir go apo tu mezin î, riyê te spî ye li ser çokane  
Yaşê te<sup>(30)</sup> derbas bûye, 'emrê te gêçgîn e<sup>(31)</sup>, diran li-[di] devê te da nemane  
Tu ser piya diçî tê ji me ra dikî vê xizmeta hane  
Ji me ra ne baş e belê ne şerefa mêran e  
Ewî kalî kire gazî go lawo hûn xerîb in ne j' êlê ne, ne l' 'evrê ne, li van derane



Oxil îşê we tune vaş gilî, gotinê hane  
Lawo ħurmeta mêvana daîm cara ji bona Xwudan e, waê

Ê lê yadê wê, dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo dilê mi liyan e  
Se'îd go apo me ajote serê rast û bestane  
Mi bala xwa didayê dibêje êlekî tek daniye li serê rast û bestane  
Konekê giran li hêşya çonan e  
Orta çon da ħef[t] ħew perde girêdane  
Go apo ewa êla kê ye?  
Go lawo wûn<sup>(32)</sup> xerîb in ne j' êlê ne, ne j' 'evrê ne, ne l' van derane  
Oxil ewa êl êla mi go dibê aXayê Mîrê Milan e  
Ê go apo ew çerebaliXek di nava wê êlê da hewû<sup>(33)</sup>, ew çî bû?

Ê lê yadê wê, dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo dilê mi liyan e  
Go lawo ewa êla, êla aXayê Mîrê Milan e  
Ji wî ra hatiye kaXiz, nama gawirê Çil Osman e  
Ê go apo sebeb?  
Go lawo jê dixwaze dewa xeraca ħef[t] salane  
Lê dike dewa sed xortê başpelewane  
Lê dike mi go dewa sed qîzê destê wan gustîla, lingê wan zenguyane  
Lê dixwaze dewa sed pîrê xwuyê teşî çulyane  
Lê dixwaze rewşa çonê 'Erebî ce'niya mi'îna Leylane<sup>(34)</sup>  
Yan jî dibê tê bi destê zorê sorgulyê 'Edûla qîza xwa



bigrî mi ra têkî kevanyâ mala girane  
Ê go apo sebebiya wî çî ye?  
Lawo go gawir e mi go şî xwa ra lê dike xeraca girane  
Îja Se'îd jê suwal kir, go apo tu kî yî, tu çî yî, tu çî kesek î,  
te çîma aha tek daniye, tu naçî nava wana?


Ê lê yadê wê, dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo dilê mi liyan e  
Lawo ez heme Şêx 'Evdî me, bavê Dewrêş im, go 'emrê mi nodi nehan e  
Se'îd kire gazî go apo me navi dengê Dewrêş bihîste li welatê şerqê di nava avdê tewnane<sup>(35)</sup>,  
li cima'etê di girane  
AÛao wexta dibêje zilam radibin mêr top dibine cima'etê girane  
Dikin naqil-nuqilê Dewrêşê lawê te, îja diwê kuçê tey li ku ye?  
La'wo diwê 'edetê mala me ye gava bikevne xewê heft roja  
ranabin ji xewa hingolê xewa girane  
Lawo îro çar roj e Dewrêş razayê hê sê rojê Dewrêş mane  
Mi bala xwa dayê Se'îd kire gazî go apo xazila<sup>(36)</sup> xêr û mirazê Xwadê ra mi bidîta qet û qametê<sup>(37)</sup>  
Dewrêşê lawê te ku ça[wa] ji me ra gotine ya usan e

Ê lê yadê wê, dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo dilê mi liyan e  
Mi dîna xwa dayê dibê Şêx 'Evdî lingê xwa lê da serê mi go papûça di me'sane  
Diçû mi go derê çadira Dewrêşê lawê xwu dane  
Îja yê jê ra bêje du benda ne  
Çî kanê guhê xwa bidmê bendnê gotina bav birawo ji ewlad ra ça[wa] ne  
Wêl wêl wêl wêl xeyo!

Digo de rabe hê hê hêêê, digo Dewrêşo de rabe, lehingo de rabe,  
hûto de rabe dilê mi liyan e  
Lawo de rabe serê xwa rakê ji xewa hingolê xewa girane  
Lawo hatye çonê me mi go du hew mêvane  
Oxîl xerîb in ne j' êlê ne, ne l' 'evrê ne, ne l' van derane  
La'wo çoli bestî dane pêşya xwa dane  
Oxîl mi go salixê te jê ra bi gotinê gotinçiya dane  
De ca tu rabe ji herd<sup>(38)</sup> zilama ra bike xizmeta girane  
Bira li welatê me diçin nekin tu xema xiyalane, waê

Xeyo dilê mi liyan e  
Mi bali dîna xwa didayê Dewrêş radibû serê xwa rakirye şî xewa girane  
Birawo xulam girtine bi qulpê mîsin û legana avê davêje nava birî bijagane<sup>(39)</sup>  
Mi bala xwa didayê pêjgi<sup>(40)</sup> mi go ser milan e  
Hate derê dibêje ez çadira de mi go Şêx 'Evdî dane  
Şêx 'Evdî go lawo musadeya herd zilaman e

Ê lê yadê wê, dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo dilê mi liyan e  
Se'îd û elhan bala xwa didanê li bejn û bali qet û qametê Dewrêş,  
bejna Dewrêş mi go fena minarê camiyane  
Biraio bîlegê<sup>(41)</sup> wî notanî<sup>(42)</sup> çokê nişane<sup>(43)</sup>  
Keço ew nişê ku bide pêşî heft hew qenter deve bikşîne kewrane  
'Eniya wî birawo buhustek çar tilyane  
Ez bala xwa dime birî bijanga du miyê ezraîl dûr va<sup>(44)</sup> pêş xuyan e, waê



Xeyo dilê mi liyan e

Mi dîni bala xwa didayê Şêx 'Evdî kire gazî go lawo misadeya herd zilaman e  
Lawo tu j' her di mêvanê mi ra bike xizmeta girane  
Bira li welatê me diçin nekin tu xemi xiyalane, waê

Ê lê yadê wê, dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo sed car dilê mi liyan e  
Ku gava dibê Şêx 'Evdî salixê Se'îd û elhân Dewrêş bi hevdi ra dane  
Bala dîna xwa didanê siyarek tek derkete li peşê çonan e  
Birawo methênîke di bin da ne  
Ew hespana ne mînanî hespê welatê mey şerqê ne mîna van belgîrê mey hane  
Çeko li xîmê binê beriyê bi linga têne firotane  
Birawo rîmeke nezerî di desta da ne  
Hef[t] şaxê rîmê hene;  
Ez we ra ayrî-ayrî bidim salixê van şaxê rîmêne  
Mi bala xwa didayê yek lal e birawo ye duş e, yek 'umrût e, yek zimût e, çar,  
di ortê da pûrta çeyrê Leman e<sup>(45)</sup>  
Serê mîrîta rîmê li hewan e  
Birawo ez bala xwa didimê orta rîmê diçeyîse<sup>(46)</sup> sade ji jerya<sup>(47)</sup> merane  
Mi bala xwa dayê selam dawû dibê cima'eta wane  
Îja Se'îd jê suwal kir go apo lê eva kê ye?  
Go lawo eva heye kuşê xwûşka mine ça Ce'ferê Kêsane  
Lawo eva rîya heft qonaşa ji me wêda ne  
Gava bikeve şerê lihing, hûtane  
Ancax Dewrêş digre bi serê hespa ew dujmina ra dikeve laqirdiyane



Ê lê yadê wê, dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo sed car dilê mi liyan e  
Gava Şêx 'Evdî mi go salixê Se'îd û el'han Dewrêşê xwu mi bala xwa didayê dibêje  
Ce'ferê Kêsan hevdi ra dane  
Bala dîna xwa didayê 'Erebekê tê ji wêda ne  
Birawo lêva 'Ereb yek 'erd e yek asîman e  
Nûra Rehman tune li ruya, dibê namekê li berîka wî da ne  
Dibê salam daye cima'eta girane  
Şêx 'Evdî kire gazî go 'Ereb kerem ke derbas be jora hane  
'Ereb li bin piyê odê sekinye mi bala xwa didayê hin sekinye ser darê çogane  
Name derxist da destê Şêx 'Evdî dane  
Şêx 'Evdî bali dîna xwa didayê name nama dibê ji a'xayê Mîrê Milane  
Dibê bira Şêx 'Evdî kerem ke were cima'eta girane, waê

Ê lê yadê wê, dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo sed car dilê mi liyan e  
Mi dîni bala xwa didayê dibêje Şêx 'Evdî go lawo wûn rûnên ez ê qasekê berê xwa bidme çonê  
Mîrê Milane  
Lawo ez bala xwa dimê çî ka çî deme berxê çî dewran e  
Mi bala xwa didayê Şêx 'Evdî lingê xwa lê da serê papûçani me'sane  
Birawo berê xwa dida çonê a'xayê Mîrê Milane  
Dîni bala xwa didayê salam daye cima'eta girane  
Dibê a'xayê Mîrê Mila go Şêx 'Evdî kerem ke derbas be jora hane  
Go lawo mi go dibêje ne qûna mi ya doşegan e  
O'xil tilî pêçiyê mi ne yê birincê Qereçamê dûvê hîlikan e  
Ma hêrizê kuşê ma hêrizê te gede û gude golikê ber çêleka  
to[p] kirine nava êla xwa da ne  
Lawo tu jê ra dikî vê xizmeta girane  
Lawo namûsa mêrê Busilman ne bi peran e  
Mi dîni bala xwa didayê dibê Şêx 'Evdî serê xwa bilin[d] kir go qe'hwêçiyê serê mi dêşe dilê mi  
dila dilkî dîne  
Lawo mi go ewa fîncana şerta bi şûrta biye mi go arava çekayê<sup>(49)</sup> lawo tu birêje yênide<sup>(50)</sup> yekî  
bikêlîne  
Îja li pêşiya xwuyê kulik 'eba bigerîne bira dilê kesî mi nemîne  
Mi bala xwa didayê dibêje qe'hwêçî gava qe'hwê digerîne li pêşya xwuyê kulik 'ebane  
Reben ez im kes newêre awira xwa bide îskana şerta bi şûrtane  
Gava ber be Şêx 'Evdî bavê Dewrêş tîne  
Şêx 'Evdî destê xwa davêje fîncana şerta bi şûrta nava devi lêva da diqulbîne  
Mi go tîrqe-tîrqê dibê xwuyê kulik 'eba pê kenyanê  
Şêx 'Evdî berê xwa dawû çadira Dewrêşê kuşê xwu wê ji kuşê xwa ra bêje du bendane

Waxtê Şêx 'Evdî çû çadira a'xayê Mîrê Mila, îja a'xayê Mîrê Mila jî zemanê ki wî ra hate nama Çîl Osman, a'xayê Mîrê Mila jî 'eşîr û êla xwa tev to[p] kiriye, heft roj e jê ra xizmetê dike, îskana şerta-şûrta datîne, dibê; "kê here pêşiya eskerê Çîl Osman, ciwaba Çîl Osman bîne, pê ra şer ke, koka eskerê Çîl Osman bîne ez ê 'Edûla qîza xwa bidmê." Îja heft sal biye dilê 'Edûla qîza Mîrê Mila bi Dewrêşê Şêx 'Evdî di hev da biye. Şêx 'Evdî waxtê kî dişîne xwazginiyê 'Edûlê îja Mîrê Mila qîza xwa nadê, dibê; "ez 'eşîr im tu Êzdîy, 'eslê te Êzdî ye pîrê te şeytan e, ez qîza xwa nadme te." Wê çaxê Şêx 'Evdî jî ji wan xeyîdî biye yanê; qe'herî biye çonê xwa ji Mîrê Mila tek daniye, naçe nava wan. A'xay xwa ra bêjim, zemanê Şêx 'Evdî diçe nava çonê Mîrê Mila isa îskana şerta-şûrta dixwe, îja tamam bi Şêx 'Evdî dikenin dibê; "emrê wî derbas bûye nod [û] nehane teze rabiye dibê yê here bîne ciwaba sê hezar eskerê Çîl Osman. Dibê, bi laf-lûfa... Wê çaxê zora Şêx 'Evdî pir diçe vedgere çonê xwu îja ê dengekî gazî Dewrêşê lawê xwu ke, ka çika jê ra bêje çî.





Ê lê yadê wê, dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
 lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo dilê mi liyan e  
 Digo Dewrêşo de rabe, gedewo de rabe, lehingo de rabe  
 hûto de rabe, gurê pişt hêşîno de rabe  
 Lawo mi ajote derê çonê axayê Mîrê Milane  
 Lawo mi îskana şertani şûrta avîtye nava devi lêvane  
 Lawo biye tîrçe-tîrqa xwuyê kulik 'eba tamam bi bavê te kenyanê  
 Oxil sibê xel[k] te nake mi go golikvanê guhê gundane  
 Mi bala dîna xwa didayê Dewrêşê Şêx 'Evdî rabû ser darê lingane  
 Mi dîni bala xwa didayê mi go vê sibengê dibêje Ce'ferê Kêsan rabû ser darê lingane  
 Wê çaxê Se'îd gazî kire elhân, go elhano bira eva derdê hanê bêderma[n] hatiye ser milê vî zi-  
 lamî hanê çayê bi tenê  
 Lawo hevalê mêrkê tenê tek xwudane  
 Oxil mi go em ê berê xwa vî zîlamî ra bidne mirinê roja girane  
 Lawo gor bavê xwuyê deva hespane

Ê lê yadê wê, dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
 lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo sed car dilê mi liyan e  
 Mi bala dîna xwa didayê Se'îd û elhân, Ce'ferê Kêsan, Dewrêşê Şêx 'Evdî  
 berê xwa didane mi go çonê axayê Mîrê Milane  
 Bali dîna xwa didayê xwuyê kulik 'eba pê da pê da rûniştine  
 Lawo kulik kirine orta îmanê û birî bijangane  
 Destê wan heta 'enişkê di doni rûn da mane  
 Çêkirine birincê Qereçamê dûvê hilikane  
 Mi bala xwa didayê jor da meşyane ser sinyane  
 Mi dîni bala xwa didayê dibêje salam dabûne cima'eta girane



AĶayê Mîrê Mila go Dewrêş kerem ke derbas be jora hane  
 Go law bi milê Mîrê Mila girtin go ra[be] yêra te der hane  
 Dakeve binê mi go solane  
 Mi dîna xwa didayê mi go Dewrêşê Şêx 'Evdî, Se'îd û elĥan, Ce'ferê Kêsan mi bala xwa didayê  
 dane ser doşega li xwu ber piyê mêvana disekine ser piyane  
 Ƙula Xwadê birawo bi Ƙul be têkeve derê mala 'Edûla qîza aĶayê Mîrê Milane  
 Birawo bi sêsid û şêst û şeş ƣevza<sup>(51)</sup> xwa xemilandye zift<sup>(52)</sup> berdaye gerdenê bi biryane  
 Birawo ez bala xwa didimê mewûja reş li gerdenê xûyane mêji li tilyan e  
 Îsal ĥef[t] sale mi go dilê wê Derwêş da ne  
 Dewrêş birîndar e notanî firarekî meriv bîst û çar sala  
 bigere li firaryê gule bi nuxte bavêje dil, hinavane  
 Isa awir radide Dewrêş da ne  
 Mînanî oxçik<sup>(53)</sup> tîr ƣevanê dayê meriv mi go bavêje nava dil, hinavane  
 Miñ ê dîna xwa didayê Dewrêş serê xwa bilin[d] kir go  
 qeweçiyoy serê mi dêşe dilê mi dila dilkî dîn e  
 Lawo ewa fîncana şerta bi şûrta biye arava çeka birêje yêlide yekî bikelîne  
 Oxîl li pêşya xwuyê kulik 'eba bigerîne bira dilê kesî mi nemîne  
 Mi dîna xwa didayê dibêje qeĥweçî dike dilezîne  
 Mi go qeĥwekê yêlide dikelîne  
 Li pêşya xwuyê kulik 'eba digerîne  
 Reben ez im kes newêre destê xwa bavêje î pêşya îskana şertani şûrtane  
 Îja ber be mi go Dewrêşê Şêx 'Evdî tîne  
 Dewrêş destê xwa davîte fîncana şertani şûrta mi go ser xwa da diqulibîne  
 Nîvekî îskana şertani şûrta dane dibê elĥan nîvek dane Se'îd, Ce'ferê Kêsan e  
 Dewrêş hema rabû ser darê piyane  
 Gote xwuyê kulik 'eba go ĥelĥel mi devê maka we gao!  
 Lawo 'emrê bavê mi nodi nehan e  
 Oxîl diran di devê bavê mi da nemane  
 Lawo bavê mi fîncana şertani şûrta daye nava devi lêvane  
 Biye tîrçe-tîrçe we temam hû[n] bavê mi kenyan e

Ê lê yadê wê, dilê mi liyan e lo  
 lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo sed car dilê mi liyan e  
 Mi bala xwa didayê Dewrêşê Şêx 'Evdî girtiye bi singê serhêşya ƣon<sup>(54)</sup>  
 rakiry e bi milê xwuyê kulik 'eba digre yek ĥew lê dane  
 Birawo mi bala xwa didayê kulik ketine destê mi piyane  
 Dibê şivqelûnê desta da bûne şeş parçane  
 Gelekê wan serê wa[n] xwûn in piştê xwa dane cihêzê devane  
 Mi dîna xwa dayê Se'îd, elĥan, Ce'ferê Kêsan, Dewrêşê Şêx 'Evdî  
 bi isa kiriye zilam di nava ƣonda da nemane

Xeyo dilê mi liyan e  
 Mi dîna xwa didayê dibê Dewrêşê Şêx 'Evdî, Se'îd û elĥan  
 vergeryane ƣonê Şêx 'Evdî da ne  
 Go Şêx 'Evdî bike kari barê mi go bikşîne mîratê hespane  
 Îja Şêx 'Evdî çû pêşiyê go Dewrêş lawo navê hespê mi 'Etmann e oxîl yê te Hetlan e  
 Lawo dibêje îsal ĥef[t] sal e mi go ƣav nedîne ji dervane  
 Lawo di 'işkiyê da xwarina wana ji dizwane  
 Oxîl tu were li hespê çê siyar be lawo ĥeyata mi çûye li ser nabenê zînane  
 Lawo tu were siyar be li 'Etmann e, 'Etmann hespê bavê te ye,  
 bi rojê oxîrmê giran lawo tu dimîni bêt xwayê nava duşmane<sup>(55)</sup>  
 Lawo sibê bêt 'erîne lawê bavan e dengê kose li misilyane şinginiyê şûrane  
 Lawo 'Etmann hespê bavê te ye, pê ra dide ber lekmani<sup>(56)</sup> gezane



Ji paça dide ber refesani <sup>(57)</sup> çiftane <sup>(58)</sup>  
Lawo mîratê Hetlan serñîşk e zû nazvire li ser dizgîna dujminane

Ê lê yadê wê, sed car dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo dilê mi liyan e  
Dewrêş digo Şêx 'Evdî aqil çûye sewda li serê te nemane  
Ez li hespê çê şiyar im hespê xiraw bidme van birayê xwuyê hane  
Xwade şuxîla mi nayne serê rê, dirbane  
Tu hespê xwa bide Se'îd dayka herd hespa Gulşahîn bide elhan e  
Hemî Ce'fer li hemdalyê <sup>(59)</sup> xîmê binê beriyê siwar e bi linga tê firotane  
Mi go eger 'ecelê mi hatibe li ser mîratê Hetlane  
Em ê berê xwa bidne o'xirê piştta xwa bidne felekê xayîn e derew e, belê ji kesî ra nadomîne  
serê rê, dirbane  
Min ê dîna xwa didayê Şêx 'Evdî dike kari barê hespane  
Birawo dizgînê mi go wan vê sibengê dibê zînê ser piştê dane  
Van zilama xatirê xwa xwastin ji Şêx 'Evdî berê xwa dane mirinê bi o'xira girane  
Mi dîni bala xwa didayê ketine serê rasti bestane  
Îja ciwabekê çûye ji 'Edûla qîza Mîrê Mila ra Dewrêşê di vê rê ra here ser Çîl Osmane

Xeyo dilê mi liyan e  
Mi bala xwa didayê 'Edûla qîzê Mîrê Mila refê qîzani bûka  
li ser xwa daye şitafekê, daye morî ênciyane  
Birao mewûja reş di gerdenê xuyane, mêjî li tilyan e  
Diçû pêşiya mi go Dewrêş da yê jê ra bêje du bendane  
Çi kanê ez bala xwa bidnê benda gotina 'Edûla Mîrê Mila ji Dewrêş ra ça[wa] ne  
Wêl wêl wêl wêl xeyo!

Digo de lo lo hoyê de lo lo hoyê hoyê hoyê hoê hoyê  
Dewrêşo de were lehingî de rabe, hûto de were de rabe dilê mi liyan e  
Hey mala te şewityo were bavê mi te d'xapîne  
Riya çûyîn-nehatinê mala te şewityo eskerê Çîl Osman sê hezar e jê kêmtune ne  
Hey mala te şewityo serê mi dêşe dilê mi kîn e wê bi mi kîn e  
E[z] dizanim mirazê mi te li vê Rebbê 'alemê li vê dinyayê hev ayrî be lawo layîq nîn e

Dewrêş kire gazî go tölê <sup>(60)</sup> de rabe serê rê û dirbane  
Ez ne gede me ne gûde me têkevme ber taldê tepik jina li devê avane  
Kê gavê mi aniyê ciwaba gawirê Çîl Osman e,  
mi bi rayê mi bi rayê bi Raħimê Reħmane  
Ez ê ji bavê te ra bikim şerê girane  
Ez ê bi gotina Xwadê bi hedîsa pêxember te ş' xwa ra têkim  
kevanya mala girane, de lê lê

'Edûlê digo Dewrêşo hey mala te şewityo serê mi dêşe dilê mi kîn e wê bi mi kîn e  
Hey malxirabo ca rabe destê xwa bavêje ber pêsîra mi sî û sê sedef li ser hev da sekinîne  
Lawo liwa-liwa li serê sedefa biqetîne  
Îja xemê dilê xwa pê bişevîne  
E[z] dizanim mirazê mi, te ji Rebbê 'alemê li hev ayrî be lawo layîq nîn e  
'Edûlê destê xwa davîte hustiyê Hedwan da,  
Dewrêş bi milê 'Edûlê digre du sîla lê dide davê dera hane  
Qamçîk avîte Hedlane  
'Edûla qîza Mîrê Mila tevî hevala veşerîya pozî-poşman e  
De lo lo ho ho ho waê



Ê lê yadê wê, dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo sed car dilê mi liyan e  
Serê dilê mi bi xuli derd e, gjdi binê dilê mi dûmane  
Mi bala dîna xwa dayê van her çar zilama dibêjin heft roja ajotin bi rê da ne  
Birawo ro kete rojê heyştane  
Bala xwa didayê êlekî danyê li serê rasti bestane  
Hinek dibê mij e hinek dibê dûman e, hinek dibêji weke xîzê devê çeman e  
Hinek dibêji weke stêrkê asîman e  
Serê êle heye binî ne xûyan e

Xeyo sed car dile mi liyan e  
Gava meriv bajo mi go ku nava elê girane  
Daîm cara êl ki hene ser ove ne  
Li milê rastê xonekî tekî xona çadireke alsincax ew daîm cara xonê axâyê êlan e  
Sed car dilê mi liyan e  
Mi bala dîna xwa didayê Dewrêşê Şêx 'Evdî, Se'îd û elhan, Ce'ferê Kêsan ajotne derê wî xonê  
girane  
Bala xwa didanê xanimêk sekinye li derê xon da ne  
Xula Xwadê bi xul be têkeve beyta <sup>(61)</sup> bavê xanimê, porê wê fenanî mi go dibê şîrîte dorê xona  
li 'erdê kowv <sup>(62)</sup> bûne mane  
Yeman bejna wê mînanî xaka rihanê  
Birawo mi bala xwa dayê mewûja reş li gerdenê xuyan e  
Mi go vê sibengê fenanî hîva çardan e  
Birawo hema girtiye serê hespê Dewrêş da ne  
Go birawo ji bo Xwadê derbas nebin bixwin qote nane  
Îja Derwêş lê suwal kir, go lê lê xwayê eva  
êla hanê go serî heye binî ne xûyan e eva êl êla kê ye?  
Go birawo dilê mi deman e  
Eva êla hanê êla dibê gawirê Çil Osman e  
Ê go xwayê tu dibê êla Çil Osman e, ez bala xwa [di]dime nava êlê ji xêncî xalê heftê salî, pîrê  
heftê-heştê salî kese di nava êlê da tune, evana ça[wa] bûne?  
Go birawo tu ne j' êlê yî, ne j' 'evê yî, ne j' van deran î, çima tu nizanî tamam top bûne çûne ser  
axâyê Mîrê Milane  
Go sebebîya wê çi ye?  
Go birawo çima tu nizanî lê dixwaze dewa xeraca hef[t] salane  
Lê dike dewa sed qîzê destê wan gustîla, lingê wan zenguya ne  
Lê dixwaze dewa sed xortê başpelewane  
Lê dixwaze dewa sed pîrê xwuyê teşî kulyane  
Lê dixwaze dewa řewşa xonê 'Erebî ce'niya mî'îna Leylane  
Dibê yan jî řerê mi řer e, cenga girane  
Dibê yan tê destî zorê mi go sorgulyê 'Edûla qîza xwa bigrî ji mi ra bikî řevanyâ mala girane  
Tîne ser mi bêlengaza hanê  
Go xwayê tu herema gawirê Çil Osman î yan ne wusan e?  
Go birawo eş' <sup>(63)</sup> te ra son[d] bixwim mi go bi Rehimê Rehimane  
Ez herema gawirê Çil Osman im, tamam top bûne çûne ser axâyê Mîrê Milane  
Ê go xwayê mewcûda wî çiqas e?  
Go birawo mewcûda wî sê hezar e jê kem tune ne  
Ê go xwayîngê mewcûda wî sê hezar e, gelo quweta Mîrê Mila çiqas e 'eçeba?

Ê lê yadê wê, dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo sed car dilê mi liyan e  
Birawo ez ê waxtê xon da rûniştibûm dibê xwuyê kulik, 'eba top bûne  
Mi go rûniştine li xonê girane



Ji hevdi ra digotin her tirsra we hewe ji Dewrêşê Şêx 'Evdî sarê<sup>(64)</sup> Hetlan e  
Wexta kire qala hespê hesp şiyiya  
Go birawo tu Derwêş î yan ne wusan e?  
Go xwayîngê Derwêş mi ş' xwa ra nake seyîsê here ber hespane  
Mi dîna xwa didayê belê go xwayîngê ez Dewrêş im

Wê çaxê xanimê destê xwa avîte lîngê hespê bala xwa dayê ne'lê spî ye, bizmarê zêr lê dane  
go: "Belê xwayê ez Derwêş im." Wê çaxê peya bûne çonê Çil Osman, xanimê nan da van zilama.  
Waxtê ki siyar bûn jinikê rê nîşan dayê, keç ji Dewrêş ra dibê:

Dibê, Derwêş dilê mi liyan e  
Derwêş tu bidî xatirê Rehmîmê Rehmane  
Bi xêr û silamet anî ciwaba gawirê Çil Osmane  
Hema mi jî ji xwa ra biwe têke bermalya mi go  
kewanya ber destê 'Edûlê bermalya mala girane  
Wê çaxê Dewrêş bi xanimê hevdi ra soz-qirar dane

Xanimê rê nîşan dayê

Ê lê yadê wê, dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo sed car dilê mi liyan e  
Mi bala dîna xwa dayê van zilama sê roja ajotin bi rê da ne  
Birawo ro kete rojê çarane  
Ji paşa xwa gîhane ser eskeryê gawirê Çil Osmane

Îja Se'îdê gazî ke elhân biray xwa ra bêje çî ka bêje çî:

Ê lê yadê wê, dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo sed car dilê mi liyan e  
elhano bira tê bîra te me ajote derê çonê axayê Mîrê Milane  
Lawo qote nan nedane me her di rêwiyane  
Oxîl eva derdê hanî bêderman hatiye ser milê vî zilamî hanê tayê bi tenê,  
lawo hevalê mîrkê tenê tek Xwudan e  
Oxîl birayê te yê li pêşiyê here tu paşa bide ber qûnê rîmane  
Kula Xwadê [bi] kul be têkeve beyta bavê elhân e  
Mînanî birûsk rabe ji asîmane  
Se'îd ji pêşiyê lêdixê elhân paşa dide ber qûnê rîmane  
Eskerê Çil Osman bala xwa didê nizane birq e, birûsk e  
agir ketiye kokê me'ziyê dişewite êvar da ne  
Van zilama rojekî hettanî heft roja lê dane

Xeyo sed car dilê mi liyan e  
Mi bala dîna xwa didayê qedera dibêje gele[k] paşa vegeriyane  
Go me di goşa bavê Çil Osman gao, jin mane bêxwayî bêxwudane  
Birawo van zilama rojekî hettanî heft roja lê dane  
Gele[k] esker ketine mi go kuştine ketine desti piyane  
Mi bala xwa dayê gele ji paşa êlê vegeryane  
Mi balî dîna xwa dayê hezar esker jê maye, ewa jî başpelewane  
Se'îd kire gazî go elhano bira em koka van binin yê bêji îşê mîrkê Busilman xayînetye bi xayînetî  
berdane  
Lawo em ê deste kincê eskerê kuştî li Ce'fer kin bişîne nava wane  
Bira hilde lawo pîlani bendane  
Îja bi siyasetî bikîşîne xeberane



Êvarê xeberê temama bîne ji me ra ne  
 Mi dîni bala xwa didayê ro kete roja nehane  
 Kuştina lihing, hût, pelewana ketiye ser milê Ce'ferê Kêsane  
 Çula Xwadê bi çul be têkeve mala Ce'ferê Kêsane  
 Kuştina lihing, hût, pelewana li ber mînanî ci'xareke meriv bavêje nava devi lêvane  
 Mi bala dîna xwa didayê ji sê hezar mêr temam hatine kuştinê  
 Pênsid mêr maye ew jî başpelewan e

Ê lê yadê wê, dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
 lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo sed car dilê mi liyan e  
 Mi dîna xwa didayê serê dilê mi bi çul û derd e gidî binê dilê mi dûman e  
 Dewrêş diçû pêşiya Ce'fer go Ce'fero kuşmeto qasekê tu bigre serê hespane  
 Ez ê îjar ji mi go dijmina ra bikim laqirdiyane  
 Çula Xwadê bi çul be têkeve mi go mala Ce'ferê Kêsane  
 Mi bala xwa dayê peya bû li ser piştê mîratê mi go meregiyane  
 Kuştina lihing, hût, pelewana kete ser milê Dewrêşê Şêx 'Evdî kîlê çavê 'Edûlê siarê Hedwane

Xeyo dilê mi liyan e  
 Li mîra şeveqê hetanî qama nîvro mi lê dane  
 Mi bala dîna xwa didayê serê nod [û] neh eskerî jêkir, jê yek maye ew jî başpelewane  
 Birawo navê wî çûvî elhân e  
 Çêko zirxê pola ser serê wî ye ne îşê mirinê ne îşê şûran e, ne îşê çima ne îşê kuştina girane

Ê lê yadê wê, dilê mi liyan e lo lo lo lo lo lo lo  
 lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo lo xeyo sed car dilê mi liyan e



Mi dîni bala xwa didayê Dewrêş mi go li milê meydanê pê'nî da Hedwan e  
Mi bala dîna xwa didayê bi gotina Şêx 'Evdî mîratê Hedwan  
serhişk e nezvirî ser dizgîna dujminane  
Birawo her di lingê Hedlane pêşîn dikole mişkê da çik û qeydika da firyane  
Evî kafirî ne qul û nemerdî rimek di nav mila Derwêş dane  
Serê rîmê çar tilya mi go li pêşîrê ra avîte dervane  
Mi bali dîna xwa didayê dibê Se'îd û elĥan, Ce'ferê Kêsan bi hevdi ra lêdane  
Dikin nakin zîrxê pîla ser e, ne îşê mirinê ne îşê kuştinê roja girane

Xeyo dilê mi liyan e  
Mi bala dîna xwa didayê Se'îd kire gazî go kafiro me nedaye rîhê van peyana derbas be, me  
lawo nedaye rîhê van heywana peya be derbas be mi go peyawne<sup>(65)</sup> ser piştê hespane  
Lawo em ê destê xwa bavêne qagûzê kemerane  
Mi dîni bala xwa didayê evî kafirî mînanî mêrekî çîlsalî destê xwa avîte qaşa Se'îd mînanî mêrekî  
çîlsalî bi zareke çindîlê<sup>(66)</sup> bavêje dest û piyane  
Dayê dike ku jêke serê wî elĥan e  
Se'îd bin da bi sê dengê helîlê kire qêrîn go gawiro mi ser xwa ra nedîtin tu mêt û pelewane  
Tu bidî xatirê Xwadê û pêxembera ca vir da ke ez buwînim<sup>(67)</sup> qet û qametê te yekî ça[wa] ne  
Bira ew hesreta mi ra neçe axa sar da ne

Xeyo dilê mi liyan e  
Mi bala xwa dayê vî kafirî destê xwa avîte zîrxê pîla ser serê xwa hildane  
Ce'fer, elĥan hevdi ra mi go cotê rîma lê dane  
Mi bala xwa didayê her di çavê wî dane tara hustuyê wî ra derkete dervane  
Se'îd bin çoka wî revî rasta hane  
Teze li ser cinazê Dewrêş da bû qêrîne  
Go de loy lo hooêê Dewrêşo de rabe lehingo de rabe hûto de rabe dilê mi liyan e  
De rabe em ê çî cawê<sup>(68)</sup> bidne kalê li ber konane  
Hey mala te şewityo em ê çî cawê bidne 'Edûla qîza Mîrê Milane  
Mi bala xwa didayê Dewrêş kire gaziyê go birawo êdî xêra mi tune ji we bira ra ne  
Lawo texdîra Rêbbê 'alemê, lawo hûn diçin mi çale bavê mi helal kin, bêjin canê Dewrêş me  
he[r] sê bira ra bû qurbane  
De de lo lo hooêê hê ax de lo lo hooêê de lo lo hooêê

Mi go xeyo dilê mi liyan e  
Van zilama berê cinazê Dewrêş avîtnê mi go ser piştê hespane  
Berê xwa dane vegeryane felekê xayînê berê xwa dane konê de mi go Şêx 'Evdî da ne  
Ciwabeke ne b' xêrê çûye Şêx 'Evdî ra ne  
Şêx 'Evdî derketye ber kevirê bînekdaşê dûrbînê davêje serê rast û bestane  
Bala xwa didayê siyar tamam hatin lawo Dewrêş ne wan ra ne  
Digo de lo loy hooêê ho ho ho ho  
Lawo dilê mi liyan e  
Lawo ez bala xwa didimê hûn bi xêr silamet hatin lawo Dewrêşê mi ne we ra ne  
Mi dîna xwa didayê bû zarînê van her sê bira di ser Şêx 'Evdî da giriyane  
Şêv 'Evdî kire gazî go lawo hûn sax bin dîsa Dewrêş lawo sax e sangî li dinya hane

**Çavkanî:** Cesîmê Dengzêrîn (Ferdekî 'eşîra Dilxêrî ye)

**Agahî:** Dengbêj ev kilama 29-30 (di 13-15 saliya xwe de) sal berî niha  
ji 'Ehmedê Zeynal hildaye.

**Perwerdehî:** Xwende

**Temen:** 44

**Herêm:** Gundê Gezgezkê/Herêma Mêrgezerê/Agirî

**Sal:** 2015



## Nîşe

- 1 Xwa: Xwe
- 2 Inda: Winda, wenda
- 3 Di: Du, didu (2, hejmar)
- 4 Piçûk: Biçûk
- 5 Oxil: Lawo
- 6 Kewrane: Kerwan
- 7 Alaf: Hulma mêran, heybeta mêran, zilamê xurt
- 8 Metîhenî: Hespê baş, hespê sekla
- 9 Deraz: Ciyê dûr bê hewarî, di dema bûyerekê-qewmînekê de hêviya mirovan jê tune ku kes were bi hewara wî de.
- 10 Hew: Heb
- 11 Ayrî ayrî: Yek bi yek, cihê-cihê
- 12 Birincî: Êwil, yekem, sifte
- 13 Yêr: Şûna, cihê
- 14 Nijdevan: Başpehlevan, şerkêş, merivê mezin, hût, qehreman, leheng
- 15 İkîncî: Ê dudiyan, duyem
- 16 Uçûncî: Ê sisiyan, sêyem
- 17 Tewngîr: Cihê ku jin û keçik tê da xalîça-êmeniya, nexş û nemûşa çêdikin û hînî hevdu dikin.
- 18 Dortincî: Ê çaran, çarem
- 19 Bêşincî: Ê pêncan, pêncem
- 20 Altincî: Êşeşan, şeşem
- \* Dengbêj li vir bi devkî diaxive. Nivîsên ku bi xwar hatine nivîsin tev bi devkî hatine gotin.
- 21 Ayreten: Wekî din
- 22 Meregî: Seklavî, cinsekî hespê 'Erebî ye, hêspê rimbazan e.
- 23 Hîlik: Hêzik, dûvê kavirê du salî, dûvê peza du salî
- 24 Dawûne: Dabûne
- 25 'Evrê: Ebir
- 26 Qote nan: Pariyek nan
- 27 Busilman: Misilman
- 28 Qûştûkî: Pûrta teyr û tûyan û çûkan
- 29 Îja: Îcar
- 30 Yaşê te: Salê te, emrê te, temenê te
- 31 'Emrê te gêçgîn e: Emrê te derbas bûye
- 32 Wûn: Hûn
- 33 Hewû: Hebû
- 34 Leylan: Navê hespa Mîrê Milan e.
- 35 Tewnan: Civata jinan ku nexşan çêdikin.
- 36 Xazila: Xwezika, xwezî, şalê
- 37 Qametê wî: Şexsiyeta wî, sekl û şemalê wî
- 38 Herd: Herdu
- 39 Birî bijag: Birû û mijang
- 40 Pêşgi: Pêşgir
- 41 Bîleg: Zend
- 42 Notanî: Nolanî, nolî
- 43 Nîr: Çokê qalind yê deveyê serkêş, loqê deveyê (hêştir) yê pêşiyê
- 44 Va: Ve
- 45 Leman: Cinsekî teyrê simîr e; pûrta wê nerm e, pirça wê bedew e û rengregî ye
- 46 Teyisîn: Biriqîn, çirisîn, weriqîn
- 47 Jerî: Jehr, jahr
- 48 Hêriz: tima', tema, temihî, temayî, çikûz, miqris
- 49 Arava çekayê: Pistî çek-kinc şuştinê ava gemarî ya ku di binê teystê de maye, ava qilêr.
- 50 Yêvide: Ji nû ve, ji sêrî de
- 51 Têvz: Qeyd, terz, usil, çeşîd, şêwe, şêwaz
- 52 Zift: Deqa ku di nava herdu birûyan de tê çêkirin, ji bo ku herdu birû bigihên hevdu û çatme bibin tê çêkirin.
- 53 Oxçik: Tîravêj, tîrevan
- 54 Singê serhêşya kon: Du heb singê qalind in û di pêşiya devê kon de tên çikandin, kutan (di aliyê çep û rastê de) û berê bendê devê kon davêtne serê van singan û ev sing dineqîşandin.
- 55 Duşman: Dijmin
- 56 Lekm: Lingê hespê yên pêşiyê, [wexta ku hesp radibe ser lingê paşiyê lingên xwe yên pêşiyê bilind dike û ji wê re di-bêjin lekme. Di şer de dema hesp radibe ser lingên xwe yên dawiyê lekmanê xwe davêje hespê dijmin û siwarê ser hespê.
- 57 Refes: Zîtik
- 58 Çift: Zîtik
- 59 Hemdalî: Cinsekî hespê 'Erebî ye, hespê pir biqîmet e.
- 60 Töl: Tole, forq, forqe (Jina xerab)
- 61 Beyt: Mal
- 62 Kowv: Li hev zivirîn, li hev gerîn. Kov bûn.
- 63 Eş': Ez ji
- 64 Sarê: Siyarê, siwarê
- 65 Peyawne: Peya bin
- 66 Çindîl: Zarokê hê di dergûşê de, zarokê hê di hembêza diya xwe de
- 67 Buwînim: bibînim
- 68 Cawê: Ciwabê, cewabê, bersivê



# TAY ZEWTÎ HÊNI RA

1. Adir bûk leşê to.
2. Awa sîyay bîbîkon to ra bêrî.
3. Bîbîkê to biteqî.
4. Erd ra war şîyaye.
5. Hezaz bûk leşê to.
6. Hûmay to qehîr bikî.
7. Fek pîrnîkon to ra bêrî.
8. Ferec bidî to rî.
9. Gormar to pedenî.
10. Jon bigin leşê to rî.
11. Kul bûk pîzey to.
12. Lemozey to erd ra arê nêbî.
13. Loqereyê to vecî teber.
14. Mi ra dûr, ti serey xo borî.
15. Mil mêney to biqerefî.
16. Miradê to, to çimîd monî.
17. Miradê to, to qirikîd monî.
18. Nengûyêy to çinêbî, ti xo biorinî.
19. Non bîbo arwêş, ti bibî tajî.
20. Nonê min to kor bikî.
21. Nonê min to qirikîd-bimonî.
22. Qasikey to bimasî.
23. Qesebeyê to guleyan feka şêrî.
24. Qesebeyê to qul bibî.
25. Qesebeyê to, to fek ra bêrî teber.
26. Şîyayîşê to bibî, omevîşê to çinêbî.
27. Term eylon xo vînî.
28. Ti ayê qomîd bimonî.
29. Ti bibî şom vergan.
30. Ti ena dinyad rehetey nêvînî.
31. Ti gês vera bimirî.
32. Ti goştê leşê xo borî.
33. Ti heyhey biba.
34. Ti kilî kor bibî.
35. Ti ko ra gilolo bibî.
36. Ti şêrî, ti nêrî.
37. Ti parçe lemoze bibî.
38. Ti roj nêvînî.
39. Ti qin ser bûkî mîn(mîyan) cîrn.
40. Ti qoncet biqerefî.
41. Ti tîlîfî biba.
42. Ti xortey xo ra xêr nêvînî.
43. Ûcaxê to kor bîbo, bêr to mor bîbo.
44. Ûcaxê to pîye to ser kor bibî.
45. Vergan to borî.
46. Virso bîdo to rî.
47. Wey mela îlîncîk bigin to rî.
48. Wey mela ti kijjîk bibî.
49. Wey to pîrnîk ra bêrî.
50. Xêrdînê to çinêbî.



Weysî  
ARCAGOK

# MÎQO

Yek hebû dê û bavê wî mirin. Navê wî Mîqo bû. Mîqo gedekî pîrr şeytan bû. Li cem apê xwu'nû' amojna xwu disekinî. Emrê Mîqo çarde yan jî panzde sal bû. Apê wî diçû kar. De zemanê berê cot dikirin, teneke dikirin, dajotin, diçînîn bi halê xirab filan û bêvan.

Go amojna Mîqo bi melê gund ra bû, ew û mele bi hev ra bûn. Esas amojna wî li pey mele bû. Mîqo ev mesela han zanîbû, ji xêncî Mîqo keskî ev mesela nizanîbû.

Rokî apê Mîqo dere zeviya xwu cot dike. Zeviya mele jî nêzikî ya mala apê Mîqo bûye. Mele jî ew ro diçe wê zevya xwu cot dike. Amojna Mîqo dizane ku mele jî ew ro dere hinda mêrê wê zeviyê cot dike. Amojna wî dibê; "wele ez ê nanê nîvro hazir kim, nanekî xweş çêkim bira mêrê min gazî mele ke mele jî were tevî wan nanê nîvro bixwe."

Amojna Mîqo radibe hilûkî? şerjê dike, dişo, hûr dike, sor dike.

Mîqo bala xwu didê way amojna wî tişkî şerjê dike û sor dike. Mîqo dibê:

- Ma viya çi ye amojin tu çêdikî?

Amojna wî dibê:

- Wele apê te zeviyê cot dike, mi go ez vî hilûyî ji apê te ra çêkim.

Halbû<sup>3</sup> mele nêzî apê wî ye, jinikê hilû boy mele jerjê kiriye, dilê jinikê qet ji ber mele dernayê. Mîqo dibê:

- Ê tamam, dibê ez vay dike herim hinda apê xwu; te wexta nan çêkir, tu yê werî filan ciyî, jixwu tu ciyê me dizanî.

Lawik(Mîqo) dikeve rê ku diçe cem apê xwu, rê da rastî mele û gayê mele tê. Gayekî mele binê zikî wî belek e, hinekî sipî ye. Lawik tê hinda apê xwu dibê:

- Apo ma çima gayê mele belek e, çima ê me ne belek e?

Apê wî dibê:

- Lawo de ê me herdu jî reş in e<sup>4</sup> ji ku zanim çima ne belek in.

Berhevkar:  
Mahpûs SERHEDÎ



Lawik dibê:

- Apo ez ê kefiya xwu li nava ga girêdim, bira ê me jî belek xwiya bike û bira kêfa min jê ra were.

Apê wî dibê:

- Temam, dibê tu dikî bike.

Mîqo kefiya xwu didi nava wî û dere li hinda gayê mele, nêzîkî mele disekine. Mîqo texmîn dike ku jinikê were hinda mele bisekine û wê ba mêrê xwu jî bike, ji bo ku mele jî tevî wan nan bixwe.

Jinik tê, bala xwu didê lawo ma way du gayê belek in li wir. Nava wî jî belek e, nava wî jî. Dibê: "gelo kîjan gayê mele ye?" Dinêre ku Mîqo li hinda gakî sekinî ye, dibê: "wele a ew ê ku Mîqo li ber e, ew gayê me ye. Ewê din jî ê mele ye." Jinik xwu li gayê din digrê tê, tê bala xwu didê eva mêrê wê ye û ga jî pînekî sipî li navê ye diçêre. Jinik ji mêrê xwu ra dibê:

- Ma te çima gayê xwu wa kiriye?

Mêrik dibê:

- Wele hema Mîqo wer kiriye. Dibê paçkî sipî avîtye ser zikî wî û wer maye.

Mîqo jî ji wira didi rê tê hinda apê xwu'nû amojna xwu. Çaxa ku sifra xwu radixin nan bixwin; jinik ji mêrê xwu ra dibê:

- Misilman dibê te hema ban mele kira jî dibê cî-ranê me yî, gune yî, dibê ew jî niha birçî bûye, dibê ewî jî bihata hinik nan bixwara baş dibû.

Hey jinikê xwu şaş kir, bi ga xapya neçû hinda mele. Îja dixwaze mêrik ban mele ke mele bîne wira. Mêrik ji Mîqo ra dibê:

- Lawo here ba mele ke, ji mele ra jî bêje, bira ew jî were em nan bixwin.

Mîqo dere hinda mele, ji mele ra nabê: "apê min ez şandime pey te hadî em herin nan bixwin." Mîqo dere hinda mele dibê:

- Seyda!

Mele dibê:

- Çi yî?

Dibê:

- Bi xwedê min ji apê xwu ra gotiye mele bi amojnê ra ye, apê min anha were te gever dike<sup>5</sup> Meleyê feqîr li dor xwu dinire. Mîqo wer dibêje û tê. Tê, ê jinik zani Mîqo şeytan e.

Evana li hêvyê disenin, ê mele nehat di ara wan da sed mètre yan jî dusud<sup>6</sup> mètre heyî tune yî. Jinik ji mêrê xwu ra dibê:

- Lawo bi Xwedê vî şeytanî ji mele ra negotiye, dibê ma mêze ka mele nehat mele way li wir dewam dike îşê xwu. Ji mêrê xwu ra dibê tu here ban mele ke bira were.

Ê de qey mêrê jinikê jê ra hebki bindest jî bûye. Lê mêrik nav xelkê da jî naskirî bûye. Mêrik dibê: "de ka ez herim, dibê qey Mîqo negotiye." Çaxa mêrik bi rê dikeve ew ê here ban mele ke. Mîqo dibê:

- Apo tu deri, dibê du heb kûçik li hinda mele ne, dibê pîrr fena ne. Dibê tên mera, dibê te hema nê-zîkê mele kir dibê du heb kevira bide destê xwu ku kûçik hatin tu bi wan kevira lêxî.

Ê Mîqo çûye ji mele ra gotiye ku mi ji apê xwu ra gotiye mele bi amojnê ra ye. Apê wî dibê:

- Temam.

Çaxa apê wî berî dide mele, ber bi mele diçe ku bankê bê were nan bixwe. Mele dibê: "wele apê wî vay hat, dibê rast e Mîqo jê ra gotiye." Apê Mîqo digihê nêzî mele xwu xarê erdê dike du heb sê heb kevira dixê destê xwu, mele hema gayê xwu disekinîne û berî dide gund û direve.

Jinik dibê:

- Mîqo çima mele revya?

Mîqo jê ra dibê:

- Mi ji apê xwu ra gotiye; "mele bi amojnê ra ye," dibê mêze way çû li mele xe, dibê bi quran apê min were te jî dikuje.

Mele çaxa direve apê Mîqo car din berî dide jina xwu û wan dizivire, tê. Jinik bala xwu didê ku mêrê wê ber bi wan tê. Jinik hema hêz diçê xwu ew jî direve. Apê wî tê dibê:

- Çima amojna te revya, dibê ku da dere û dibê mele jî revya çima gelo?

Mîqo dibê:

- Wele amojna min, ji mi ra got apê te temê li min nake, dibê gotye ez ê herim ba birê xwuna kim<sup>7</sup> bira werin li apê te xin. Yanî dibê apo wele jinik çû mala bavê xwu gaziye.

Çaxa ku Mîqo were dibê apê wî ji li alîkî direve. Dibê wexta ku apê wî direve ji tirsana tizbiya xwu na nod û neh libê di cî da dihêle û direve. Mîqo tizbiya apê xwu hildide û dixê civa<sup>8</sup> xwu. Ê Mîqo şey-

tan e nan gi<sup>9</sup> ma ji Mîqo ra. Mîqo dikeve ser goştê hilûya xwu têr dixwe û radibe ser xwu.

Mîqo radibe dere bala xwu didê way hinik bi dasa nan diçinin. (*De berê nan [genim] bi dasa diçînîn.*)  
Mîqo dibê:

- Selam elêkim

- Elêkim selam.

Mîqo dibê:

- Lawo win<sup>10</sup> çî ketinê genim diçinin, dibê way esker ketye nav gunda û dibê gotine genimê xelkê tevî dişewitînin. Dibê apê min gotî wexta ku dewlet bişewitîne pê zora mera dere, dibê apê min gotî here ji wan ra bêje heta dewlet dişewitîne. Bira hema ew bi destê xwu agir bera genimê xwu din û bişewitînin, ma çîma êdî dewlet bira bişewitîne.

Vana dibên:

- Lawo ma apê te çawa wisa dibê, dibên ma em ê çawa ji te bawer bikin?

Mîqo hema tizbiya apê xwu ji beriya xwu derdixe rava dike<sup>11</sup> dibê:

- Ha ava tizbiya apê min, dibê ma ev ne tizbiya apê min e? Dibê hûn giş jî tizbiya apê min naz dikin.

Vana dibên:

- Erê wele lawo, ew tizbî ya apê te ye. (*Dime apê Mîqo merîkî belî başlî bûyi, qedrê wî nav xelkê da hebûye.*)

Herkes hema arê xwu ji bêriya xwu derdixe û bi genim ba datîne û genim tevî dişewitîne. Dibê vana tev direvin û derin; mêrik(apê Mîqo) bala xwu didê kes li dû nehat, mele dinêre kes li dû nehat, jinik dinêre kes li dû nehat. Vana dibên; "heyran vava çî ecêb bû hat serê me." Herkes tanga xwu da mêze dike eva tiştê ku hatî serê wan tev derew e. Dibên; "wele eva çî hebe lawik anî serê me." Îja tev dikevin pey Mîqo ku Mîqo bigrin, heyfa xwu jê derînin. Dibên; "lawo hela bala xwu bidnê ya ku Mîqo anî serê me."

Mîqo dizane êdî îşê wî ne baş e. Mîqo ji wira direve dikêve devê newalkî dibê; "ez ê bi çolê kevîm û herim. Dibê wisa hebe vana yê min dikujin." Dere dere rastî melakî tê. Dibê ku way mele hespa xwu li wir girêdaye, mele li binê zinar rûniştîye û destaf digre. (*Dême Mîqo dijminê mela bûye.*)  
Mîqo dibê:

- Seyda, seyda! Dibê zinar bi ser te da hat xwarê! Dibê seyda zinar ket zinar ket.

Seyda dev ji pantorê xwu û şelwarê xwu, hey çî lê hebe dev jê berdide û seyda hema radibe herdu mêtê<sup>12</sup> xwu para va dide zinar, bi zinar digri û di-sekine. Her tiştê seyda ma li derva û qûna seyda tev bigû ye?

Mîqo dibê:

- Seyda xwu tev nede, dibê hema tu xwu tevdi zinar bi ser te da tê.

Seyda:

- Lawo dibê kuro ez çer bikim?

Mîqo dibê:

- Seyda tu a bi wî hawî<sup>13</sup> zinar bidi seknandin ez heya derim gund gaziye.

Seyda dibê:

- Lawo hema li hespa min siyar be xwu zû bigîne gund bira werin min ji binê vî zinarî xilas kin. Seyda bi hawî tût û rût bi ser wî gûyê xwu da di-sekine. Mîqo li hespa wî siyar dibe û dere. Seetik du seet dere seyda xwu pê kiriyê û kevîr girtiye, ê kes nayê gaziya seyda. Seyda dibê; "lawo bi Xwudê vava nayê, dibê vava êdî çû." Hişê seyda tê serê seyda ku Mîqo hîleyak anî serî wî. Seyda hema bi carkî ji ber zinar direve, mêttrakî du mêttra deh mêttra direve dibê ku ne zinar tê ne tiştê tê. Seyda dibê; "axxx lawo te çî anî serê min, te ez xapandim û rezil kirim, bênamûs!"

Ê Mîqo êdî dide rê û dere, êdî hespa wî jî heye. Seyda jî daye pey Mîqo, Mîqo teqîb dike ku hespê jê bistîne. Dibê Mîqo dere mêze dike way yek cot diki. Mîqo dibê:

- Ji te re qewet be.

Mêrik dibê:

- Xwedê ji te razî bi, tu sax bi. Mêrik dibê xêr i, tu ji ku da tê ku da derî, ma vava çî hesp i, bi te ra yî?

Mîqo dibê:

- Wele hespa min i, dibê hespik pîrr baş e, dibê ez difroşim jî.

Mêrik dibê:

- Ê tu difroşî, ka dibê tu bi çî difroşî hema bide min ez bikirim.

Mîqo dibê:

- Kuro bi Xwudê ez birçî bûme, dibê tu heri gund-malê. Dibê tu şorbaki wer temmmîz û delal ji mi ra têki qoşxanekî tişkî û bîne. Dibê ez têr şorba xwu bixwim û dibê bira hespa min jî ji te ra be.

Mêrik dibê:

- Lawo ma çawa hespa te bi qoşxanek şorbe ji mi ra be? Dibê ma ez ana<sup>14</sup> herim ez ê şorbê seetkî da çêkim bînim.

Mîqo dibê:

- Ma ez ji hespê çer dikim, dibê ji mi ra lazim nîn e, dibê ana ji mi ra şorbek, xwarinek lazim e, dibê ez birçî me.

Mêrik jê ra dibê:

- Mêze va herdu gayê min teslîmê te, heya ez diçim gund ji te ra şorbê çêdikim û tînim.

Mîqo dibê:

- Temam.

Mêrik dere gund ji jina xwu ra dibê:

- Jinik min hespik bi sianik<sup>15</sup> şorbe kiriye. Dibê zû şorbê bi ser di<sup>16</sup> û were em afirê hespê çêkin.

Jinik dibê:

- Temam

Û şorba xwu didî ser. Mîqo jî gayê mêrik difilitîne, misasa cot tîk diki û hinik rêxa gayê wî digri, di dor da dide ser serê misasê û li serê zevyê herdu gayê mêrik dajo deri.

Mêrikê ku çûye şorbê afir çêdiki, jinik şorbê diki-  
line filan û bêvan. Jina wî jî hemle bûye. Mêrik afirê  
xwu çêdiki, benê xwu pêva girê didi, şorbe jî dikeli.  
(Ê de meseleka me Kurmanca heye dibêjin hesp tune  
afirê hespê hazir dike.)


Mêrik ji jina xwu ra dibê:

- Keçê dibê hela ez serê xwu têkim benê hespê,  
ku mera di piş wî ra derbas be hesp dîzika xwu  
bavê dîzika wî dighê mera yan na? (Yanî çî ye ku  
hesp anîn wê xwu ji hespê mihafize bikin.)

Jinik dibê:

- De serê xwu têkê.

Mêrik serê xwu dixê ben jinik jî awa di paş wî ra  
dere, her wekî ku jinik di paş hespê ra dere, wisa  
ji xwu ra çêdikin. Mêrik ku ça zîtka xwu davê di  
serê zikê jinikê da lê dixê. Ê jinik jî bi hemle ye, za-  
roya jinikê dikeve û dimire. Jinik ji mêrê xwu ra  
dibê:



- Lawo çî bû bû, dibê qene tu zû here wê hespa xwu bîne.

Mêrik radibe şorba xwu dixê qoşxanekî dide ser serê xwu ku here hespa xwu bîne. Jinik dibê:

- Mêze ku te hesp anî hesp ku bizê, dibê hey ce- niya wê mê be, ji mi ra ye; çimkî dibê te e jî xistim zirarê, zaroka mi jî ji ber min çû.

Şorbe li ser seri mêrik e, mêrik tîne xwu xar dike ku qirşik ji erdê hilde bêje; "wele ez a viya jî nadim te," şorba wî di ser serê wî da dikevi erdê tev dirje. Mêrik car din şorbê dide ser heya şorbe dikeli, heya mêrik dere ber serê zevyê, ê êvar e çî ga yi, çî Mîqo yi, çî hesp i. Mêrik li dora xwu dinirî<sup>17</sup>, mêze dike way misasa cotê wî tîk kiriya û sila rêxê li ser serê misasê ye. Mêrik li sekna misasê û rêxa li ser misasê dinire dibê; "wele gayê min tî bûyi çûye ezmana avê bixwi. Çimkî dibê wa rêx kirî û rêxa wî jor da hatî ser misasê." Destê xwu didi ber çavê xwu û li asîmana mêze dike ka ga li ku xwiya dikin. Dibê; "way beliya ga çûne ezmana, başqe di ciki da neçûne."

Dibê ew seydayê ku Mîqo hespa wî biribû tê, hey va yek li ser piştî dirêj kirî ye, destê wî li ber çevan e û qame<sup>18</sup> mêze dike.

Seyda dibê:

- Lawo kuro ji te ra qewet be, merheba tu çî diki li vira?

Mêrik dibê:

- Huşşşş! dengê xwu neke, gayê min çûne ezmana. Ez heta bi hawakî wan dibînim dengê xwu neke.

Mele dibê:

- Lawo gayê te çawa çûni ezmana?

Mêrik dibê:

- Ez li vira bûm, dibê yek hat hespik wî hebû, dibê min hesp jê kiribû û dibê ez heya çûm malê hatim. Dibê ne gâ ne, ne mêrik e, ne jî hesp e. Dibê way ga jor da, di ser misasê da rêx kirine, dibê yeqîn çûne ezmana avê vexwin.

Mele dibê:

- Le lawo rabi ser xwu, dibê wele wî çî anî serê te wisa jî anî serê min. Mele des davêjê dibê rab rab dibê li min jî wer kirî wî bênamûsî.

Mîqo herdû gaya dide pêşya xwu tê tê, rastî şivan- vankî tê. Mîqo û şivan:

- Selam elêkim

- Elêkim selam (*filan û bêvan*).

Mîqo dibê:

- Lawo şivan dibê ez ê erdê bikolim, te hata nivî tîxim erdê, dibê hey tu xwu ji erdê der xî ez ê vê hespê û herdu gayana bidim te.

Şivan berê ewil bi temayê digre, xwu nade ber paşê dibê:

- Temam. Dibê tamam.

Evana erdê dikolin Mîqo heta navê şivan dixê erdê, dora şivan tijjje kevir dike, kevira tê da dikute, di- şidîne û xweliyê dixê ser kevira. Mîqo ji şivan ra dibê:

- De derkeve.

Şivan xwu li v'âlî dike naleqe w'âlî dike naleqe û şivan bi penca bi erdê dikeve, Mîqo pez jî dajo.

Şivan dibê: -

- Lawo pezê min nîn e, ê xelkê ye.

Ê ji kê ra dibê Mîqo pez dajo, dere. Şivan haho dike çî dibêje kes tune. Qederek wext derbas dibi şivan mêze dike way du heb peya hatin: Cotkar û mele. Evana tîne mêze dikin way yek heya nivî di erdê da yî û were wera wî yi. Evana dibên:

- Lalawo çer bûyî bi te, tu waya di erdê da yî?

Şivan dibê:

- Wele yek hat, dibê du ga û hepsê li pêşyê bûn hat û li min wer kir û dibê pezê min jî ajot û çû.

Mele û cotkar dibên:

- Wele lawo qet nebêje ewî bênamûsî li me jî wer kir.

Mele dibê:

- Hesp hespa min bû û dibê ga jî ê vî camêrî ne.

Radibin şivan ji erdê derdixin. Mîqo pez dibe difo- roşe ji xwu ra pê malê çê dike, dizewice. Êpê zeman derbas dibe. Ê din jî teqîb dikin heta ku Mîqo bibînin. Teqîb dikin, dikin mala Mîqo dibînin û êvarkî roavakî diçin ber derê Mîqo dibên:

- Selam elêkim!

Mîqo dibê:

- Wey elêkim selam.

Hevdu nas dikin, herdu serî jî meselê dizanin.

Mîqo qedr û qîmeta wan digre nan, av filan û bêvan. Mîqo şîva êvarê ji wan ra helawê çêdike. Êvarê Mîqo piştî şîvê dibê:

- De kerem kin, îşê we çî bi min heye hela bêjin.

Evana dibên:

- Lawo pekî te çîma li me wa kir, te heywanê me giş bir, te em perîşan kirin.

Mîqo dibê:

- Wele heywanê we rast e, ez înkâr nakim mi aniyi; yalaniz<sup>19</sup> dibê şertkî mi heye dibê hey win wî şertî bi cî neynin wele dibê ez ê serê we teva jêkim û kes jî hay ji we tune. Lê dibê hûn bi cî bînin ez ê malê we gişî serê sibê bidim we û herin.

Vana ditirsin dibên; "lawo wele çî bêjî ji vî bênamûsî tê, dibê eva yê me bikuje." Dibên:

- Hela bêje şertê te çî yî?

Mîqo dibê:

- Wele esas şertê min pîrr ne giran e, yalaniz hinkî rîska-talûka wî heyî.

Evana dibên:

- Çi yî hela bêje?

Mîqo dibê:

- Mêvanê min ku were mala min gere wê şevê li mala min rakeve. Lê dibê mêvanê min gere wê şevê bi xwu da nerî, hey dibê mêvan bi xwu da birî diya min dimire. Dibê diya min bimire gere ez wî mêvanî bikujim. A dibê serê sibê em rabûn ku mêvan bi xwu da nerî be ez malê wan didimê.

Mele dizîvire ser hevalê xwu dibê:

- Lawo ez we nizanîm; lê min heta niha tu wextê di xwu da neriyi.

Hevalê wî dibên:

- Heyran wele me jî heya niha bi xwu da neriyi.

Evana şertê Mîqo qebûl dikin. Ê evana çend zeman e, li pey Mîqo digerin, westiyane. Mîqo jî mexsûz seetê li van dirêj dike dirêj dike vana êdî bê hemdî ji xwu derin û dikevin xewa giran. Ew ku xew ra derin Mîqo ji jina xwu ra dibê:

- Jinik zû rabe helawkî çêke bira rûnê wê zêde be.

Jinik radibe helawê çêdike. Mîqo helawê sar dike, bala xwu didê erê way mêvan êdî ketine xewa kûr. Mîqoyê me doxîna şalvarê şivan vedike lepek helaw dixî navrana şivan. Ê şivan westiya ye

bixwu nahisi. Doxîna cotkar vedike du lep helaw dixî navrana wî, a mele vedike sê lep helaw jî dixî navrana mele.

Ê de ka şivan tim ku wexta şevîne were şiyar dibin. Şev derbas bû wexta şevîna şivan hat, şivan şiyar bû. Şivan çer şiyar dibi bi xwu dihisi û destê xwu dibi navrana xwu dibê; "lawo mi bi xwu da nerî be?" Şivan destê xwu dibe nava nigê xwu destê wî di nav helawê ra dere. Şivan dibê; "wîwîwîwîwîwî dibê wele mi bi xwu da riye. Lawo dibê hema şansê mi bû îşev wiha hat serê min. Dibê di heyata mi da tişkî waya nehatibû serê min." Şivan tîne ku ban mele ke paşê dibê; "wele mele exlaqsiz e, dibê ez ê ji cotkar ra bibêmi mi bi xwu da riya." Cîyê wan li rex hev bûye. Şivan hêdîka dinîçîne cotkar dibê:

- Lawo, lawo! Hela rabe.

Cotkar dibê:

- Çi ye vê şevê ha tu nahêî em rakevin?

Şivan dibê:

- Lawo hela rab rab, dibê mi bi xwu da riya.

Cotkar dibê:

- Lawo nelet li te hato dibê te nikari bigirta heya serê sibê.

Şivan dibê:

- Lawo cotkar hela binêre te jî bi xwe da nerî be?

Cotkar carê des davê navlinga xwu; bavoooo! Cotkar xwu berbat kirye. De helaw bi rûn jî bûye cotkar hema xwu gevizandiye û helaw heta serserê wî tê geryaye. Şev e îşiq tune, tiş tune, tarî ye.

Evana dibên:

- Lawo em çer bikin? Dibên lawo wele gere ban mele jî kin, bira mele jî rabe hela ew dibê çî û dibên belkî em ji vir direvin yan na dibê Mîqoyê me bikuje.

Mîqo jî şiyar e, xwu li wan daye gudariya dibê; "hela ka vana çer dikin?"

Vana dinîçînin mele, ba mele dikin dibên:

- Mele rab me bi xwu da riya.

Mele dibê:

- Lawo gelî bênamûsa mi zanîbû winê tişkî bi serê me bikin.

Vana dibên:

- Mele hela tu jî li xwu biniri, tiş bi teba jî heye yan na?

Mele xwu wa dike wa dike, mele nikane xwu di ciyê xwu da tevde. Mîqo navrana mele tijje helaw kirye. Vana dibên:

- Mele çibû deng ji te nayê?

Mele dibê:

- Lawo wele min tijjjî kiriye, dibê rab, dibê niha diya vî bênamûsî miriye dibê em zû herin. Lawo dibê şertê wî bi me ra heye. Dibê way me hersêya jî bi xwu da riyî. Dibê bi Quran viya serê sibê rabe me hersê ya jî dukuje.

Mîqo xwu li wan dide gudariya, deng tev diçe Mîqo. Mîqo digrî, diqare dibê day ma tu diki bi-miri? Dengê giriyê Mîqo dere mele wan. Mele dibê:

- Lawo zû kin dibê diya Mîqo dimre em birevin.

Hema radibin bi des hev digrin derdikevin derva û direvin. Evana di rê da direvin cotkar û şivan dibên:

- Mele dibê wele ew şîva ku me êvarê xwar dibên eynî ew bîn ji gûyê bi te va jî tê.

Mele dibê:

- Lawo ez hevalê we me win henekê xwu bi mi dikin?

Mîqo bi vê şeytaniya xwu ji wan xilas dibe û hesp, ga, pez û bi ser da jî şeytaniya Mîqo, tev ma ji Mîqo ra.

Xelmîşoka mi li dihara, rihmet li dê û bavê guhdara.

**Çavkanî:** Şewket KÖSE

**Temen:** 55

**Perwerdehî:** Nexwende

**Herêm:** Gundê Alçîmenê/Qerejdx/Amed

**Dem:** 10/12/2015

<sup>1</sup> Xwu'nû: Xwe û

<sup>2</sup> Hilûk: Elok

<sup>3</sup> Halbû: Halbiki/hal ew bû ku

<sup>4</sup> E: Ez

<sup>5</sup> Gevekirin: Sikitandin

<sup>6</sup> Dusud: Du sed

<sup>7</sup> Herim ba birê xwuna kim:

Herim bangî birayên xwe bikim, gazî wan bikim.

<sup>8</sup> Cîva: Bêrik, cêb.

<sup>9</sup> Gi: Giş, hemû

<sup>10</sup> Win: Hûn

<sup>11</sup> Rava dike: Ray didê, nîşan dide.

<sup>12</sup> Mêl: Mîl

<sup>13</sup> Hawî: Awayî

<sup>14</sup> Ana: anîha

<sup>15</sup> Sianik: Sehenek, teyfikek, lalîkek

<sup>16</sup> Şorbê bi ser di: Şorbeyê bide ser (agirî)

<sup>17</sup> Diniri: Dinêre

<sup>18</sup> Qame: Jor

<sup>19</sup> Yalniz: tenê



Yusuf Alkan



# WERDENE

Surya HÛMAN

## • Binhadir

Ewilî gorey kom û kulfetê xo rê mîrê xo halawênê. Mîr yeno we. Heta mîr yeno we ma zî ey çax mîyanê/zere binhadiri hedre kenê.

Mîyanê binhadiri;

- Tantur
- Vezd/Don
- Pîyanzo wişk

Ewilî ma pîyanzanê xo tole kenê, ma ey kenê werde dima zî ma biney qelnenê û mîyanê tantur û vezdî de têdayene.

Mîrî xo kenê kundanê qican, kurmancî te ra vanê girekî, zazakî zî te ra vanê kundî.

Ma pay şive/tîre kundanê tenik akerdenê zere ko hedre kerdo ey kenê mîyanê cî û mîrê xo kenê diqat ma lewanê mîrî gişt kenê semedoko kîr hanê bo.

Ma mîrî xo ewilî erzenê serê sêle û dima zî erzenê binê sêle hetanî heme hetê binhadiri biqendelî.

Çime: Fikrîye HÛMAN

Serrê aye: 43

Perwerdeyî: Nêwende

Herêm: Qurmik/Licê/Amed

Serre: 2015



## • Mastawa

Vercû ma ewilî hebê xo tehnaî, ma do girayî hebê qo ma tehnaî ma eştêni moni doyi peyşeyni ma hebê zêde heştî ci, girayî girayî bîne qalind û ma nayiro ma rûnê xo zere tawayidi helnaî, vercî qasike herinî bi, ma mastawayî xo kerdê ci ma mastawa zere qasike de kerdêni çale û ma rûnî xo kerdêni zere çale û ma werdeni.

Çime: Rinde TEKÎN

Serrê aye: 56

Perwerdeyî: Nêwende

Herêm: Şêxbûba/Pasûr/Amed

Serre: 2015



Ozan AKTEKÎN

# Dawetên Herêma *Mûşê*

Bi gelemperî lawik û dê û  
bavên wî gelek caran digel wan  
xwişka lawik a mezin jî bi hev re  
diçin mala keçikê.  
Dema çûna mala keçikê, malbata  
lawikî bi xwe re tiştên xwarin û  
vexwarinê bi xwe re dibin.  
Dema ku çûn malbata lawik û  
malbata keçikê bi hev re dişêwirin.



## Em niha ji herêma serhedê-jî bajarê Mûşê mînakekê dawetan bidin, ka em lê binêrin ew dawetên xweş û geş çawa çêdibin.

Çanda dawetan bi rastî jî di nav me Kurdan de cihê girîng digire. Gelê Kurd ji kêf û şahiyê pir hez dikin, ji ber vê yekê jî dawetên Kurdan wek mîna mîhrîcanan xweş û geş dibin. Lê belê di nav dawetên Kurdan de li gorî herêman cudahî derdikevin holê. Em vê cudahiya di nav dawetan de dikarin li her herêmê bibînin. Lewra çanda her herêmê cuda ye. Di çand û hunera me de, di dîroka me de evîndarî pir muhîm e. Di çanda me de gelek çîrokên evîndariyê hene, mîna ku Mem û Zîn, Siyabend û Xecê, Derwêş û Edûlê hwd. Bi rastî jî eşq tiştêkî xweşik e û di navbera keç û xortan de jî gelek caran eşqên mezin çêdibin lê mixabin hemû aşiq jî nagêhêjin miraza xwe, lê dema ku digihêjin mirazê xwe jî ew car bi daweteke mezin û geş re diçin ser mirazên xwe. Em niha ji herêma serhedê jî bajarê Mûşê mînakekê dawetan bidin, ka em lê binêrin ew dawetên xweş û geş çawa çêdibin.

Niha ji gundê Dêrik ê ku bi Milazgirê ve gîrêdayî ye li ser dawetên wan em ê bisekinin. Gundê Dêrikê gundekî mezin e, nêzikê 300 mal di gund de hene û kêma zêde 1000 mirov tê de dijîn. Dawetên wî gundî pir xweşik û rengîn in.

### Destpêka Zewacê

Belê em niha ji serî de dest pê bikin, ka zewac çakî<sup>1</sup> dibe û çakî dest pê dike. Li herêma Mûşê dema ku xortek bixwaze bizewice şertê pêşî divê eskeriya xwe kiribe. Piştî eskeriyê eger lawik ji xwe re keçek nedîtibe dê û bavên lawik li gor malbat, çand û ûrfa xwe ji lawê xwe re li keçekê digerin. Hin ciwan jî piştî eskeriyê diçin ji xwe re kar dikin ji ber ku qelenê rinda xwe temam bikin. Li herêma Mûşê nextê<sup>2</sup> keçikan di navbera 10-20 zêran de ye. Lê ev qelend piranî jî bo cihazê bûkê tê serfêkirin. Belê em niha dest ji qelend berdin û herin destpêka zewacê, çî dibe û çî diqewime? Dema xortek dawa zewacê bike, ew xort caran tiştên ecêb dike, mîna ku bixeyde, dema ku xort li ma'neyan digere, ew çax dê û bavên wî dizanin ku ew dixwaze ku bizewice. Ew tiştên ku min qala wan kir di çanda berê de hebûn, lê niha tiştên wisa kêma mane. Heger dildariyeke lawik hebe, ew ji diya xwe re dibêje û diya lawik jî ji zilamê xwe re dibêje. Bi wî awayî bavê lawik diçe ji bavê ke-

çikê re qala rewşa wan dike û heger ku bavê keçikê qebûl bike vê carê bavê keçikê diçe ji xanima xwe re behsa xwezgîniyan dike, xanima wî, jî ji keça xwe re dibêje, heger keç qebûl bike, rêya mala xwe didin xwezgîniyan. Malbata lawik diçe xwezgîniyê.

### Xwezgîni

Bi gelemperî lawik û dê û bavên wî gelek caran digel wan xwişka lawik a mezin jî bi hev re diçin mala keçikê. Dema çûna mala keçikê, malbata lawikî bi xwe re tiştên xwarin û vexwarinê bi xwe re dibin. Dema ku çûn malbata lawik û malbata keçikê bi hev re dişewirin. Keçik ji mazûwanên xwe re çayê amade dike û pêşkeşî wan dike. Piştî re jî lawik û keçik, carna jî li gel wan xwişk an jî dotmameke keçikê bi wan re diçin odê û bihev re dipeyivin. Di odê de ji şert û mercên xwe ji hev re dibêjin û heger keç û lawik li hev bikin, daxwaza xwe ya zewacê ji dê û bavên xwe re dibêjin. Ku malbatan jî li hev kirin û ku qedera wan jî çêbûbe, zewaca wan çêdibe. Piştî lihevkirinê dema şahiyê tê, yanê dema nîşanê tê. Nîşan, di zewacê de merhela herî serî ye, dema nîşanê; malbata lawik ji bo nîşana xwe gustîl û bazinên xwe distînin. Her du alî jî ji bo nîşanê gazî heval, meriv û cîranên xwe dikin.

### Dema Nîşanê

Dema ku diçin mala keçikê, mazûvan ji mêvanan re xwarinê çêdikin. Piştî xwarinê bavê lawikî tevî mêvan û rûspiyan, gazî bavê keçikê dikin ku ji bo qelend biaxivin. Wê demê bavê keçikê û merivên wî fikrên xwe dibêjin eger ku bavê lawik jî qebûl bike ew çax qelendê tê birîn. Dema ku qelendê tê birîn, bavê keçikê ji ber xatirê mêvanên xwe qelendê keça xwe hinek kêma dike. Piştî lihevkirinê re fatîha tê xwendin û nîşana wan dibe. Li vê herêmê di navbera nîşan û dawetê de sê yan jî çar meh hene. Piştî nîşanê di navbera sê yan jî çar mehan de şahiyek çêdibe û ji vê şahiyê re dibêjin heftelix<sup>3</sup>. Heftelix berê mezinan, ji ber ku heftelix piştî nîşanê dawet kirine, em ji vê heftelix re dibêjin heftelix lê wek hertiştî ev adetên me yê berê jî hatine guhertin, niha çend meh piştî nîşanê dawet çêdibe.



### Heftelix (Heftane yan ji Şîrînahî)

Zemanê berê wek niha Heftelix tune bû. Ji bo Heftelixê Şîrînahî dihat gotin. Roja Şîrînahiyê mala zavê ji bo mala bûkê şekerê toz ê çayê dibirin. Ev şekerê toz dikirin di nav qoçxaneyê mezin de û dixistin şerbet. Ji bo her mêvanekî şerbet belav dikirin.

Heftelix şahî ye û dema keyf û reqsê ye. Heftelix pêşiya dawetê û tenê li mala bavê bûkê tê lidarxistin lê hemû tevdîrên heftelixê bavê zavê tine cî.

Tevdîra heftelixê jî ev in: Gerek bavê zavê sazbandekî (orkestra) bigire. Gerek çerez (êmiş) bikire. Ji bo bûk û malbata wê xelatan bistîne. Di roja heftelixê de bavê bûkê destûr bide zavê, ew diçe mala bûkê û tevî heftelixê dibe, lê

heger mala bûkê li ciyekî dûr be an jî xezûrê zavê destûr nede zavê, ew li mala xwe di nav xeyalên xwe de dimîne (piranî zava tevî heftelixê dibe). Sibeha heftelixê, bûk, zava, berbû û birazava diçin kuafor, porên xwe çêdikin, kincên bûkanî û zavatiyê li xwe dikin.

Heftelix piştî nivro dest pê dike û heya êvarê, piştî hina bûkê xilas dibe. Roja heftelixê mêvan û ciwanên hatine dawetê govendê digerin û roja xwe bi lîstikan diqedînin. Bi rastî jî gelek cureyê govendê li hêla Milazgirê hene. Wek mînak; delîlo, cîda, koçerî, şêxanî, qilîçkiya sivik û ya giran hene. Dema ku wextê hinê tê, keçik bûkê tînin holê, dev û dora wê digirin, bi stran re tepsiya hinê li ser serê bûkê digerin. Bi coşeke mezin heftelixa xwe diqedînin. Mêvanên ku hatine dawetê jî û tevî malbata zavê

vedigerin malên xwe lê bûk li mala bavê xwe dimîne.

### Siwarkirin

Siwarkirin merhaleya dawetê ya herî dawî û ya herî girîng e. Piştî heftelixê çar an jî pênc meh şûnve bûkê siwar dikin. Di navbera heftelix û siwarkirinê de malbata zavê tevî xelatên ku stendine diçin mala bûkê. Xelatan didin mala bûkê û roja siwarkirinê diyar dikin. Wextê dawetê herî dereng di navbera hefteyek an jî deh rojan de eşkere dibe.

Di nava heftê de malbata zavê tevdirên dawetê dibînin. Tevdirên dawetê wiha ne: Bavê zavê ji bo mêvanên xwe xwarinên xweş bê çêkirin diçe goştê sor distîne; li ber goştê sor, birinc, cacix û tirşik tê çêkirin. Tevdirên din jî çerez, sazbend, bangname hwd. Dema ku ew tişt amade bûn, pişt re eger ku hebe birayê zavê an jî pismamê zavê ji nas û xwendiyên xwe re bangname dişînin, wê demê ji bo dawetê merivên zavê yê ku ji bajarên dûr dijîn jî tînd tevî dawetê dibin.

Roja pêşiya dawetê danê nîvro malbata zavê hin erebeyan digirin û tevî milletên xwe diçin mala bûkê ji bo hina bûkê. Belê roja pêşiya siwarkirinê jî hina bûkê çêdibe. Ew çax jî mîna heftelixê ye û bi rastî demeke pir xweş e. Lê ji bo bûkê û malbata wê hinek bi xemgînî derbas dibe, lewra ew şev ji bo bûkê şeva dawî ya li mala bavê wê ye. Ew şev dawet heya derengiya şevê didome. Dema ku qediya jî malbata zavê û hemû mêvan belav dibin û diçin li malên xwe. Bûk, berbû û xwişkek an jî dotmameke zavê li ba bûkê dimînin. Roja din malbata zavê sibeh zû radibin dîsa tevdirên xwe dibînin. Sibehê birazava, zava hildide û diçin mala bûkê. Bûkê tevî berbû hildidin diçin kuafor, dema ku karê wan diqede, vedigerin diçin li mala bûkê û li benda malbata zavê disekin. Dema ku malbata zavê tê ku bûka xwe bibin, birayê bûkê qurdela pişt wê girêdide û xwişka bûkê jî li pêş derî disekine ji bo bavê zavê xelatekê bide wê, heya ew xelata xwe nestîne rê nade wan. Xelatên din jî ev in: ji bo balîfok (balîfa biçûk) û ji bo sindoqa bûkê xelat tê girtin. Xelatên tînd girtin jî bi gelemperî zêr an jî pere ne. Piştî jî dawetvan li erebeyên xwe siwar dibin û diçin mala zavê.

Dema ku bûk tê li ber derî sazbend dest bi stranên dike. Hinek ciwan ji kêfa xwe guleyan

berdidin hewayê, dûre ciwan dest bi govendê dikan. Bûk û zava li ciyekî rûdinin û keç û xort tînd wan pîroz dikan. Govend heya nîvro, heya ku xwarin amade be didome. Dema ku xwarin tê, sazbend disekin. Camêrek tepsiyekê hildide û ji bo mirovên ku hatine dawetê xelatên xwe bavêjin diçe ciyê ku mîr lê kom bûne. Bi heman awayî jinek jî diçe nav jinan ji bo xelatan bistîne. Dema ku mêvanan xelatên xwe avêtin ew camêr bi dengekî bilind dibêje çiqas xelat hatiye li ser dawetê û dûre jî ji bo mêvanan xwarinê tînin. Aşpêjê xwarinê li benda xelata xwe dimîne, piştî stendina xelatê xwarinê li mêvanan belav dike, ev xelata ku tê stendin ji bo sitîla goştê tê stendin. Pêşiya xwarinê çerezan belav dikan. Dema ku mêvanan xwarinên xwe xwarin û çerezên xwe hildan diçin cem bav û apên zavê ji bo daweta wan pîroz bikin. Piştî jî ciwan û mezin dest bi govendê dikan û govend heya hina zavê didome. Bêriya hina zavê birazava ji bo ciwan werin li ser hina zavê gazî wan dike û ji wan re kaxizên hinê dişîne. Dema dibe êvar hina zavê dest pê dike, ciwan tînd li ser hinê û bi gelemperî deh panot davêjin li ser hinê. Ew pereyê ku tê ser hinê ew digihêje birazavayî, dema ku hine xilas dibe, hinek ciwan diçin li serbanî agirbazî (havaî fîşek) ditêqînin. Piştî jî govend dîsa dest pê dike û bi coşeke mezin didome û heya nivê şevê berde-wam dike.

### Mehrbirin

Mehrbirin li gorî dîne Îslamê ji bo zewac bê temamkirin û şexs bibin helalîyên hev ji aliyê me-layan ve tê birîn. Roja siwarkirinê mehr tê birîn. Bi hatina mela re bûk û zava ligel du şahidên xwe diçin odê. Mela ji her duyan dipirse: hûn hev wek jin û mîr qebûl dikan an na? Heger bersiva wan erênî be mela mehra wan dibire û fatîha tê xwendin.

Bûk pîrî caran ji zava mehr (navê xelatê) dixwaze. Heyamên berê bûkan pîranî çêlekek an jî bizinek dixwest. Di dewra niha de pîranî bazin an jî zêrê mezin tê xwestin.

Xwedayê mezin mirazê hemû ciwanan bike...

<sup>1</sup> Çakî: Çawa

<sup>2</sup> Next: Qelend

<sup>3</sup> Heftelix: Heftane

# PAŞA Û DİZD



Arêkerdox:  
A.Hamit ŞALO



Cayk benû cayk nêbenû. Yew pîr yew zî lac ya benû. Enî zaf feqîr benî. Şewik lacek yew deva onû kêye di sere birnenû. Mevac ena devayî paşa ya. Maya xo temî kenû.

- Bewn mi ra wa yew pey nêhesûk ma ena deva birnaya.

Lacekî to şinû sûki di gêrenû. Ewnenû kû delal ha vendenû, vonû:

- Hay hew û hay hew. Ma eşnawûtû ma nê-eşnawûtû mevacîn. Deveyî paşay vinîbîya kom kes dîya ya se wa bîyarû teslîm bikû, hay hew û hay hew.

Paşa vendenû wezîronî xo vonû:

-Ma ena deva çawa peydaki. Yew xo vera nêard. Şima vonî ma se biki.

Serwezîrî hi vonû:

-Paşayî mi qet maraq mek. Ez ena deva pey-dakeno, kom kes berda ya se gerêk cezayî xo vînu.

Wezîr to warzenû şinû vendenû çend heb cenîyon parseko. Hîni ra vonû:

-Şima koni mîyon sûki ber û ber parse kenî hend bikîn şima ena devayî paşay peyda biki.

Cenî konî mîyon kûço ber û ber konî parse wazenî çimonî xo çehar aken û der û dor ewnênî yew cenî yena ver berî lacek dona berir parse wazena. Maya lacek ewnêna yew parsekîk ver berîda cir dûayo kena. Pîrê ona leteyîk goşt dona cenêk û berî xo padona. Cenîya parsek ewnêna enigoşt goşt devawû ûca di gûney goşt sawena berî lacekî ra ew xo vîni kena şina serwezîr het qal goşt û pîre kena. Lac pîre yen ewnênûk ser berî hîni pey gûn nişo bîyû yew. Şin zere maya xo ra persen maya hî senî ka qal û cenîka parsek kena lacek cadi vecênû teber kom cî ber yenû hî ver pey gûn nişo kenû şinû.

Serwezîr cenêka parsek û çend keso gênu şinû ay kûçe ewnênûk yew ber teyna gûni nîw, heme berî bigûn nişo kerdeyî. Cenîk ra hêrs benu poşmon benu tepa şinû. Ena yew zaf zorî paşay û serwezîr şinû. Paşa serwezîrî ra von ma çawa bik enî dizdi xo ma tepşî. Serwezîr von; "paşayê mi ti qet maraq mek yew pfloney mi esta ena ray ma meheqeq hî tepşenî."

Onu kuçonî ra zerda rûşnen ew merdûmo finen teqibat kom çewt bîbu erdir ay dizdu hîni ra vonû cadi tepşên bîyarîn. Lacek ewnênû heme ca di zerd rûşnayey şinû bîni sewlonî xo

zift kenû ew enî zerdo ser gêrenû pêrey zerdo bîni sewlora dûsenî.

Serwezîr persen vonû:

-Enî zerdo kom arekerdî, merdûmîk teqibatidey vonî.

-Ma tû kes nêdî bi kû erdî ra zerd girewt. Ma nêzonî çawa tirawşay. Serwezîr û paşay hêrsonî ra delû benî. Paşa, serwezîrî ra vonû:

- Weli bi torî bû. Ti nêşkay yew dizdîk tepşî. Ti vîni ez enî dizdî çawa tepşena.

Paşa warzenû yew cadi textîk don piro cay keynay xo serî textid virazenû keynay xo benû text ser. Dormarey textî qamîk çal kenû, ew bi awey zebebo dekenû don delalo vendayîş. Delal vonî:

-Hay hew û hay hew, ma eşnawût û ma nê-eşnawûtû mevacîn. Paşayî ma vonû kom kesûk xo biresnû keynay mi ez keynay xo dono aye kesî. Hay hew û hay hew. Ma eşnawût û ma nêşnawûtû mevacîn.

Lacek şinû kêye, yew meşkîk genû ew vendenû xalî xo. Xalî ra vonû:

-Xalew emşû bê ma şerî cayk dizdey. Qîsey peron xo ra zerdo vecenû don xalî xo. Xal razî kenû.

Wextûk şew bena varzen pîya şinî cay keynay paşay. Xal donû vernî, senînak xal gam erzen kon mîyan lemîr zebebo. Kift xal tebera monen. Lacek vonû:

-Xalew xo têrmed, vindir."

Xal cay xo dî vîndenû lacek pay non serî kift xal û xo resnenû text keynay paşay. Bi keynay paşay şay benû.

Dest sibehid keynak xo hesêna virarey ya di yew meşkîk esta, nat û wet ewnêna çew çinîkew, dona meşkir erzena.

Paşa merdûmanî xo erşawen û keynara persenî, keyna vona hal hewal ensin bîyû. Paşa kû ena mesela pey hesenû vonû ena ray zî nê bi. Xo rî yewîna pîlon virazenû, vonû vendîn heme carmêdo ayû kû nêrû koşkey mi serey hî cira-kîn. Keynay paşay xelesêna, ci ri yew lacîk benû. Gede hîndî paykewtû, paşa vonû ma kû gedî bik mîyon carmêdo, gede şî kom carmêdî het ay kes pî gedîyew ay wext ezûk dizdî xo tepşo

Rocak carmêd kê paşayid arêbenî, lacekû dizd warzen yew arwêş kenû xo pisti şinû koşkid rûşnenû. Gede mîyon carmêdonî ra gêren yenû

dizd ver, dizd pistin xora arwêş nawenû  
gedî gede tersen weta şinû

Paşa ewnênûk ena pîloni zî nê tepişt don  
delalo vendayîş vonû:

-Enû dizd wa bêr ez hî keno zomay xo, hî  
efû keno.

Delal konû mîyon sûk watey paşay qîrenî.  
Lacekî dizd warzenû şinû kê paşay. Heme

kerdeyonî xo paşay rî qal kenû. Paşa hî efû  
kenû keynay xo donû dizdî ew vonû:


-Merîfet kerdey to nê bi, merîfet ca dayîş  
kerdey to bi.

**Çime:** Hasan ÇELİK

**Perwerdeyî:** Nêwende

**Herêm:** Hênê

**Serre:** 2014







Eşref KEYDANÎ

# SERSAL, BÎRA ME YA HÎN NEÇIKYAYÎ

Peyva Sersalê yan jî bi awayê ravekî Serê Salê mîhrîcanêke navneteweyî ye. Li rûyê erdê di nav gelek civak, welat, dewletan de çî bi awayekî fermî çî jî nefermî he ye. Ji Çînê bigire heta parzemîna Efrîkayê mirov rast li vê mîhrîcanê tê. Di nav milletê Kurd jî bi navên cuda û di dîrokên cuda de ev mîhrîcan bi sedan salan e he ye. Ev cudanavî û wextên cuda yên pîrozki-rinê bûne sedema gengeşîyeke mezin.

Li dinyayê ti netewe yan jî welat tune ye ku ne xwedî mîhrîcan û pîrozbahîyan be; kêma zêde li her welatî mîhrîcan he ne û her netewe xwedî hin mîhrîcanan e. Dem û guherîna hin mîhrîcan bi ber bayê xwe xistine û ji holê rakirine, di hinan de jî dirûv guherîye bes kakil maye.

Hinek mîhrîcan di nav neteweyên din de jî he ne hinek jî xasma ên wê neteweyê ne. Sersal an jî bi navekî din Serê Salê jî yek ji wan mîhrîcanan e. Sersal di nav heteweyên din de jî he ye û herku diçe pîrozbahî û sembol û rêûresmên vê mîhrîcanê ber bi yeksanîyê ve diçin. Ev yeksanî jî me dûr dixê ji bîra me û bîreke din raberî me dike. Ez ê hewl bidim ku di vê gotarê de taybetiyên Sersala Kurdan, cudatîyên herêm, ol û zaravayan û girîngîya van ji bo bîra me ya hevpar raber bikim.

**Peyvên Sereke:** Sersal, Kurd, mîhrîcan, bîr

## Destpêk

Di jîyana me ya rojane de belkî bi dehan daran em van peyvên; şahî, pîrozbahî, dîlan, cejn, aheng, mera-sîm û mîhrîcan seh dîkin. Bêyî ku em li ser wateya wan a etîmolojîk bifikirin em li gor çarçoveya di hişê xwe de tevdiagerin û têdigihên ku qest jê çi ye. Herçend nûans hebin jî di nav van peyvên de, têgeha mîhrîcanê berfirehtirîn têgeh e di nav wan de. Aynur Îmîrgî dibêje ku; *"Mîhrîcan beşeke sereke ye û ev beşên din hemû binbeşên wê ne."* (Îmîrgî 2005: 29-36) Di kurmancî de mîhrîcan beramberî peyva festîvalê tê bikaranîn. Sersal jî yek ji wan mîhrîcanan e ku hîn jî di bîra me Kurdan de, bîreke zindî ye, ji şîrî heta pîrî tê zanîn.

Berî ku em dakevin kûranîya mijarê lazîm e em hinekî li ser têgeha mîhrîcanê serê xwe biêşînin. Ev têgeh, çi di xwe de dihevwîne çi li derveyî xwe dihele divê bê dîyarkirin.

### 1- Mîhrîcan çi ye?

Wek hemû têgehên dîtin ji bo mîhrîcanê jî gellek pênase hatine kirin. Pênaseya mîhrîcanê li gor Ferhengê Oxfordê wiha hatîye kirin: *"Mîhrîcan rojek an jî rojên ku ji bo pîrozbahîyeke taybet hatine dîyarkirin e."* (Oxford Dictionary 6.th Edu. 431) Di vê pênaseyê de tişte girîng ew e di nav jîyana rojane de, roja mîhrîcanê rojêke taybet e. Folklornasê Amerîkê Jerome Robert Smîth serê xwe bi tîra xwe bi vê meseleyê re eşan-dîye û di gotara xwe ya navdar *"Mîhrîcan û Pîrozbahî"* yê de hin pênase berpêşî me kirine.

*Mîhrîcan; wexteke girîng û taybet a komekê ye.*

*Mîhrîcan; ew pîrozbahîyên ku dubare dibin e.*

*Mîhrîcan; pîrozkirina bûyer an jî kêlikeke girîng a kesekî an komekê ye.*

*Mîhrîcan; ew wexta girîng û taybet a ku mirov ji karkirinê rizgar dibe û kêfê dike ye.*

*Mîhrîcan; rêzebûyerên jînê yên girêdayî hestan ên bi awayekî sembolîk bi hev re tînin jîyîn in. (Smîth 1972: 159-173)*

Thomas A. Green di berhema xwe ya binavûdeng *Folklore/An Encyclopedia Of Beliefs, Cus-toms, Tales, Music, and Art* dibêje ku; *"Mîhrîcan, pîrozbahîyên dubarebûyî ne ku-ew ji listik, rêûresm, şîyan, hizir û kevneşopîya komeke civakî yan çandekê pêk tî."* (Green 1997: 296)

Bi kin û kurmançî em dikarin bibêjin ku di her pênaseyekê de tişteki girîng e mîhrîcanê derdikeve hemberî me. Carinan awayê pîrozkirina wê, carinan beşdarên wê carinan jî sedema wê. Çi dibe bila bibe wek ku Smîth jî dibêje ya girîng ew e ku hesta parvekirinê di ser van hemûyan re ye.

### 2- Mîhrîcana Sersalê

Peyva Sersalê yan jî bi awayê ravekî Serê Salê mîhrîcaneke navneteweyî ye. Li rûyê erdê di nav gelek civak, welat, dewletan de çi bi awayekî fermî çi jî nefermî he ye. Ji Çînê bigire heta parzemîna Efrîkayê mirov rast li vê mîhrîcanê tê. Di nav milletê Kurd jî bi navên cuda û di dîrokên cuda de ev mîhrîcan bi sedan salan e he ye. Ev cudanavî û wextên cuda yên pîrozki-rinê bûne sedema gengeşîyeke mezin. Em ê hewl bidin ku bi vê senifandinê mijarê hinekî zelal bikin. Lewra divê em ewilî berê xwe bidin bersiva van pirsan.

#### 2.1. Çend sersalên me he ne û kengî tînin pîrozkirin?

Dibe ku ji bo hinekan ev pîrsa ku dupirs e û bersivên wê di nav hev de ne pîrseke hêsan be, lê bi gelemperî gava em berê xwe didin nav civakê em dibînin ku serê salê bûye bela serê me. Li cem kal û pîran bersiva vê pîrsê cuda, li cem xortekî niştimanperwer cuda, li cem zarokeke/î ku li şargewreyan mezin bûye îhtîmal e ku cuda ye. Zarokê ku li bajaran mezin bûye dê bibêje; Sersala me yek e û roja pîrozkirinê jî şeva 31ê Kanûna Pêşîn e. Xortê niştimanperwer dê bibêje; Sersala me yek e û roja pîrozkirinê jî roja 21ê Adarê ye; kal û pîrên me jî dê bibêjin; Sersala me yek e û roja pîrozkirinê jî şeva 13ê Kanûna Paşîn e. Ji bo bersiva vê pîrsê em ê yek bi yek qala wan bikin û ji bo rihetfamkirinê wan li gor dîroka pîrozkirina wan bi nav bikin.

### 2.1.1. Ya 31'ê Kanûna Pêşîn

Herçî ya 31'ê Kanûna Pêşîn e -ku li dinyayê bi navê Noel/Chrîstmas/Babbo Natule/Santa Claus tê zanîn- aleqeya vê mîhrîcanê bi neteweya me tune ye. Mîhrîcana Noelê, bi mebesta welidîna Pêxember Îsa tê pîrozkirin û mîhrîcaneke olî ye. Jerome Robert Smîth di vê derbarê de wiha dibêje; *"Ev mîhrîcan di eslê xwe de mîhrîcaneke demsalî bû, piştî ku paganên nekarî dev ji mîhrîcanên xwe berde, ezîz û şopdarên Îsa bi hinceta welidîna Îsa -ku kes nizane kengî ye- ev mîhrîcan guherî û tiştên nû lê bar kirin."* (Smîth 1972: 159-173) Jixwe di nav milletê Kurd de, bi taybetî Kurdên ku bi ziman û esl û fêslê xwe dijîn de, vê rojê cîyek nedîtîye ji xwe re. Lê di nav Kurdên ku li bajarên dijîn, xwenda, dewlemend û eraqexwaran de rewaca pîrozkirina vê mîhrîcanê zêde ye. Bi taybetî bi belavbûna tv'yan, vebûna firoşgehên mezin û helmetên danûstandinê, vê mîhrîcanê ji xwe re daxwazkar dîtine û her ku diçe ev rêje zêdetir dibe.

### 2.1.2. Ya 20'ê Adarê

Herçî ya Şeva 20'ê Adarê û roja 21'ê Adarê tê pîrozkirin jî di nav milletê Kurd de wek Sersal tê pîrozkirin û di edebîyata me ya klasîk de beytên ku qala vê sersalê kirine jî he ne.

#### Bi Derketina Şehrîyan e, Bi Deştê Ji Bo Seyrana Sersal û Geştê

*Dewra felekê ji bextê feyroz  
Dîsan ku numa ji nû ve Newroz  
Bajêr û kelat û xanî berdan  
Teşbîhê bi nejdîyan û cerdan  
Sersalî û bakir û ruwalan  
Sedsalîw ciwan û pîr û kalan  
Sersal li resm û rahê me'hûd  
Gêran di cih û meqamê mehmûd (Xanî, Mem û Zîn: 224-225)*

Xanî di vê beşa helbestê de qala çûna seyrana Newrozê dike û Newrozê wek Sersal bi nav dike. Ne tenê Xanî, herwiha Cizîrî jî di helbesta xwe ya Newroz û Sersal de gotîye;

#### Newroz û Sersal

...  
*Ev narê siqala dil e  
Daim li wê qala dil e  
Newroz û sersala dil e  
Wextê hilitin ew sirac (Cizîrî, Dîwan: 71-72)*  
...

Di van herdu deqên klasîk de, em li ber navê Sersalê navê Newrozê jî dibînin. Em dikarin bibêjin ku ev mîhrîcana ku tê qalkirin roja Newrozê ye ku li ser destana Kawayê Hesinkar şax vedaye. Musa Anter derheqê vê de wiha pêdaçûye *"Newroz, bêhtir wek cejna azadiyê tê pîrozkirin. Mîna sembola serfirazîya Kurdan ku qehremanê mîtolojîk Kawa, li dijî zulma Samî Dehakê zalim, serî hildide û Kurdan ji bin destên wî xelas dike."* (Anter, Kovara Bîrnebûn 9: 65-70)

Herçend navê vê mîhrîcanê jî Sersal be û birra jî destpêka biharê û sembola vejînê be jî lê beramberî Noel/Chrîstmas nayê. Beramberî Newroza Kurdan mîhrîcanên bi heman babetî -despêka biharê- Karnaval û May Day, Hidirellez, Şîhrîl Baf he ne û rêûresmên van jî kêm zêde nêzî hev in.

Mîhrîcana Newrozê, hem mîhrîcana demsalî hem jî mîhrîcaneke polîtîk e. Bi taybetî di van bîst sih salên dawîn de -bi xurtbûna hizra Kurdayetiyê- ev mîhrîcan hinekî din polîtîktir bûye.

### 2.1.3. Ya 13'ê Kanûna Paşîn

Sersala Kurdan a ku di nav kal û pîran de, li cîûwarên ku ji teknolîyê mehrûm maye de dijî ev Sersal e. Bi du awayan tê gotin: Serê Salê û Sersal. A rast a dawîyê halê kurt a pêşîyê ye jixwe. Di nav Kirmancan de jî bi heman awayî tê gotin. Lê herçî Kirmancên Dêrsimî ne, jê re dibêjin Gaxan. (Kahraman, 2008) Di vir de sebaba cudatîyê ne zarava bêtir ol û mezheb in. Çimkî di Gaxanê de hinek cudatî hebin jî bi rêûresmên wê wek Sersalê ne. Jixwe rêgezeke sereke a ku mîhrîcanan ji hevdu cuda dike rêûresm in.

Ji ber ku Kurdistan welatekî fireh e û Kurd jî dabeşî ser ol, zarava, mezheb û dewletên cuda bûne, pîr zor e ku tiştêk bi awayekî resen û yekgirtî mabe li cem hemû Kurdan. Mîhrîcana Sersalê ku li pîrranî herêmên Kurdistanê he ye, li gor salnameya Rûmî tê pîrozkirin. Dijwar ÊSKAN di gotara xwe ya Kovara Folklorê Kurdan de ev mesele wiha şîrove kirîye. *"Hîn jî kal û pîrên Kurd, Salnameya Kurmancî bi kar tînin. Ev salname, yekgirtî ye û îro jî tê bikaranîn. Salna-meya Kurmancî li gor ya Mîladi 12-13 rojan li paş e. Ango sersala Salnameya Kurmancî di nivê şeva 12'ê Kanûna Paşîn da tê pîrozkirin."* (Êskan, Kovara Folklorê Kurdan, 5:46) Herwiha Muşa Anter jî wiha qala vê meseleyê dike. *"Sersala Kurdan piştî 1'ê Çilê miladî bi 13 rojan e. Li giş gundan vê rojê, sersal dihat û hîn jî tê pîrozkirin."* (Anter, Kovara Bîrnebûn 9: 65-70) Sehi-tîyeke din a li ser vê mijarê jî ya Şeyhmus Dîken e; wî jî bi vî awayî qala Sersalên Amedê kiriye:

*"Sersala me ya rastîn di şeva 12'ê Kanûna Paşîn de bû. Ev sersal sersala me bû. Û heke gotin ne şaş be, wek cejnêkê dihat pîrozkirin. Şîv dihatin çêkirin, şîranî dihatin amadekirin. Kûpên kesk ên ti-jjêmiş jî kîleran-ku payîzê hatibûn dagirtin- dihatin deranîn. Û bi vî awayî hazirîya wê roja taybet di-hate kirin..."* (Dîken, Tîgrîs)

*"Ev sersala ku niha mîlet diwê(dibêje) sersal, ne sersala me Kurda ye. Me berê sersala xwe di 12 rojan piştî vê sersala ku mîlet dike, dikir. Me xorta xwe digihand hev û me xwe ji bona êvarê hazir dikir. Ev tişt miştên ku niha roja 1'ê mehê çêdikin berîya teleyzon û radyoyan kesî nizanbû çî tişt e. Yanê eva yekê mehê emrê wê hebe hebe bila 50 sal, lê a me ya Kurmancî belkî çend hezar sal tê he ye. Me ji bav û kalê xwe girtiye, bav û kalên me jî ji bav û kalên xwe."* (Hevpeyvîn bi Mistefa Buran re, Eşref Keydanî)

Herwiha gotineke me ya pêşîyan jî he ye ku mîhrîcana Newrozê jî ya Mîhrîcana sersalê cuda dike. *"Serê salê berf li derê her malê."* (Cefer, Gotinên Pêşîyan, 2006: 59)

## 2.2. Taybetîyên Sersala Kurdan

Wek hemû mîhrîcanan Sersala Kurdan jî xwedî hin taybetîyan e. Ev taybetî hem roleke xweserîyê didin van mîhrîcanan hem jî roleke resen. Smîth vê mijarê wiha şîrove dike: *"Mîhrîcan pîrî caran yekem roj e ku her beşdarek bi cilên xwe yên herêmî beşdar dibe. Ev cil pîrranî cilên bavûkalan yên kevneşopîyê ne. Û herwiha di van rojan de rîmzek tê xemilandin. Xwarin û vexurka/ên kevneşopîyê teqez dê hebin. Digel vê jî bi amûrên herêmî yên muzîkê stranên herêmî tîn strî; gotinên pêşîyan, lihevanînok û mamik û keresteyên devkî tîn pêş-keşkin."* (Smîth 1972: 159-173)

Li dor çarçoveya ku Smîth danîye, dê taybetîyên Sersala Kurdan bîr rêzkirin. Di hinek beşan de mînakên Sersala Kurdan zor zêde ne, di hinekan de jî kêr in. A esil jixwe ne ew zêdebûn û kêmbûn e, hebûna hin taybetîyan e.

### 2.2.1. Sersala Kurdan Çend Roj e?

Di hemû mîhrîcanan de sê kertên sereke he ne: Amadekarî, Pîrozkirin û Qedandin. Di hin mîhrîcanan de ev her sê kert di rojekê de dibin, di hinekan de jî li bi rojan tê kirin. Sersala Kurdan bi qasî ku ji agahîyên ber destan tê famkirin rojek e. Lê di hin herêm/olan de ev li rojan belav bûye. Bi taybetî di nav Êzdîyan de, ev mîhrîcan li rojan belav bûye: Ev mîhrîcan ku Êzidî jê re dibêjin Cejna Batizmê, di roja heştan de bi rêûresma tîatral a ku me qal kir diqede.

Roja yekşembê: Cilşo  
 Roja dişembê: Nanê mirîyan  
 Roja sêşembê: Nanê mirîyan  
 Roja Çarşembê: Pezguran  
 Roja pêncşembê: Ger  
 Roja îne: Xew  
 Roja şembîyê: Kar  
 Roja yekşembê: Sersala Batizmîyê (Xerîbo, 2014)

### 2.2.2. Amadekarîyên Sersala Kurdan

Wek ku me di beşa jorîn de jî got, kerteke mîhrîcanan jî amadekarî ye. Ji bo ku kerteşa pîrozkirinê bê kirin jê re amadekarî divê. Amadekirina xwarin û vexurkan, rêûresman bivênevê ye. Berîya van jî tiştêkî giştî he ye ku di hemû mîhrîcanan de tiştêkî sereke ye; paqijî. Her malbat ji bo êvarê -pîrozbahîyê- ji sibehê de dest bi paqijiyê dike. Lê ji ber ku demsala zivistanê ye ev paqijî ne wek van paqijiyên havînî û biharê ye. Divê em vê jî ji bîr nekin ku amadekarîya malbatan he ye û amadekarîya xortan a ji bo rêûresmê he ye. Lazim e em hinekî qala wê jî bikin. Xortên ku dê bibin Kose/Qirdik/Kalê Salê/Kal Gaxan xwe digihînin hev li malekê û plansazîya xwe ya êvarê dikin. Kî dê bikeve çî dilqî biryarê digirin û bi hev re ji bo amadekirina dilqan (kostum) dikevin nav liv û tevgerê. Heke hebin amûrên xwe yên muzîkê jî eyar dikin ji bo êvarê.

### 2.2.3. Rêûresma Sersala Kurdan

Pirî mîhrîcanan li ser rêûresmekê ava dibin. Wek ku Smîth jî dibêje, di van rêûresman de guherînên mezin pêk bîn jî kakil wek xwe dimîne û a esil jî jixwe kakilê van rêûresman e. Berîya ku mirov di nav hûrgulîyan de winda bibe, lazim e hinekî li ser navê vê rêûresmê bisekinin. Li gor herêman navên cuda li vê rêûresmê hatine kirin. Tabloya herêm û navê rêûresmê wiha ye.

#### Herêm Navê rêûresmê

Erxenî	Kose
Dêrsim	Kal Gaxan
Mêrdîn	Kalê Salê
Mêrdîn	Qirdik
Sêwreg	Kose
Qereyazî	Kosegelî/Kalê Salê
Şemrex	Kose/Qirdik
Sêrt	Dolîmolî/Kalê Salê
Pasûr	Kalik
Hezex	Qirdikê Sersalê

Ev rêûresm, kereseteyeke folklorîk e ku di xebatên monografiyê de jê re şanoya gelêrî tê gotin. Helbet wek hemû şanoyan tema, rol û dilqên vê şanoyê jî dê hebin.

#### 2.2.3.1. Tema û Pratîzekirina Rêûresma Sersala Kurdan

Armanca vê rêûresmê ev e: Parvekirin û xurtkirina têkilîyan. Û ev tema bi vî awayî tê pratîzekirin:

*“Xortên gund digihên hevdu. Pirranî jî li mala kesekî ku nû cihê/cuda bibe ji malbata xwe digihên hevdu. Çima derin mala wî, çimkî hem dikarin li wir rehet hereket bikin û hem jî şev derengî dikarin heta ku xwestin li wê malê bimînin. Dilqên xwe amade dikin nîvro. Êvar dibe heke sazband hebin wan jî bi xwe re dibin tune bin, bi xwe li teneke û dahol û bilûrê didin. Satilekê digrin ji bo rûnê nivîşk û*

qelîyê û tûrekî jî digirin ji bo bastîx, gûz, benî, çaqil (behîv); savar, nîsk, titûn. Heke hebe pere jî dixwazin. Mal bi mal digerin, direqîsin û dibêjin; va me ev bûk revandîye, me xwe avêtîye paş we. Gerek hûn bûkê-sax bikin. Xwedîyê malê heke bêje na, radibin zirarê didin malê, sobê hildişînin, tiştan dişkînin. Xwedîyê malê mecbûr dimîne tiştêkî bide wan. Heke neecibînin dibêjin, ev bûk qîza mîrê Ereban e/ev bûk qîza begê zozanan e. Xwedîyê malê mecbûr dimîne tiştêkî din li ser zêde bike. Ev mecbûrî ne bi kotekî ye, belkî bi nazdarî be. Carinan jî xwedîyê malê govenda wan naecibîne dibêje; ev çi ye filan û bêvan. Hingê kom dest bi hin tiştên din dike. Ereb di govendê de kose dide ber gopalan. Kose xwe diavêje erdê û bûk digirî. Û pê rengîntir dîkin. Hin caran jî hin malbatên çikûs/destteng derî venakin li komê, ew jî li ber derîyê wê malê çi bibînin bi xwe re dibin. Lome berîya Sersalê heftekî herkesî tiştên xwe digirtin hundir û digotin, weleh sersal digere ew ê tiştên me bibe.

Paşê derin mala ku hazirî lê kiribûn, sawar û qelî hebe xanima malê dikelîne û ew dixwin. Tiştên topkirî jî gişa didin ber xwe çi xwarîn xwarîn ên mayî ji mala lêne re dihêlin. Perê xwe jî parve dîkin. Para pîrr didin ê ketîye dilqê bûkê. Çimkî di gunda de kes naxwaze xwe têxe dewsa pîreka." (Hevpeyvîn bi Mistefa Buran re, Eşref Keydanî)

### 2.2.3.2. Rola Rêûresma Sersala Kurdan

Bi giştî çar rolên vê şanoyê he ne. Berbûk ji yekî zêdetir in, lê ji ber ku ne roleke sereke ye sê çar in lê wek rolekê ne di vê şanoyê de.

Xaleke din a girîng a vê rêuresmê jî ew e ku di hemû rolan de peya/zilam dilîzin. Rola bûkê jî zilam dilîzin. Jixwe ev rêgez di Şanoya Antîk a Yewnanan de jî wisa ye.

**Rola zavê:** Di nav rêuresmê de navê wî ne zava ye; li kîjan herêmê navê rêuresmê çi be, zava bi wî navî ye. Kose, Kosegelî, Qirdik hwd. Carinan wî bûk revandîye û qaşo dibe bûkê diavêje paş mala ku diçin serdana wê dîkin. Reşo/Ereb dijberî wî ye di rêuresmê de. Carinan ji Reşo/Ereb lêdanê dixwe û xwe diavêje erdê û dilqê mirîyan dike.

**Rola Bûkê:** Roleke din a sereke ya rêuresmê ye. Ji alîyê Ereb/Reşo ve tê parastin. Dilê wê li ser zavê ye, di ketina zavê ya erdê de rola haho û fixanê li ser wê ye. Di rêuresmê de, gava kesê di rola zavê de dikeve erdê, dibêje; haho te mêrê min kuşt!

**Rola Ereb/Reşo:** Ev rol li ser parastina bûkê hatîye avakirin. Ereb parazvanê bûkê ye. Carinan li zavê dixwe. Û di heman demê de rola zewicandina keçikê jî di destê Ereb/Reşo de ye. Gava zava xwe li mirinê datîne û bûk dibêje; haho te mêrê min kuşt, Ereb lê vedigerîne û dibêje; bila canê min û te sax be, qey ji te re mêr tune ne.

**Rola Berbûkan:** Bes di govendê de direqîsin, tûr û satilê bi xwe re digerin. Carinan kilaman dibêjin, li bilûrê dixin. Roleke ne sereke ye di rêuresmê de.

### 2.2.3.3. Dilqên Rêûresma Sersala Kurdan

**Dilqên ji bo rola zavayî:** Ji bo rih hirî. Ji bo serî kumik. Ji bo piştê balgeh. Ji bo destê wî jî gopalek.

**Dilqên ji bo rola bûkê:** Ev hinekî karekî hostane ye. Ji ber ku mêr di rola jinê de dilîzin îazim e rûyê wê xweş bixemilînin. Lam/gepên wê sor bikin. Ji bo serê wê kitanek, çîtek. Ji devla sîngan jî paçan dixîne. Li wir mirov divê bî bîr bîne ku di navbera çêkirina bûka Sersalê û personaya Şanoya Antîk a Yewnanan de têkilîyeke xurt he ye.

**Dilqên ji bo rola Reşo/Ereb:**

Rûyê wî bi tenîyê tê seyandin. Ji bo bûkê biparêze çoyek di destan de ye.

#### 2.2.4. Keresteyên Devkî yê Sersala Kurdan

Hin keresteyên devkî bi wê mîhrîcanê re bûne yek. Carinan bêyî ku qala wê mîhrîcanê bê kirin, gotina wan keresteyan mirov serwextê wê mîhrîcanê dike. An jî wisa lê tê ku ew keresteyên devkî dibin remzên wê mîhrîcanê û nahêlin ew bî jibîrkirin. Hin keresteyên ku di vê rêûresmê de tên gotin ev in:

*Serê salê, binê salê*

*Pîr qurbana xort û keça malê. (Diken, Tîgrîs)*

*Serê salê binê salê salê*

*Xwedê bihêle pisînga binê manqalê. (Diken, Tîgrîs)*

*Serê salê binê salê salê*

*Xwedê kurkî bide kevanîya malê (Omerî, 2012)*

*Serê salê binê salê salê*

*Xwedê bihêle xortên malê*

*Ka geşta vê malê. (Anter, Kovara Bîrnebûn 9: 65-70)*

*Serê salê binê salê*

*Xwedê lawkî bide vê malê. (Hevpeyvîn bi Mistefa Buran re, Eşref Keydanî)*

*Dam û dam*

*Gîskê qidam*

*Serê salê binê salê*

*Xwedê kurkî bide kevanîya malê*

*Kevanîyê destzêrîne*

*Destê xwe bavêj kulîne*

*Behra qirdik virda bîne. (Kartal, 2016)*

*Dolî molî dolava*

*Serê malê kulava*

*Xwidê keça malê bike bûk*

*Kurê malê bike zava (Yaş, 2016)*

#### 2.2.5. Xwarinên Sersala Kurdan

Xwarinên ku her mal çêdike û ya ku li hazirîya koma rêûresmê lê hatiye kirin ji hev cuda ne. Tiştêkî din ê girîng jî ew e ku li gor herêman xwarin diguherin.

**Xwarinên ku li malan tên çêkirin:** Şilikî (Mêrdîn), kutlik û şamboreg (Farqîn), pesare û dane (Dêrsim), serûpê (Êzidî).

**Xwarinên ku li mala hazirîya koma rêûresmê tên çêkirin:** Savara biqelî (Mêrdîn-Erxenî), zerfêt (Dêrsim) helaw (Qereyazî)

#### 2.2.6. Ala, Stran û Sirûdên Sersala Kurdan

Hin mîhrîcan he ne xwedî ala, stran û sirûdan in. Ala, sirûd, stran ne mecbûr in her sê jî he bin. Carinan ji bo mîhrîcanekî mînakekê tenê jî nabîne. Carinan jî her sê bi hev re tên dîtin. Ji bo mîhrîcana Sersalê ti ala û sirûd xuya nakin. Bes di nav Kurdên Êzidî de ji bo Cejna Batizmê -ku heman mîhrîcan e belkî jî binyad ew be û bi qewlê Smîth Kurdan jî wek paganên dibe ku nexwestibî dev ji vê rêûresma xwê berdin- helbesteke ku di vê mîhrîcanê de tê gotin he ye:

Batizmiya Pîrê Al  
Cejneke xweş û delal  
Jin û zarok, mêr û kal  
Wê pîroz dîkin her sal

Ew cejneke kevnar e  
Li gund û li bajar e  
Li zivîng û diyar e  
Şahî û dîlan li dar e

Ew cejna pîrê pîran  
Li çar enîşkê Kurdistan  
Govenda keç û xortan  
Her kes dibe wek biran

Yekşem cilşo û paqijî  
Pîrê Al tu her bijî  
Bi hiş û dil û mejî  
Dest pê dike dilxweşî

Duşem-sêşem du rojan  
Xêr û nanê miriyan  
Bo hejar û sêwiyan  
Toreya Ezdayiyan

Çarşemê pezguran e  
Li ser ser û çavan e  
Karê cejna ciwan e  
Xêr û xweşiya mala ne

Pêncşemê pîrozî ye  
Roja xal û xwarziya  
Ya ap û biraziya  
Ya dê û bav û sebiya

Zarok li malan digerin  
Bê xelat venagerin  
Bi kêf, bi bask û per in  
Rûgeş û dîlawer in

Şevronk êvara îne  
Her kes xwe dixemilîne  
Pîrê Al bi birtîne  
Hêviyan dinasîne

Înê xew û razan e  
Ji bo kal û ciwan e  
Bo xweza û însan e  
Rehetî û vehesan e

Şemî kar û xebat e  
Bo deborî lebat e  
Ji bo hemû malbat e  
Bawerî û qinyat e

Yekşema dawî sersal  
Li ser sera Pîrê Al  
Xwişk û bira û heval  
Em bi te bûne xweş (Tolan, 2006)

### 2.2.7. Bawerîyên Batil ên Sersala Kurdan

Di vê mîhrîcanê de em rast li bawerîyeke batil hatin. Li herêma Farqînê dema pîrek kutilkan çêdikin, biş-kokekê dixin nav kutlikekê û devê kutilkê digirin. Êvarê ew bişkok di kutilka kê de derkeve, dewleta wê malê li serê wî/wê ye.

### 3. Sersal û Bîra Hevpar

Wek mîhrîcaneke neteweyî, Mîhrîcana Sersalê di xwe de gellek kodên neteweyî dihewîne. Bi saya van kodan, çanda kal û bavan bi awayekî sistematîk tê veguhastin bo nifşên nû. Nifşên nû jî bi van kodan mezin dibin; xwebûna xwe nas dîkin, cudatîyên navbera xwe û netewe û komên din dibînin. Bi vî awayî xwe û yê ne ji xwe nas dîkin û dibe xwedî nasnameyekê. Ev nasname ji bîra hevpar a wî milletî, wê komê dermale dibe. Ev dermalebûn jî dibe sebeb ku di navbera çanda kolonyal û çanda dijkolonyal de gizegiz derkeve. William Fox, di gotara xwe ya "Derheqê Folklor û Fakelore Hin Hizirîn" de wiha dibêje: "Di navbera folklor û çanda kolonyal de gizegiz û têkilîyeke hevneqebûlkirî he ye. Û folklor jî bo çanda dijkolonyal hîmeke sereke û sengereke potansiyel a berxwedanê ye." (Fox, 2007)

Neteweya Kurd niha di bin nîrê çanda hegemonîk de li ber xwe dide; çand, mîhrîcan û kevne-şopîyên vê neteweyê jî li ber mirinê ne. Û mirina her remz, stran, rêûresm welhasil hîmên vê çandê dibin sedema çikîna bîra vê neteweyê. Û li ber neteweyên bêbîr jî talûkeya herî mezin jî, bicîbûna kevneşopîyên çêkirî ye. Îro Mîhrîcana Noelê, a ku bi pêlikeke çanda hegemonîk e û li ser serê Kurdan darê xwe dihejîne û



wek kevneşopîyek îcadkirî xwe li vî milletî ferz dike. Bavê Noelê cilsor, dikeve xewna zarokan ji dêvla Kose/Kalê Salê. Konsertên eraqvxwarinê bi cî dibin li dewsa govenda piştî şilîkî, kutilk û zerfetê.

Li vir nêrîna avakarê têgeha kenveşopîyên çêkirî Hobsbawm çirûskek e ji bo her milletê ku rûbirûyê van rewşan maye. Hobsbawm û Ranger di pirtûka xwe ya binavûdeng "The In-vention of Tradition" (*Kevneşopîyên Çêkirî*) de dibêje; "Hemû kevneşopîyên çêkirî ji bo ku raya gel îkna bikin û di nav koman de bi cî bibin; piştî xwe didin dîrokekê." (Hobsbawm 2006) Dema ku em Sersala Kurdan û Sersala Noelê berawird dikin dibînin ku kevneşopîya me ya bav û kalan ji ber ku ne xwedî armanceke hegemonîk e wek xwe maye û Sersala Noelê jî ji ber ku xwedî armanceke hegemonîk e li ser binkeya mîhrîcananê paganan kevneşopîyeke çêkirî ye.

## Encam

Mîhrîcana Sersalê hîn jî wek kevneşopîyekê di nav milletî de zindî ye. Bîreke tijîv e ev mîh-rîcan. Û Kurdên ku ruhê wan ê kurdayetîyê pûç nebûye sûd ji vê bîrê digirin lê Kurdên ku dûr ketine ji esl û fêslê xwe mîhrîcaneke neteweyên din wek ku ya wan e pîroz dikin. Ev kev-neşopîya çêkirî her ku diçe dikeve dewsa ya me ya resen û ava bîra me diçike. Hin sazî, dez-geh, şaredarîyan ev talûke ferq kirine û di nav hewldanan de ne ji bo vejandina vê mîhrîcan û vê kevneşopîyê. Lê lazim e ne tenê sazî, dezgeh û şaredarî vê tiştê bikin, divê her Kurd bibe bikereke/î çalak ê vê sengerê berxwedanê.

## Jêder û Çavkanîyên Nivîskî

- ANTER Musa (2000), Kovara Bîrnebûn hej:9, r 65-70
- CEFER Elî, (2006), Gotinên Pêşîyan (Zincîra ji berhemvaniya devkî a gelêrî 2) Weşanên Xanî, Çapa yekemîn, r 59
- CIZÎRÎ Melayê, (1987), Diwan, Weşanên Roja Nû, r 71-72, Stockholm
- DÎKEN Şeyhmus, Tîgrîs, Sersala Kurdan! (<http://www.tigrishaber.com/sersalakurdan-73yy.htm>)
- FOX, William, (2007), "Folklor ve Faklore Bazı Sosyolojik Düşünceler" (Yay. Hz. Selcan Gürçayır), Folklorun Sahesi: Faklore. Geleneksel Yay, Ankara
- GREEN Thomas A, (1997), Folklore An Encyclopedia of Beliefs, Customs, Tales, Music, r 296
- HOBBSAWM Eric-RANGER Terence, (2006), "The Invention of Tradition" (Gele-neşin îcadî, Çev. Mehmet Murat Şahin), Agora Kitaplığı
- İMİRĞİ Aysun, (2005), Festival Kavramı Üzerine Düşünceler, Millî Folklor Dergisi, hej. 65, r 29-36
- KAHRAMAN Metin, (2008), Khal Gaxan: Unutulmaya Yüz Tutmuş Bir Dersim Geleneği, (<http://metinkahraman.blogcu.com/khal-gagan-unutulmaya-yuz-tutmus-bir-dersim-gelenegi/2821887>)
- KEYDANİ Eşref, (2015), Hevpeyvîn bi Mistefa Buran re, Herêma Erxênî
- OMERÎ Saiihê, (2012), Serê Salê Binê Salê Xwedê Kurikî Bide Kevaniya Malê, (<http://www.dengekurdistan.nu/authors.aspx?an=1487&aid=22>)
- OXFORD DİCTIONARY, 6.th Edu. 431
- SMİTH, Robert Jerome, (1972), Dorson. R.M. Chicago & London: The University of Chicago Press. (Festîvaller ve Kutlamalar Çev. Sibel Keskin) r 159-173
- TOLAN Kemal, (2006), Giringiya Rojgirtinê û Hinek Cejnên Me Êzdiyan, (<http://www.pen-kurd.org/kurdi/kemal-tolan/giringiyarogjirtine.html>)
- ÜSKAN Dîjwar, (2016) Navên Mehan Di Salnameya Kurmancî De, Kovara Folklorê Kurdan, hej. 5, r 46
- XANÎ Ehmedê, Mem û Zîn, (Am. M.Emîn Bozarlan), Weşanên Deng, Çapa 2. r 224-225
- XERİBO Feremez, (2014), Batizmî Divê Kengî Bê Pîrozkirin, (<http://www.bahzani.net/kurdi/show.php?aid=2528>)

## Jêder û Çavkanîyên Devkî

- KARTAL İdrîs, (2016), Herêma Hezexê
- YAŞ Zeynep, (2016), Eynbaranê, Herêma Sêrtê

## Jêder û Çavkanîyên Dîmenî

- <https://www.youtube.com/watch?v=ajt9xzExpqk>
- <https://www.youtube.com/watch?v=m4LA1-7qOmo>
- <https://www.youtube.com/watch?v=7bpJaQ-LNgU>
- [https://www.youtube.com/watch?v=W\\_NsuSfxy5M](https://www.youtube.com/watch?v=W_NsuSfxy5M)



# Gulê Dêran

**Deşîfrasyona Notayên Kilamê:**

Necdet ERDAĞ

**Deşîfrasyona Gotinên Kilamê:**

Mahpûs SERHEDÎ,

Ridwan DÎZMAN

**Herêm:**

Mûş/Serhed

**Çavkanî:**

Şakiro (Qeyda kasêtê)

**Dem:**

04.04.2014

Erê dêran, were dêran dêran dêran  
 Dêran dêran dêran dêran hey wayêê...  
 Gulê dêranê Kejkê<sup>1</sup> wêran bişewite,  
 Zînêr re, wa li zînêr re hey wayêê...  
 Ava Corovanî kavil,  
 Delo Elo Girecini<sup>2</sup> wêran bi donzde  
 Tîşa bi ser da şax vedaye.  
 Îro ji êvar da hemî xar e, hemî mêr e, hey wayêê...  
 Min dî sê suwar, suwar bûne  
 Li Milazgira Tewra Jêrin<sup>3</sup>.  
 Suwarî pêşîn Esedê Xêlid e.  
 Suwarî selefî, suwar e Fetulla ye.  
 Suwarê li dawiyê dajo,  
 Çûyîn çûyîna Gêjo<sup>4</sup> ye.  
 Şêl î<sup>5</sup> pêla<sup>6</sup>, têl i reşka<sup>7</sup> Riza ye.  
 Sewta wî sewta kewî nêr e hey wayêê...  
 Hemzoyê Hesen bi sê denga ban dikir.  
 Go Rizakê ez bi qurban tu nizanî,  
 Kejkî ji berê di paş da,  
 Mexelê pezê me yî nêr e, hey wayêê...  
 Riza bi sê denga li Esedê Fetulla kire gazî.  
 Go em îro li ber koma Şewêşiyên bikîşîn.  
 Mistefayê Cizîr, Hesen Paşayê Eshed e neyar e.  
 Em ê sibê li Milazgira jêrin,  
 B'siv i caba<sup>8</sup> apê xwu<sup>9</sup> yê têl i reşkal Mistefayî kalemêr e.  
 Gere em irqa<sup>10</sup> Şewêşiya biqelînin,  
 Bukê ser bixêlî ser malê bava da vegeşînin.  
 Herkes ji xwu ra bi destê qîzê xwu bigre bide mêr e hey  
 wayêê...  
 A dêran dêran dêran dêran dêran  
 Dêrana Esedê Fetulla,  
 Riza her sê suwarê mala bavê xwu bi tenê me hêy bê hoy  
 oyy ayy axayy...

Lê lê Gulê Fatimê,  
 Rebenê sibe ye, Kejkê wêran bişewite,  
 Îro ji êvar da gelo vê sibengê malxirabo  
 Serejêr e wa serejêr e, hey wayêê...  
 Îro tu bala xwu bidê ji xwu ra berî li ba ye.  
 Axa Corovanî kavil,  
 Girecini<sup>1</sup> wêran Delo Elo tu sêr bike.  
 Bi donzde tîşa bi ser da şax vedaye.  
 Mi dî sê suwar, suwar bûne  
 Milazgira jêrin jêrê têne fenanî ba ye hey wayêê...  
 Suwarî pêşîn Esedê Xêlid e.  
 Suwarî selefî suwar e Fetulla ye.  
 Suwarê li dawiyê dajo  
 Çûyîn çûyîna Gêjo ye.  
 Şêl i pêla, tel i reşkal Riza ye reben ez'im.  
 Ebakî li nava mila ye, biskê ebê çartîlya,  
 Bi zêrê Ecem ji xwu ra tev kil daye.  
 Hemzoyê Hesen bi sê denga ban kirî.  
 Go Rizakê ez bi qurban tu nizanî,  
 Kejkî ji berê di paş da

**Berhevkar:**  
Fadil BOTAN

Mexelê pezê bavê bava ye hey wayêê...  
 Riza bi sé denga ban dikir Esed û Fetulla ye.  
 Go em îro bikişin li ber koma Şewêşiya ye.  
 Mistefayê Cizîr, Hesên Paşayê Eshed e,  
 Neyarê kal i bava ye, hey wayêê...  
 Em ê sibê li Milazgira jêrîn,  
 B'siv i caba apê xwu yê têt i reşkal Mistefa ye.  
 Gerê em irqa Şewêşiya biqelînin.  
 Bukê ser bixêlî ser malê bava da vegeerînin,  
 Herkes ji xwu ra bi destê qîzê xwu bigre,  
 Ji kêfê ra bidî mêra ye hey wayêê...  
 Ax dêran dêran dêran dêran dêran,  
 Ji bo her sé egîdê mala bavê xwu rebenê  
 heyy bibim dêran...

Erê Gulê Fatimê, rebenê,  
 Bira li me nehata sura sibê.  
 Bîna bayê keşî ji xwu ra  
 Bakî dîn e bakî dîn e hey wayêê...  
 Bira li bejna Esed û Fetulla, Riza  
 Her sé egîdê mala bavê min  
 Rebenaxwudê<sup>11</sup> ne kin e.  
 Reben ez im.  
 Mi dî sé suwar, suwar bûne  
 Li Milazgira Tewra Jêrîn e  
 Tu bala xwu bidê,  
 Suwarî pêşîn Esedê Xêlid e.  
 Suwarî selefî suwar e Fetulla ye.  
 Suwarê li dawiyê dajo  
 Çûyîn çûyîna Gêjo ye.  
 Şêl i pêla, têt i reşka Riza ye.  
 Gêjo kefê distînim hewandê xwu direşîne.  
 Tu bala xwu bidê kosteka siheta,  
 Zêr û zîv bi ser qaşa<sup>12</sup> zîne xwe da dihejîne hey wayêê...  
 Fenanî sé gurê xwu dayîne.  
 Tu bala xwu bidê, Hemzoyê Hesên  
 Bi sé denga li koma Şewêşiya kir qîrîne.  
 Em ê go Riza û Fetulla bikujin,  
 Esedê Xêlid dîl bigirin,  
 Bira ji dayê ra şewata sêlê bîne<sup>13</sup> hey wayêê...  
 Bûka malê serê xwu bilind kir ji xewa şîrîne.  
 Go metê marûmê eyb e,  
 Meriv mala xwu da xeyba mêrê camêr-nake.  
 Egîdê mala bavê min,  
 Bi dil û cigerê xwu guve nin.  
 Peyayê dayê ra şewata sêlê bîne ji wan peya nîh e  
 hey wayêê...  
 Metê marûmê peyayê mala bavê mi gulîbirê  
 Mêrê tu li meydana berdî şêr e xwu bidî diyara  
 Lê bikî guhdarî û sêr e.  
 Tu bala xwu bidê herçî hespê li meydana tene nava mala  
 Ez j'te ra sond bixwim zîne vala  
 Zengo bixûn<sup>14</sup> e hey wayêê...  
 Peyayê mala bavê mi gulîbirê

Xêncî xulama kuştin û peyayê bi nav i nîşan  
 Hesên û Huseyîn, Elî û Miheme  
 Herdo zavayê teze dîl girtine.  
 Daxistin Milazgira Tewra li jêrîn e, reben ez im.  
 Dengbêjê sibê bikin kilam û meqam  
 Li civatê mîran û hakima rûnên.  
 Êvara Xwudê da xwu ra li hevdu vegeerîne hey wayêê...  
 A dêran dêran dêran dêran dêran  
 Dêrana Esed û Fetulla,  
 Riza her sé suwarê mala bavê xwu bi tenê me  
 heyy bê hoyy oyoo ayy axayy...

Erê dêran, dêran dêran dêran dêran dêran dêran hey wayêê...  
 Gulê dêranê sibe ye.  
 Dilê mi gulîbira Xwudê,  
 Pira serê heft newala, a heft newala hey wayêê...  
 Ez ê bi destê her sé egîtê  
 Mala bavê xwu bigrim di ser ra derbas kim.  
 Fenanî sé kar î karxezala reben ez im.  
 Tu bala xwu bidê metê marûmê  
 Egîdê mala bavê mi navê xwu qeyd kirin  
 Li dosyayê hikûmetê derbas kirin nav dewala<sup>15</sup>.  
 Hela bala xwu bidê vê sibengê  
 Herçî hespê li meydana tene nava mala,  
 Ez j'te re sond bixwim  
 Zîne bê sibengê zengo bixûn e zîne vala hey wayêê...  
 Metê marûmê xêr ji xulama kuştin û peyayê  
 Bi nav i nîşan Hesên û Huseyîn, Elî û Mihemmed  
 Hemzo zavayê teze îro ji êvar da hildane.  
 Bêxê ber her çar mala hey wayêê...

A dêran dêran dêran dêran dêran  
 Hedê digo Gulê rebenê tu rabe em ê serê xwu kur kin.  
 Heft guzana<sup>16</sup> û donzdeh kêra.  
 Şeva cabkî neb'xêr hatiye dibêje li Kejikî wêran  
 Mala Emer mala Şewêş,  
 Li hev anîne qira şêran û mêra hewû û bê ho yo yo ay axayy...

<sup>1</sup> Kejik: Navê mexekekê ye ku ji bo vê, du eşîr şer dikin.

<sup>2</sup> Girecinî: Navê derekê ye.

<sup>3</sup> Tewra Jêrîn: Navê gundekî ye.

<sup>4</sup> Gêjo: Navê hêsp e.

<sup>5</sup> Li Serhedê carinan di şûna gihaneka "û"yê de "i" jî tê bikaranîn.

<sup>6</sup> Şêl i pêla: dirûv, timtêt

<sup>7</sup> Têt i reşkal: kesê emrê wî di destpêka kalbûnê de ye.

<sup>8</sup> B'siv i caba: Bersiv û cab. Ev der ji hêla Şakiro ve  
 ji bo lihevaniyê pir zû hatiye gotin.

<sup>9</sup> Xwu: Xwe

<sup>10</sup> Irq: Qir

<sup>11</sup> Xwudê: Xwedê

<sup>12</sup> Qaş: Beşeke zîne hespan. Li pêş e.

<sup>13</sup> Bira ji dayê ra şewata sêlê bîne: Ev qalib ji bo biçûkkirina kesan tèn bikaranîn.






Ango dixwazin Esedê Xêlid, ji bo dêya wan sergînan bîne.

<sup>14</sup> Bixûn: Bixwîn

<sup>15</sup> Dewal: Dewlet

<sup>16</sup> Guzan: Kêra kurkirinê.

# Gulê Dêran



hem zo yê he sen bi sê den ga ban di ki r go ri za kê ez bi qur ban tu ni za nî ke jik ji berê di paş da

16

me xe lê pe zê me yî nêr e hey wa yê \_\_\_\_\_ ri za

bi sê denga lie se dê fe tul la ki re gazî go e mî ro \_\_\_\_\_ li ber ko

ma şe wê şî yan bi ki şîn Mis te fa yê Ci zîr He sen paşa yê es he de \_\_\_\_\_ ne ya re

19

e mê si bê'l Mi laz gi ra jê rîn bi bin ba apê xwe yê tê lî reş kal Mis ta fa yî ka le

21

mê re ga re emir ga şe wê şî ya bi qe lî nin bu kê ser bi xê lî ser ma lê ba va da ve ge rî nin

her kes ji xwu ra bi des tê qî zê xwu bi gre \_\_\_\_\_ bi de mêre hey wa yê \_\_\_\_\_ a dê ran

dê ran dê ran dê ran dê ran dê ra ne e se dê fetul la ri za her sê su wa rê ma la ba vê

26

xwe bi xû me he oy \_\_\_\_\_ bê \_\_\_\_\_ hoy oy oy \_\_\_\_\_

# Islahkirina Gurê Hov

Berhevkar:  
Sidîq GORÎCAN

Mirovek hebîye ku gelekî ehlê qencî û xêrxwazîyê biye. Rojekê, radibe kerê xwe bar dike û derdikevite rêdarîyekê. Di rêdarîtîyê da gava dem dibite dana nimêje, kerê xwe serbest berdide ku biçêri û ew jî nimêja xwe bike. Piştê destnimêjgirtinê, nîyeta xwe diîne û dibêje Allahû ekber û dest bi nimêja xwe dike...


Paşî, li ser nimêjê, camêr dibîni ku gurekî boz kilbên xwe tîj kirine û jê ve tê, û nîyet pê kirîye ku êrîşê kerê mêrikî bike. Mêrik jî naxwazi nimêja xwe xira bike û li pey çareserîyêkê bigeri. Hema li ser nimêjê, bi dilekî samîmî di nava xwe da dua dike û dibêji; "ya Rebbî, tu vî gurê hov islah bikî!"

B'emrê Xwedê, herdu çehvê gur ji qalikên xwe dirêjin û gur kor dibi û êdî tiştêkî nabîni, û loma jî nikari tu zerarê bidete mêrik û kerê wî. Hema dibite nûzenûza gurê kor û vî alî û wî alîyê ve dibezi û diçî û tê, û heta ku bi devî û dirîkan dikevi, xwe bi kuç û keviran dide, gêj û birîndar dibi, û di axirîyê da dibeici û diperiti, û paşî jî dikevite çalekî da û tê da dimirii.

Piştê vî qasê ha, camêr b'zêde heyîrî dimîni û xwe b'xwe pirs dike; "ya Rebbî, mi dua kir û xwest ku tu gurê islah bikî, lê belê te her du çehvê wî kor kirin û gur mir û çû. Nizanim, ev çi hikmet e? Lê dîsa jî yeqîn te heye hikmetey, ku ji fehmedarîya me dûr e".

Axir, êvar tê û ev camêr radizê. Gava ku dikevite xeweka kûûûr, Xweda tê xewna wî. Camêr di xewna xwe da jî eynê ecêbmayîn û pirsra xwe bi ewayekî hurmetî ji Xwedê ra dibêji. Xwedê jî wiha dibêjîtê: "Islahkirina gurê har û hov encax çehvkorkirina wî ye."

Çavkanî: Ayhan ALKIŞ  
Temen: 43  
Perwerdehî: Xwende  
Herêm: Tetwan/Bidîs  
Dem: 25.12.2015



# Rûpeleke Dîroka Windabûyî Serhildana Xanê Kelmîşî

Kurdên di serdema Osmaniyan de, li Bakurê Kurdistanê ku di salên 1590'î de li dora Meletî, Semsûr û Dêrsimê dijîyan rastî zextên du împeratoriyan mezin ên herêmê hatin. Gor peymanê Stenbolê ya di navbera van her du hêzan de di sala 1590'an de pêk hatî, ew rastî koçberiya bi dare zorê hatin. Gorî wê peymanê, Kurdên bûne serêşa herdu hêzan, gerek bihatana ajotin li Weraminê (Tehrana îro û taxa Azerbeycan)

Pêşiyên me digotin: "Heger hûn nebin yek ew ê bixwin yek bi yek!" Ew bûyera ku hûn bixwinin jî dişibe vê gotina pêşiyên. Ew bûyereke qehremaniya hatiye jibîrkirin e. Kurdên ji welatê xwe qetiyane gelêk caran serhildan. Kirine lê ji hev cuda, dûr, qetiyayî û bêyekîtî bûne. Ji bo wê jî ji alî dijmin ve yek û yek hatine pelçiqandin. Serhildana Xanê Kelmîşî jî yek ji wana ye.

Kurdên di serdema Osmaniyan de, li Bakurê Kurdistanê ku di salên 1590'î de li dora Meletî, Semsûr û Dêrsimê dijîyan rastî zextên du împeratoriyan mezin ên herêmê hatin. Gor peymanê Stenbolê ya di navbera van her du hêzan de di sala 1590'an de pêk hatî, ew rastî koçberiya bi dare zorê hatin. Gorî wê peymanê, Kurdên bûne serêşa herdu hêzan, gerek bi-

Şoreş REŞÎ



hatana ajotin li Weramînê (Tehrana îro û taxa Azerbeycan)! Lê armanca Şahê fêlbaz cuda bû. Di destpêkê de digot: "Ez ê we li Weramînê bi cîh bikim." Lê piştî du salan zor da wan Kurdan ku herin Xorasanê. Xorasan wê demê di bin êrîşên Turkmen, Qazak û Afganên de bû û Şah dixwest van Kurdana wek mertalên tixûbên Îranê bi kar bînin û kir ji. Kurdan gelek berdêlên mezin dan û ew ax ji Turkmen û hêzên din paqij kirin û bi cîh bûn. Lê hinek ji wan yekser bi cîh nebûn, koçber jiyan û bi hêviya vegera welêt; bê erd li navberê man.

Ji êla Milan malbata Kelmişî bê erd, bê çare dimîne û dixwaze niştecih bibe. Di sala 1846'an de ew di dawiyê hewildanên xwe de 50 km li rojhilatê bajarê Sebziwarê û di navbera vî bajarî û Nişabûrê de, ji Tirkên Sultanabat ê gundê Sûzen Dêh dikirin û bi cîh dibin. Gundekî di navbera çiya û zozanan de ye. Li derdora Sultanabad û bakurê Sebziwarê ji xwe re gundên din jî ava dikin û lê rûdinin.

Ew heta sala 1946'an di nava aşitî û aramiyê de jiyan. Lê dema şerê cîhanê yê duyemîn derket, vî şerî bandoreke neyînî li hemû cîhanê kir û di nava xelkê herêmê de jî feqîrî, hêjarî û belengazî zêde bû. Gelên cîhanê li gelêk cîhan nanê tîsî jî nedidît. Gorî van zor û zehmetiyan jî pergala zil-imkar û axayên herêmî wê yekê nizanin û hîn zêde dixwazin barên li ser milên wan zêdetir bikin. Cendirme herroj êrîşên gundan dikin, dest davêjin keç û jinên xelk, mal û heviya wan didizin û dixwazin pariyên di devê xelk de ne ji derxin. Lê wana hesaba Kurdên ku zilim û bindestiyê qebûl nakin, nekiribûn. Bi ser bûyereka dest avêtina jinan de, malbata Kelmişî du leşkerên dewletê dikûjin û bi ser vê yekê li dij dewletê serî hildidin û hildikişin çiyên. Di nava xelkê li Xorasanê de ew wek "Serhildana Xanê Kelmişî" tê binavkirin. Nivîskar Mehîmûd Dewlet Abadî ew bûyer kiriye naveroka romana xwe ya bi navê "Kilîder"<sup>1</sup> li cîhanê bi vî navî jî deng da û ew kiriye malê hemû mirovahiyê.

Serhildan di sala 1945'an de bi pêşengiya malbata Kelmiş (Elîcan, Gul Muhemmed, Beg Muhemmed, Xan Muhemmed û apê wan Muhemmed Xan) û 10-15 kesên din ên jî elên curbicur ku tevî wan bûbûn dest pê dike. Serhildan li dora çiyayê Kilîder û zozana Topera (Tîrê û Ewlad) bi pêş dikeve û heta bihara sala 1948'an berdewam kir. Lê wê biharê bi destê xayîn û dostekî wan, Şah bi hêzeke mezin, wana di cîhekî xirab de digire û dorpêç dike. Gul Muhammed ji hevalên xwe re dibêje: "Hûn herin!" Û bi zorê wana ji xwe bi dûr dixwe. Ew, birayên wî û apê wî Muhammed bi jin û zarokên xwe ve di nava çemberê de bi dijmin re heta dawiyê şer dikin. Êvarê birayê wan ê biçûk Xan Muhammed di tarîtiya şevê de direve û diçe Iraqê. Gul Muhemmed û birayê wî heta guleyên xwe yê dawî şer dikin û şehîd dikevin.

Birayê wan ê ku reviyaye Iraqê piştî şeş-heft mehan vedigere, hevalên xwe yê berê kom dike û pêşî xayîneku bi dewletê re hevkarî kiribû dikûjin. Piştê bi dewletê re heta sala 1955'an şer dike û di wan şeran de gelek eskerên Îranê dikûjin. Di sala 1955'an de bavê Xan diçe cem Şah û fermana wî ya azadiyê hildigire.

Diya Gul Muhemmed Gulîstana dilşewitî diçe çiya û zozanan û li kurên xwe digere û wiha distirê:

Kilîdarê elêlo Xancano, bi dar gûzê  
Gullan tê da elêlo Xancano, wîze wîzê  
Xatirê te elêlo Xancano, pir ezîzê  
Lo Xanê Kelmişî, elêlo Xancano, fikra me bikşî

Fikir nekşîni elêlo Xancano, tîn ser me qûşîn<sup>2</sup>-esker/Heta siwe pîşîn-nîvro elêlo Xancano, te ser me qûşîn

Ez dayika te elêlo Xancano, Gulistan im  
Li nav çiyên elêlo Xancano, sergizdan<sup>3</sup> im  
Te nabînim elêlo Xancano, dilbijan im  
Lo xanê Kelmişî, elêlo Xancano, fikra me bikşî

Fikr nekşîni elêlo Xancano, tîn ser me qûşîn/Heta siwe pîşîn elêlo Xancano, tîn ser me qûşîn



Hespê reşê, elêlo Xancano, hîre hîre  
 Li dest duşmen elêlo Xancano, ew hesîr e  
 Derdê wî elêlo Xancano nawê ji bîre  
 Lo xanê Kelmişî, elêlo Xancano, fikra me bikşî

Fikr nekşînî elêlo Xancano, tê ser me qûşîn/Heta siwe pîşîn elêlo Xancano, tê ser me qûşîn

Ev stran li ser zimanê xelk belav dibe û di her civakê de tê gotin. Xelk jî ji wan qehremanên xwe re hinek sêbendî li hev anîne û bi vî awayî stran zêde bûn û ketin nava dilê xelk:

Ez têrek<sup>4</sup> im, bal<sup>5</sup> tunî ne  
 Min tu ap û xal tunî ne  
 Min bira û mal tunî ne

Emniye<sup>6</sup> hat hezar hezar  
 Bilûç<sup>7</sup> hatin qetar qetar  
 Pir namerd in, merdumazar

Bê xwedî ma hespê reşe  
 Xwîn digirî canya beşe  
 Le<sup>8</sup> nav bînan nema refşe

Xang û daykê te bimirin  
 Nikarin xwînê te hilgirin  
 Bira<sup>9</sup> guliyê xwe bibirrin

Rawe hespê reş tu zîn ke  
 Çol û çiyân bira pîn bike  
 We nav malê duşmen<sup>10</sup> şîn ke

Je<sup>11</sup> derdê te xemgîn im  
 Meytê weynin<sup>12</sup> ta biwînim  
 Qesasê wê ez bistînim

Siyaran je ku bînim  
 Tufangê te ez hilînim  
 Je wan xwînê te bistînim

Konan têxinîm, ez ar dekim  
 Je vî yûrda ez bardekim  
 Ez vî derdî hiç hal nakim<sup>13</sup>

Hespê te çer bêxwedî bû  
 Gullê le te ket, karî bû  
 Meyta te yê serdarî bû

Hespê te şêhe dekşînê  
 Çav li rêyan degerînê  
 Nîşan je te ew nawînê

Hespê reşê hîre hîre  
 We dest duşmen ew hêsîr e  
 Va derda nawê<sup>14</sup> ji bîre

<sup>1</sup> Kilîder: Navê çiya û erdeke li Nisawirê, ku çiyê zozanên koçeran e

<sup>2</sup> Qûşîn: Gulle

<sup>3</sup> Sergizdan: Perîşan, xemgîn im.

<sup>4</sup> Têrek: Teyrek

<sup>5</sup> Bal: Bask

<sup>6</sup> Emniye: Leşker, emniyet

<sup>7</sup> Bilûç: Belûc

<sup>8</sup> Le: Li

<sup>9</sup> Bira: Bila

<sup>10</sup> Duşmen: Dijmin

<sup>11</sup> Je: Ji

<sup>12</sup> Weynin: Werînin, bînin

<sup>13</sup> Hal nakim: Debar nakim, tab nakim, sebir nakim

<sup>14</sup> Nawê: Nabe





# MEBÊJE HEYWAN E, BÊZAR Û ZIMAN E\*

## ► **Banga Mêşan**

Dibêjin, wextê însan ji mêşan aciz dibin, wan diqewitînin û ji wan yek tê kuştin, ew jî deng li heval û hogirên xwe dikin û hewara xwe di-gihînin wan û dibêjin:

- Werine bi hişt, nîvmêran mêrekî me kuşt!

## ► **Derewa Kermêşê**

Rojekê, li derva tofan rabûye, ba weka guran di zûre û çî dikeve ber wî bi xwe ra dibe, camêrek mêze dike, wa ye kermêşekê di wê firtûnê da, bi darekê girtîye. Mêrik radibe jê dipirse û dibêje:

- Ev te xêr e, te di vê firtûnê da wisa bi wê darê girtîye?

Kermêş lê vedigerîne û dibêje:

- Ma tu nabinî? Min bi darê girtîye ku dar ne-keve!

## ► **Wesîyeta Bavê Guran**

Guran pirr anîye serê kesên xwedî pez. Gur wextê li pez dixin, dilê xwe lê rehet dikin. Heger nexwin jî pirranîya pez li erdê radixin. Ên berê gotine; "bavê guran wextê wesîyet li wan kirîye ji wan ra gotîye:

- Wextê we avêt ser pez, heta çilî wesîyeta

min'e, ji çilî jortir jî mêranîya we ye."

## ► **Hewara Mirîşkê**

Mirîşk, berî ku hêk bike dike qireqir, dibêje:

- Wa ye hêka min tê!

Rebenê gellek çaran hêk zor dide qûnê û jan didê ji bo wê jî dike qireqir. Piştî ku hêka xwe dike dîsa dike qireqir, dibêjin ev qireqir hewara wê ye, wextê çav bi hêka xwe dixê dibêje:

- Hey lo hewarê, min hêkek anîye, bê dest û pê ye!

## ► **Motika Mirîşkê**

Mirîşka bêmotik, kor e. Heger motika mirîşkê ji çiyê wê bê hilanîn, kul û derd li dilê wê dik-evin, nizane hêka xwe li kû bike. Dibêjin mirîşkê li ser motika xwe gotîye:

- Heger hûn motika min hilînin, weka ku hûn çavên min derînin.

## ► **Derdê Dêlegurê**

Dibêjin dilê dêleguran tijî ye. Rojekê têjikekî guran ji dîya xwe dipirse û dibêje:

- Dayê çima hevalên te pirr têjikan derdixin, tu tenê du heban derdixî?

\* Min ev mesele ji Licê û Pasûrê berhev kirine.



Dêlegur weka ku yek pê li birîna dilê wê bike, keserekê dikişîne û ji têjika xwe ra dibêje:

- Ax! Te bi xiltê nava dilê dîya xwe bizanîya çî tê da ye.

Dilê wê ewqas tijî ye ku ancax du têjik tê da hiltên.

### ► Nifira Kewê

Heywanên firinde li gorî hukmê hewayê hêkên xwe dikin. Heger hesabê xwe şaş bikin, keda wan berhewa dibe. Dibêjin kewê, heftê nîsanê ji xwe ra kirîye nîşan û gotîye:

- Heger heta heftê nîsanê, min heft hêk nekirin, bila heft ecêbên giran bên serê min.

### ► Karsa Çilziman

Kars bi çil zimanan dizane. Bi zarê gellek tiştan diçe. Wextê tê li perê gundan vedinişe û dest bi xeberdanê dike, xelk dibêje:

- Karsê înzallah, te xebera xêrê anîye.

Dibêjin kars ji bo ku guhdarîya koçeran bike diçe li ser gûnîyê vedinişe, strîyên gûnîyê di canê wê ra derin û di xew ra nare. Bi vî awayî

guh daye koçeran û hînê zimanê wan û gellek zimanên tebyan bûye.

### ► Hewara Spîyan

Wextekî, spî dibin bela serê yekî. Mêrik dike nake ji wan xilas nabe. Yekî biaqil radibe jê ra dibêje:

- Here serê xwe rûn bike, agirekî dade, serê xwe xwar bike û porrê xwe biguvêşe, dê spî bişemitin û bikevin nava wî agirî.

Mêrik radibe wilo dike, spî mêze dikin ku mêrik nîyet li wan xirab kirîye û îş zor e. Mezinê wan bi tayekî serê mêrik digire û deng li spîyên din dike û dibêje:


- Law bi xwe bigirin! Kî şemitî ew şewitî!

### ► Hêsirên Pepûkê

Dibêjin pepûka reben, piştî ku birayê xwe kuştîye, hêsirên çavên wê qet nesekinîne, her tim hatine bi xwar da. Pepûkê ji ber ku fera xwe wenda kirîye û tim tû tim li dû birayê xwe ye, wextê diçe ser darekê, dixwîne û digirî, hêsirên wê li çî bikevin, ew tişt fer be dibe cot. Gellek caran ew hêsir li şaxên daran dikevin, lewma şax bi hev va dizeliqin.



Amadekar:  
Yasemin ELBAN



## HESO Û BESO

Carek ji çaran, rehmêt xêr û xweşî bibare li ser hazir û guhdêran, bi tevî sêwî û bêmalan, ji xeynî papaxgeniyan. Dibêjin, di dewir û zemanekî de, du destebirayên bi dil û can hebûne. Navê yekî Heso û navê yekî jî Beso bûye. Herdu destebira qewlê xwe dikin yek, ji bo debara xwe, diçine bajarê Stenbolê û li ser avahiyan dixebitin.

Mehek, du meh di ser de derbas dibe. Rojekê ji rojên betlaneyê herdu bi hev re diçin nav bajêr, kolan bi kolan, kuçe bi kuçe digerin. Di kuncika kuçeyekê de rastî xaniyekî mezin û deriyên wî heya dawîyê vekirî tîn.

Heso dibêje:

- Kuro Beso! Deriyên xênî heya dawî vekirî ne. Were em lê binêrin ka di hundirê xênî de çi heye çi tune ye!

Herdu bi hev re dikevin hundir, dibînin ku nav xênî kesek tune ye û li wir gelek kanî hene. Ji henek<sup>1</sup> kaniyan ava sar û ji henekan jî ava germ

diherike.

Beso dibêje:

- Kuro Heso îro Xwedê daye me. Ev du meh e ku me ser û kincên xwe neşûştine. Were em têr serê xwe bişon.

Heso û Beso kincên xwe derdixin. Ser û guhên xwe pak û paqij dişon. Bi dûv re kinc û libasên xwe dişon, ziwa dikin. Piştî kincên xwe wedigirin, dikin ku biçin... Hew dibînin ku mêrikekî li pêş wan derdikeve û dibêje:

- Sehet be ji we re. We têr serê xwe şûşt. De êca buhayê wê bidin.

Heso dibêje:

-Bihayê çi, halê çi?

Mêrik dibêje:

-We bi tonan av li serê xwe kir û di ser de jî we kincên xwe şûştin. Ma hûn dibêjin qey av herwe<sup>2</sup> ye?

Heso û Beso şaşûmato li hevdu dinêrin, ji ber ku av li gundê wan herwe bû. Bi wan pir zor tê ku mêrik buhayê avê dixwaze.

Heso dibêje:

- Kuro, Beso!

Beso dibêje:

- Lebê...

Heso dibêje:

- Pereyê camêrî bidê.

Beso, bi sewt û awaz dibêje:

- Lo lo looo, lo lo looo, lo lo looo.

Mêrik hêrs dibe û dibêje:

-Heyran hûn mecbur in, buhayê serşoya xwe bidin.

Heso dîsa li Beso vedigere û dibêje:

-Kuro Beso!

Beso dibêje:

- Lebê.

Heso dibêje:

- Kuro, tu çira perê mêrikî nadê?

Beso dibêje:

- Kuro, ez didimê, lê ew nagire!

Mêrik dêna xwe didê, ku ew ê nekare tu tişt bi serê wan bixe. Dibêje:

- Werin em herine li ba Qazî, bila Qazî vê dozê safî bike.

Hersê bi dû hev dikevîn û diçin. Kêm diçin zêde diçin. Di rê de rastî bilûrvanekî tên.

Bilûrvan li wan vedigere û dibêje:

- Uxur<sup>3</sup> be ji we re, xêr e, we daye pê hev, hûn bi ku ve diçin?

Xwediyê hemamê dibêje:

- Tebayê uxurê be. Qet pirs neke, ev herdu mêrik hatine li hemama min, serê xwe şûştin û veşûştin, lê bihayê serşoya xwe nadin. Ez jî wan dibim li ba Qazî, bila ew vê dozê safî bike.

Bilûrvan li Heso û Beso vedigere û dibêje:

- Bira hûn çima perê vî camêrî nadinê?

Heso dibêje:

-Welle em didinê, lê ew nagire.

Bilûrvan dibêje:

- Çawan nagire, de ka careke din jî bidinê dê negire?

Heso li Beso vedigere û dibêje:

-Kuro Beso, perê mêrikî bidê!

Beso destê xwe dixwe qulêlka guhê xwe û bi sewtekê bilind dibêje:

- Lo lo looo, lo lo looo, lo lo looo.

Ev newa pir bi bilûrvan xweş tê. Hema bi zûzûka ew jî bilûra xwe derdixe û li gor newayê li bilûra xwe dixwe û dibêje:

- Tû lû lûû, tû lû lûû, tû lû lûû.

Bilûrvan xwe bi xwe de dibêje; "ez ê jî bi wan re herim, da ku ez bêtir hînî vê newayê bibim." Bilûrvan jî dide dû wan û diçin.

Bi qasekî dimeşin, vê carê rastî daholvanekî tên. Deholvan silav dide wan û dibêje:

- Xêr e? We daye li pê hevdu, hûn bi kû ve diçin?

Hemamvan dibêje:

- Xêra çî, halê çî? Ev herdu mirov hatine li hemama min têr serê xwe şûştin û bihayê serşoya xwe nadin min, ez jî wan dibim li ba Qazî.

Daholvan li Heso û Beso dinêre û dibêje:

- Kuro ma camêrî ev e? Hûn çima perê vî camêrî nadinê?

Heso dibêje:

-Welle em didinê, lê ew nagire!

Daholvan şaş dimîne û dibêje:

- Çawa hûn didinê, ew nagire? Ka careke din jî bidinê, dê ew negire?

Heso dibêje:

- Beso, deynê mêrik bidê.

Beso destê xwe dixwe qulêlka guhê xwe û çiqas sewta wî heye diqîre:

- Lo lo looo, lo lo looo, lo lo looo.

Hema bilûrvan bi lez û bez li bilûra xwe dixwe û dibêje:

-Tû lû lûû, tû lû lûû, tû lû lûû.

Ev newa bi daholvan jî pir xweş tê, hema ew jî li deholva xwe dixwe û dibêje:

-Dim dim, dim, dim dim, dim dim.

Deholvan jî weke bilûrvan difikire û dibêje; "ez ê jî bi wan re herim, da ku ez baş hînî vê newayê bibim û di dewetan de lêxim." Deholvan jî dide li pêy wan û diçin, diçin digêjine li ba Qazî.

Qazî dêna xwe didê ku wê daholvanek, bilûrvanek û sê mêrik li pêş wî ne, bi meraq li wan dinêre û dibêje:

- De bêjin ka derdê we çî ye?

Hemamvan dibêje:

-Îro ev herdu mêrik, hatin li hemama min, serê xwe û kincên têr şûştin û bihayê serşoya xwe naşin. Min jî ew anîn li hafa we ku hûn vê dozê safî bikin.

Qazî li Heso û Beso vedigere û dibêje:

-Kuro hûn bi çi sedemê perê mêrikî nadinê?

Heso dibêje:

-Qazî Efendî, em didinê lê ew nagire.

Qazî dibêje:

- De ka careke din jî bidinê, ew çawa nagire?

Heso li Beso vedigere û dibêje:

-Beso, perê mêrikê bidê.

Beso bi wezin û awaz dibêje:

-Lo lo looo, lo lo looo, lo lo looo.

Hema bi lez bilûrvan li bilûra xwe dixê û dibêje:

-Tû lû lûû, tû lû tû lûû, tû lû tû lûûû.

Hema bi pê re daholvana li dahola xwe dixê û dibêje:

-Dim dim dim, dim dim dim, dim dim dim.

Ev awaz pir bi Qazî jî xweş tê, ew jî herdu destên xwe radike jor û dest bi reqasê dike û dibêje:

- Tî lî lîî, tî lî lîîî, tî lîîî.

Qazî li hemamvanî vedigere û dibêje:

- Heree! Kurê kerêê! Ji vê xweştir çi heye, ma êdî te çi divê?

**Çavkanî:** Xalê Evdila ADAR

**Perwerdehî:** Nexwende


**Herêm:** Tetwan/Bidlîs

**Dem:** 2009

<sup>1</sup> Henek: Hinek

<sup>2</sup> Herwe: Belaş, bêbuha

<sup>3</sup> Uxur: Oxir



# HIN DUA JI MESKETANKÊ

1. Tu.bikevî ber sîngê pêxemberan
2. Tu ji nan û dew nekevî
3. Xwedê te'bihêle
4. Çengê pêxemberan li ser te be
5. Kûpên zêran li ber te bin
6. Tengasiyên te bibin firaqetî
7. Duayên Xewzê Hîzan li pey te bin
8. Tu amanetî Xwedê bî
9. Tu nanê xwe ji jariyê neşikênî
10. Lalawo tu bibî bavê heft kuran
11. Destê Xizir li ser te be
12. Duayên Xwedê li pey te bin
13. Xizir bê hawara te
14. Nanê rehet bixwî
15. Tu jarî û jûriyê<sup>(1)</sup> nebînî
16. Lawo hemû derî li ber te vebin
17. Şêx Evdilqadirê Geylanî te biparêze
18. Tu nekî Xwedê bide te
19. Şiva Xizir Eleyhîselam sêr serê te be
20. Şahê Nexşebend te bibîhîze
21. Xwedê rozgareke<sup>(2)</sup> baş bide te
22. Nanê te çandî be kevçiyê te tê de be
23. Mîr Hesenê Welî te bibexşîne
24. Destê Şêx Gulê li ser te be
25. Ocaxa bavê Şêx Sano bê hawara te
26. Ceddê bavê Gula Şêx bê alî te
27. Erdê Mekmedînê warê te be
28. Şêx Seydayê ber derê beytê hevalê te be
29. Nifirên min ji te re bibin dua
30. Duayê vê tizbiyê li pey te be
31. Şîre min li te helal be
32. Xwedê bextêkî spî bide te

33. Tu cinnetê bibînî
34. Ziyareta Zêvê li rûyê te bikene
35. Xwedê tu derd û dermanî neke para te
36. Destê ewliyayan li piştê te be
37. Xwedê te di nivê rê de nehêle
38. Tu di vê dinê de tu axiniyê nekişînî
39. Mala te ava ocaxa te şên be
40. Tu cînarê Mûsa Pêxember bî
41. Weysel Qeranî destê xwe bigîhîne te
42. Tu delavê<sup>(3)</sup> teng de nemînî
43. Destê te vekirî zikê te têr be
44. Xwedê cansaxiyê bide te
45. Rebbî mirazkê te bike
46. Kevirê li ber lingê te bibe penêr
47. Xwedêteala te ji nifaq û teşqeleyan biparêze
48. Oxira te ya xêrê be
49. Tu heyre<sup>(4)</sup> nemînî
50. Pêk<sup>(5)</sup>, du, sê gazî Gorandeyştê<sup>(6)</sup> dikim tu tengasiyê nebînî
51. Qeza û bela dûrî te bin
52. Xwedê destê te ve bîne
53. Çiray

[1] Jûrî: Zehmetî, dijwarî

[2] Rozgar: Bext, miraz

[3] Delav: Ciyê ku çem tê

re nizm diheriçe ku mirov

û heywan dikarin ji avê

derbasî aliyê din bibin


[4] Heyr: Neçarî, bêçaretî

[5] Pêk: Pêyek

[6] Gorandeyşt: Gundekî

navçeya Şaxê ya Wanê ye.

Berhevkar:  
Asmîn ÛYANIK



## ROVÎ Û PÎRÊ

Hebû tune bû... Ji Xwedê mezintir kes tune bû...  
Hebû jineke pîr û du heb bizinê wê. Pîrê bizina di-  
doşt û şîrê wan dimeyand û dikir mast û di pey re  
mast dikir dewkulê û dikulla.

Rojekê pîrê dîsa bizinê xwe didoşe û di dîzikê de  
dimeyîne dike bine melkevê. Serê sibê radibe diçe  
dewkula xwe û kodika xwe û heska xwe tîne ku  
dewê xwe pê veke, dibîne ku dîzika mastê wê pa-  
qijkirî ye. Dibêje; "ya Rebbî kê mastê min xwa-  
riye?"

Roja din jî dîsa mastê xwe dimeyîne dike binê  
melkevê serê sibê diçe ku mastê xwe bîne dibîne  
ku dîsa dîzika wê paqijkirî ye.

Roja sisiya dibêje; "ez ê li virê xwe veşêrim ev kî  
ye, tê mastê min dixwe?" Melkeva pîrê li eywanê  
ye, tê xwe dike piştê derê eywanê, rûdinê, dasa  
daran dike destê xwe, şev kerr dibe carekî dibîne  
derî dibe çîzzz vebû roví hat serê xwe kir binê mel-

kevê ket ser dîzika mast û dibe çelpa û çelpa wî.  
Pîrê jî dibêje; "himhaaa!" Û dasê lê dixwe û qemça  
wî ji binê de jê dike. Rovî direve û qemçika wî li wir  
dimîne. Pîrê tîne qemçika wî bi gulî û morîkan di-  
xemilîne û li oda xwe dadileqîne.

Rovî çû nav heval û hogirê xwe, Gotin:

- Hîîî!! Qolo qutoz me rî li poz!

Rovî hat go pîrê:

- Çika qemçika min bide min, ez diçim nava heval  
û hogirê xwe dibên; "qolo qutoz me rî li poz!"

Pîrê dibê:

- Here şîrê min bîne, ez ê qemçika te bidim. Qem-  
çika te li mal e, min xemilandîye jî.

Rovî diçe dibêje:

-Bizin bizin!

Bide min şîr

Şîr bidim pîr

Pîr bide min dûvika min

Diçim nav heval û hogirê xwe ji min re dibên;



"Qolo qutoz me rî li poz!"

Bizinê go:

-Here ji min re çilo bîne ez çilo têr bixwim ez ê şîr bidim te.

Rovî çû go:

- Dar dar!!

Bide min zihar

Zihar bidim bizin

Bizin bide min şîr

Şîr bidim pîr

Pîr bide min dûvika min

Diçim nav heval û hogirê xwe ji min re dibên;

"Qolo qutoz me rî li poz!"

Darê go:

- Here dasê bîne ku tu pê biçinî.

Rovî çû ba Hedad go:

- Hedad, hedad!

Bide min das

Das bidim dar

Dar bide min zihar

Zihar bidim bizin

Bizin bide min şîr

Şîr bidim pîr

Pîr bide min dûvika min

Diçim nav heval û hogirê xwe ji min re dibên;

"Qolo qutoz me rî li poz!"

Hedad go here ji min re hêka bîne ez belaş nadim.

Rovî çû go:

- Tûtik, tûtik!

Bide min hêk

Hêk bidim Hedad

Hedad bide min das

Das bidim dar

Dar bide min zihar

Zihar bidim bizin

Bizin bide min şîr

Şîr bidim pîr

Pîr bide min dûvika min

Diçim nav heval û hogirê xwe ji min re dibên;

"Qolo qutoz me rî li poz!"

Tûtikê go:

-Here ji min re tene<sup>1</sup> bîne ez tene têr bixwim ez ê hêka bikim.

Rovî çû ba kewarê go:

-Kewar, kewar!

Bide min tene

Tene bidim tûtik

Tûtik bide min hêk

Hêk bidim Hedad

Hedad bide min das

Das bidim dar

Dar bide min zihar

Zihar bidim bizin

Bizin bide min şîr

Şîr bidim pîr

Pîr bide min dûvika min

Diçim nav heval û hogirê xwe ji min re dibên;

"Qolo qutoz me rî li poz!"

Kewarê go:

- Ez devê kulfikê<sup>2</sup> vekim ê genim birije, here hinek rêxê bîne ku li devê kulfikê bixî û devê kewarê bigirî.

Rovî çû ba ga, go:

-Ga, ga!

Bide min rêx

Rêx bidim kewar

Kewar bide min tene

Tene bidim tûtik

Tûtik bide min hêk

Hêk bidim Hedad

Hedad bide min das

Das bidim dar

Dar bide min zihar

Zihar bidim bizin

Bizin bide min şîr

Şîr bidim pîr

Pîr bide min dûvika min

Diçim nav heval û hogirê xwe ji min re dibên;

"Qolo qutoz me rî li poz!"

Ga go:

- Here ji min re kayê bîne ku ez bixwim, ez ê rêx bikim.

Rovî çû ba kadînê go:

Kadîn, kadîn!

Bide min ka

Ka bidim ga

Ga bide min rêx

Rêx bidim kewar

Kewar bide min tene

Tene bidim tûtik

Tûtik bide min hêk

Hêk bidim Hedad

Hedad bide min das

Das bidim dar

Dar bide min zihar

Zihar bidim bizin

Bizin bide min şîr

Şîr bidim pîr

Pîr bide min dûvika min

Diçim nav heval û hogirê xwe ji min re dibên;  
"Qolo qutoz me rî li poz!"

Kadîne go:

- De were ji xwe re kayê bive.<sup>3</sup>

Rovî çû teştê tijî ka kir birçû, da ber ga.

Ga, têr xwar; rêx kir.

Rovî, rêxê anî hat devê kewarê vekir, kodika xwe tije genim kir rêx li devê kewarê xist û devê wê girt.

Genim bir çû da tûtîkê. Tûtîkê, xwar xwar go; "qar qar" û hêkan kir. Şeş heft hev<sup>4</sup> hêkan kir birçû da hedad. Hedad, dasa dara dayê. Dasê birçû serê darê. Das li darê xist çiloyê wê tev çinî kire binê darê. Bizin hat çilo xwar xwar guhanê wê tije şîr bûn. Bizinê bir çû ba pîrê. Pîrê dîzika xwe tije şîr kir. Pîrê anî dûvika wî dayê. Rovî, dûvika xwe bi xwe ve danî çû nava hevala...

Wî go:

- Te ji ku aniye?

Yê din go:

- Te ji ku aniye?

Rovî go:

- Werin ez ji we re bêjim.

Wan birçû nav rezê mala xalana. Her qemça roviyekî bi mêwekî ve girêda. Go:

- Zanî ez ê qemçika we bi mêwa ve giredim, ew ê werin ên xweşik pê ve deynin, ew ê ji we kin.

Rovî çû diyarê gund go:

- Zariya mala xalana

Rakin tevr û bêrana

Roviya rezê we qut kir!

Gundî radibin; yek radike tevir, yek radike bêrê, yek radike çakûç, yek radike dar. Her yekî radike tişteki û diçin bi ser roviya de. Çûn dirêjî roviya kirin go we rezê me qelandiye tiriye me tev xwariye. Rovî tev reviyên û qemçika wan bi mêwê ve ma tev qol bûn. Roviye me çû nav wan go:

-Qolo qutoz mi rî li poz

Em tev bûn hevaloz!

Çavkanî: Nazîme ÜYANIK

Temen: 67



Perwerdehî: Nexwende

Herêm: Gulîzera/Farqîn/Amed

Dem: 5/2015

- 1 Tene: Genim
- 2 Kulfik: Devê kewarê, kuna kewarê
- 3 Bive: Bibe
- 4 Hev: Heb





Mem  
MUKRÎYANÎ

Ma ez bi ser Kuno de  
bimîzim dê çi bibe?  
Ez ê serê sibehê wî  
bihetikînim.  
Ez ê bibêjim ku ew  
mezin bûye lê, dîsa jî  
bi xwe de dimîze.  
Hema lihêfa Kuno ji  
ser wî radike û bi ser  
de dimîze. Kuno di  
xwe de dernaxe, pê  
nahese. Elî dilê xwe  
rehet dîke û weke ku  
tiştek nebibe bê  
deng û hes xwe bera  
nava nivîna xwe  
dide.



## ÇÎROKÊN NAVLEKAN(5)

## Kuno<sup>1</sup>

Navê Kuno yê rastî Kerîm bû. Mala wan li bajêr bû. Xortekî 14-15 salî bû. Ew jî mîna bajariyan mezin bûbû. Lê hin merivên wan he bûn, mala wan li gund bû. Îcar rojekê mala Kuno, bi malanî derin<sup>2</sup> gund sertêdana mala kalê xwe. Li gund gellek zarokên xaltîkên wî he bûn. Were heta êvarî bi zarokên xaltîkên xwe re bû, bi hev re digeriyan û difistin. Rojekê dibe êvar tên malê, şîva xwe dixwin. Civata xwe dikin. Piştî civatê ji bo razanê nivînen wan datînin. Dikevin nava nivînen xwe û radizên. Te dî îcar zemanê berê nivîn li kêleka hev datanin û zarok tev li tenişta hev radizan. Hûn jî dîzanin ku bêtir ji tunebûyina cî bû. Çavê tunebûyîne kor be. Lê xweş bû. Zarok tev di nava hev de mezin dibûn. Hînî hezkirin, merivantî û parvekirinê dibûn. Ne weke zarokên niha bûn. Zarokên niha mîna çûrikên zireetê ne. Parvekirin çî ye nizanin. Beroşa xwe di nava nigên<sup>3</sup> xwe de dîtîne, hînî nanê ser mêzênê<sup>4</sup> bûne.

De îcar Kuno jî xwe bera rexa kurê xaltîka xwe Welî dide. Di nava nivînan de kurê xaltîka wî Welî, ji Kuno re çirokan dibêje heta wî di xew ve dike. Kuno jî bî meraq guhê xwe pê dirêj dike heta ku radizê. Birayekî Welî he bû navê wî jî Elî bû. Elî qet ji Kuno hez nedikir. Digot viya bajariya, ne mîna me ye. Weke me nizane bilîze, weke me nizane rûnê û bi ser de jî qedemkeya<sup>5</sup> bajêr dixwaze. Kuno, biroj ji ber ku dawa qedemkeya ji ya bajêr li wan kiribû ew hemî kezebşî kiribûn. Ji ber vê yekê jî Elî qet jê hez nedikir. Wî, pîrr dixwest ku belayekê bîne serê Kuno, lê çî û çawa? Di nava nivînan de Elî xwe zahf aciz dike. Xew lê diherime. Xwe vir de diqelibêne wir de diqelibêne dike nake tebatî nakevê. Kufekuf pê dikeve, diranên xwe diqîrîçîne, pal dide. Lê her çî dike jî bêhna wî fireh nabe, kela dilê wî danayê. Tu dibêjî qey lihêf bûye bizmar û di canê wî de dere. Tevîzînekên hêrsê ew girtiye û dike nake xwe jê xelas nake.

Piştî ewqas hilkehlkê mîza Elî tê. Elî ji nava nivînen xwe radibe ku derkeve derve ji bo mîza xwe bike. Li derve dinihêre ku şev tarî mîna zilûmatê ye. Nîyet dike ku vegere nava nivînen xwe, lê mîzê zor dayiyê û ji ber şewata wê naqedîne. Mizawiriyan<sup>6</sup> dike û xwe bi xwe dibêje:

Ma ez bi ser Kuno de bimîzim dê çî bibe? Ez ê serê sibehê wî bihetikînim. Ez ê bibêjim ku ew mezin bûye lê, dîsa jî bi xwe de dimîze. Hema lihêfa Kuno ji ser wî radike û bi ser de dimîze. Kuno di xwe de dernaxe, pê nahese. Elî dilê xwe rehet dike û weke

ku tiştekan nebibe bê deng û hes xwe bera nava nivîna xwe dide. Di hişê xwe gellek planan çêdike ji bo Kuno. Xwe bi xwe di nava nivînan de dikene. Carna dengê wî bilind dibe lê dengê xwe ditepişîne.

Dema li wan dibe sibe, Kuno li xwe hay dibe ku binê wî û derpê merpêyên wî tev şil û pil bûne. Li xwe heyirî dimîne. Di cî de sar dibe. Lê kêliya ku xwe di nava nivînan de difivîne Elî pê dihesê lê dengê xwe nake. Dibêje bê ka Kuno çî dike. Elî li bendê ye ku eyba xwe veşêre û ew jî bide rûyê wî. Kuno dinihêre ku deng û hes ji kesî nayê hema ji binê lihêfê derdikeve û radibe ku derkeve derve ji bo ku cilên xwe yên şil ji xwe bişeqitîne. Kuno çawa ku xwe ji nava nivînan paş ve dikişîne, Elî xwe tev dide û çavên xwe vedike.

Ji Kuno re dibêje:

- Kerîm tu şiyar bûyî?

Kuno dibêje:

- Erê

Elî ji mizawirî jê re dibêje:

- Kuro Kerîm ma çiqasî xewa te sivik e!

Kuno:

- Erê, ji ber ku ez li bajêr her sibeh şefeqê şiyar dibim loma.

Elî:

- Ez ne wilo me. Kêliya ku ez di xew derim, heta sibehê şiyar nabim.

Kuno paşpaşîka û berê wî li Elî, ber bi derî ve dere. Çawa çavên Elî bi navrana Kuno dikeve, bi dengê bilind ji bo ku herkes pê şiyar bibe û bibihîzin jê re dibêje:

- Ma Kerîm qey te bi xwe de mîz kiriye?

- ...

- Kuro ma ne derpiyê te şil e!

- Welleh ez nizanîm. Min bi xwe de mîz nekiriye. Lê kê ez şil kirime ez nizanîm. Min nedîtiye bê çawa çêbûye. Virran li min neke.

- Çawa çêbûye li ber çavan in. Êşkere ye ku te bi xwe de mîstiye. Ma tu zarok î? Tu çawa bi xwe de dimîzî? Birayê min ê sê salî êdî bi xwe de namîze, ma tu çawa bi xwe de dimîzî.

Kuno awirên xwe dikutîne erdê û pîrr li ber xwe dikeve. Maliyên din jî hemî şiyar bûne û tev li wan dinihêrin. Elî lihêfa wî radike û dibêje hela hûn li

deswa wi binihêrîni! Kuna wi çiqasî mezîn e? Bêhn jî ketiye nivînan. Uuuuuuuuu! Bêhna mîzê tê jî doşeka wi. Mîzêkê mîzêkk...

Efî jî ca' xwe re dibêje:

- Yade! Yade! Tu li kuna kunu binihêre!

Ca Efî ya ku Xatîka kunu ye jî kure xwe Efî re dibêje:

- De derewan neke Efî looo... Qey av mav bi xwe de dakirîye nayê bira wi.

Jî kunu re dibê:

- Were were Kerîmê min were, were da xatîka xwe û van cilên xwe biguhêrîne.

Cilîni zûyê dide kunu, kunu gekên xwe diguhêrîne û tê bal zarokên odeyê. Lê her Efî jê re dibêje; "Kunoo..."" Her dibêje; "Kuno" kunu jî fediya nema dixwaze derkeve derve nava hevalan. Hema wê gavê biryara xwe dide û dibêje:

- Ez ê herim malê

Her çiqasî ca wi, xatîka wi bi xatîyên wî yê din li ber digerin jî qanî nabe. Radîbin wî dixin dolmîşa gund û bi tenê bere xwe dide bajêr. Lê Efî di nava hevalan de qala wê meseleya ku gewimîye dike û her dibêje; "Kuno, kunu Konooo"

### Sumun Bukmun

Li wê derê Efî li xwe mikur tê û dibêje ku:

- Wê şevê min bi ser te de mîz kiribû. Mîz ya min e, lê navê kunu dîsa yê te ye. Piştî ewqas sal kunu bi mikurhatîna Efî kêfxweş dibê, lê jî der ku ew navêka wî "kunoo" jî dîsa dabûn rûyê wî, pîrri! Ber xwe ketibû bi wê tahsîla xwe.

Kuno heta ku tahsîla xwe dike nema tê gund. Gund li xwe heram dike. Piştî tahsîla xwe diqedîne bi gund salan dîsa tê gund. Edî kunu bûbû beytar. Zarokên xatîka wî wan jî tev mezîn bûbûn. Lê jî aliye mîzawirîyan ve tiştêk li xwe kê m nekiribûn, li xwe zêde kiribûn. Kunoyê edî bi xwe dawer tê dikeve nava hevalên xwe yê berê û dest bi civatê dikin. Piştî xêrhatin û pîrsîna hale hev, Eliyê kure xatîka wî jê re dibêje:

- Ma kunu welîhîn ne weke te ye looo... Te em jî bir kirin. Ma merivantî ev e kuro lawoo? Tu niha beytar î! De hela hera li kuna xwe ya li ser doşekê binihêre! Wê miyane û tehlî bike, bê ew kun ya te ye yan jî ya min e?

Lawîkê malê dibê şeq şalî bav û dîya wî bi devê hev wî dişînin ber malê. Navê wî yê rast Yucel bû. Lawik yekî zarşêrîn û rûnêrm bû. Fama wî jî xurt bû. Mele jî ber wî exleqê wî pîrî jê hez dike. Wî di ser her mî suxteyên din re digirt. Pîrî caran suxtê-yên ku dewrê xwe nedixwendin, mele bi textîkê



ku di destan de bû li ser, pişt û çîqê wan dixist. Lê melê tu carî li Yucel nedixist. Yucel li cem melê bi şans û siûd bû. Lê, melê bi qasî ku jê hez dikir pê karê xwe yê malê jî dikir. Were li ber destê melê bû. Ewî ew li ber destê xwe bigewgiranda heta nîvro û asoxî<sup>9</sup> ewî ew bişanda malê.

Bi wî hawî Yucel, eflibêtika xwe, cuziya Em'ê, ya Tebarekê û ya Qesemê diqedîne şûnde dikeve Qur'an'ê. Hemî suxteyên melê ji tirsu ku ew ê mele li wan bixe, li malê dewrê xwe dixwînin. Lê Yucel, ne ji tirsu melê, ji fediya dewrê xwe dixwîne. Her ku dixwîne, bi nav dere, her ku bi nav de dere, herzkirina wî ya di dilê melê de xurttir dibe. Werehasil ez serê we neêşînim! Yucelê me xweş lê dere û tê dikeve sureya ku devê seh pê tê girêdanê. Kîjan suxte gava dikeve wê sureyê, mele ji suxteyan re dibêje:

- Ku bi ayeteke di vê sureyê de hûn dikarin devê seh girê bidin. Ez ê wê ayetê hînî we bikim da ku hûn carekê li seh mehekî rast hatin devê wî girê bidin

Ew ayet di sureya Baqarayê de Ayeta hejdehan e. Ayet ev e: Summun, bukmun, umyun, fe hum la yercûne. Yani dibêje: "Ew kerr in, lal in û kor in. Êdî ew nema dikarin vegezin."

Tu bikî nekî kêliya ku melê ji suxteyan re qala ayet û devgirêdana sehan kir, guhên wan bel bûbûn û çavên wan zîq bi melê ve mabûn. Hele ji bo Yucelê ku her roj li çol û çepelan bû, bûbû qewet û pişt. Şadî û coşiya di dilê wî de dide ser rûyê wî û bi bişîrî li ser kursiya li teniştê melê dimelise. Yucel wexta ku ketibû cuziya Em'ê jî, dîsa melê ji Yucel û suxteyên xwe re gotibû ku:

- Sureya "Wel şemsî we duhaha wel qemerî îza teleha..." Sureya devgirêdana guran e. Bi ayetên devgirêdana seh û guran, bê hemd di hişê Yucel de tuxumê xurtî û bixwe baweriyê meyndibû. Ê ku zêde hewceya wî bi van eyetan he bû bêgûman Yucel bû. Ew yek ji kulfetê malbateke xwedî pêz bû. Yê ku bêtir rastî guran dihat, yê ku bêtir kar û barê wî di nav sehan de bû dîsa Yucel bû.

Mele rojekê Yucel dide pey xwe û berê xwe didin nava rez. Li nava rez digerin, tirî diqurifin û berê xwe didin mahsera piştê rez. Li wir bîstikê bêhna xwe vedikin û bi rê dikevin, vedigerin malê. Dema vegeirê, roj li ber ava ye. Tê, li rê berî ku bigihên malê, li binya malan, gurek derdikeve pêşiya wan. Mele gur nas dike. Lê Yucel xwe bi xwe dibêje karê gur li vir çî ye? Hebe tune be ew seh e. Devera ku

lê ne piçekî xewle ye. Hema wê gavê mele destê xwe davêje qenabekî<sup>10</sup> kin yê ku di berîka êlegê wî de ye. Dike ku hunera xwe nîşanî Yucelê suxteyê xwe bide. Lê vedigerê û dibêje:

- Binêre ez ê niha li ber çavên te devê wî gurî girê bidim ku edî nema karibe me gez bike.

Her cara ku girêkekê li qenabê di destê xwe dixê, pê re sureya "Wel şemsî we duhaha" dixwîne. Lê herçiqas dixwîne jî gur dîsa bi ser wan de tê. Rûyê xwe jî ji wan naguherîne. Deqqe bi deqqe saw û xofa di dilê Yucel de zêde dibe. Ji melê xwe re dibêje:

- Seyda ev ne gur e! Gur li çiyê he ne. Ev seh e û bi ser me de tê. Sureya ku devê gur girêdide nexwîne seyda! Yê seh bixwîne.

Mele guh nadê, dilê melê ji tirsu çar gopal lê dixê lê nade der. Gurê ku pirça wî gijjî û çavên wî sor bûne xwe vir de û wir de nade, dide ser dilê melê. Mele di bin gur de dimîne. Çawa devê xwe dixê xenoqa melê Yucel radihêje keviran û datîne gur. Her ku datîne gur, di ber de ji tirsu weke pelê çilo li ba dibe û bi ser hev de dibêje:

- Summun bukmun...

Mele him di nav dev û nigê gur de diperpîte him jî gazî û hewara xwe dike Yucel. Jê re dibêje:

- Kuro bi keviran lêxê lêxê lêxê...

Yucel dinêre ku kevir wî tahl nakin, dibêje:

- De ez ê devê wî girê bidim qe bila nikaribe melê gez bike.

Hema girêka doxîna xwe ya ku di şalê xwe de kiriyê xirboqî<sup>11</sup> vedike û dikişîne. Her ku girêkekê lê dixê, dibêje summun bukmun... Ne carekê ne du caran ne sê carannn... bi dehan car. Hingî xwêdanek di ber daye şil û pil bûye. Yucelê belengaz dinêre ku mele nikare xwe ji nava lepê gur xelas bike û ew jî dike nake nikare bi gur. Çend kevirên din datîne gur lê nalohêrê(na lo de here)... Eyarê wî jî naêşîne. Dinêre ku tu çare neman, hema li bayê bezê berê xwe dide gund û dere hewariyê digihîne gund. Heta ku tîn cem melê, dinêrin ku mele ji dest xwe çûye. Gur ew'di nava xwîne de hiştiye û xwe daye daldeya<sup>12</sup> tahtekê. Yucel jî bi wê tirs û xofa xwe, bi wî halê xwe yê ji halketî û bi wê baweriyê ku melê xistiye hişê wî, bê hişê xwe girêkan li doxîna di dest xwe dixê û bi Summun bukmunê avrişayê dike.<sup>13</sup> Piştî ku melê li ser piştê hespekê dikin û berê wî didin cem hekîm, yekî ku

hatiye di hewara wan de dinihêre ku devê Yucel nasekine. Lê vedigere û bang lê dike;

- Hey lo lawooo!!! Lo xortê Summun bukmunê! Ez bi wî navê Xwedê sond dixwim, heke tu û Seyda bi qeweta xwe bawer bûbûna û hûn bi Summun bukmunê daneketana dê tu tişt bi we nehata. Ma malnemîratino! Weyê herkê<sup>14</sup> rahişta darekî û bi nava guhê wî ketana. Gur, devê xwe metreyekê vekiriye û ber bi we ve tê, hûn jî bi girêkan û Summun bukmunê daketine. Heyfa te, lê gur ji heqê melê te derketiye Xwarziyê Summun Bukmunê.

Piştî wan qewimînan, ev mesele li nava der û dorê weke xebroşkê tê qalkirin. Jê û pê ve, kî Yucel dibîne bi navlêka Summun Bukmunê bang lê dakinê. Bi vî hawî Yucel jî navlêkekê li teniştê navê xwe datîne û di hewara seydayê xwe de dere.

### Qûnqapax

Li gor gotina yê ku bi serê wî de hatiye, dibêje; rojêke payiza dereng bû. Ez çûm cot. Li gor derdor, cîran û dostan ez ji bo cotkirinê dereng mabûm. Êdî ketibû nîrê reş. Berê berf û baran pirr dihat, yê ku jê bihata û bi hev bixista ji ber xwe derdixist. Yanî, xelkê berê çandiniyên xwe zû dikirin. Îcar ez

bi tenê bûm. Kesê min tune bû. Zarok hûr bûn, hîna li min negihîştibûn. Ez jî tim li ber pêz bûm. De nedigihîşt. Nigên me nediketin bin me.

Îcar ez serê we neêşînim, ez çûm çolê ku ez cot bikim. Heşa, min heywanên xwe girê dan û dest bi cotê xwe kir. Heta saeta limêja nîvro. Heta nîvro yê min emelê xwe avêtibû. Rabûm, çûm min heywanên xwe bera dan û berê wan da nava çêrê. Ez jî hatim min destnimêja xwe girt, pişt re jî limêja xwe kir. Piştî limêjê min pariyek nanê ku Xwedê çî qismet kiribû danî ber xwe û xist ber dilê xwe. Piştî firavîne min got de heta ku heywanên min hinekî diçêrin ez ê jî hinekê vezelim. Min têra kerê xist bin xwe û ez li ser vezeliyam. Gava ku ez vedizelim, ez çefiya serê xwe davêjim ser rûyê xwe. Lê, min wê rojê neavêtibû ser sêrê xwe. Tav ne bi şewat bû, loma min got; "de ne hewcê ye." Xwedê wekîlê te be, min xwe serkêlekê dirêj kiribû û ferek sola xwe danîbû ser kevir, min kevir jî xistbû bin serê xwe. Serê min li ber siyê bû, gewdeyê min li ber tavê bû. Bi wê betlandinê, bê hernd ez ji dest xwe çûbûm. Ez tam ne di xew de bûm, xewmaş<sup>15</sup> bûm. Deqqeya ku ez vedizelim, demançeya min jî her tim di ber serê min de ye.

Hîn were min dît pêjn he ye. Xişexiş û tepetepek



tê. Min nekir tiştêkî, lê guhê min jî li ser e. Berê min li quble, paş min li bakur bû. Bîstikek derbas bû nebû, min bala xwe dayê ku wa ye roviyekî guhbel ber bi min ve tê. Min nihêrt ku rovî ye, min got de guneh e, ez wî nekujim. Ma ew ê çi bike ji min. Qey li qîsmetê xwe digere. Min deng û hes ji xwe neanî. Min qet xwe nelivand. Roviye min hat bin darê, wan der û doran tev bêhn kir, serê xwe rakir û li ser pêyan sekinî. Dêmekê xwest bi derdorê amin<sup>16</sup> bibe. Dîsa bêvila xwe xist erdê û bêhn gerand. Hat li ser serê min sekinî. Min dîsa deng nekir. Ez meraq dikim bê çavê wî li çi ye?

Çû û hat, çû û hat, axirê hat li pişt min, li ser kûja têrrê ya vala, li ber qûna min mexel hat. Min got hema kir ku xisarê bide min ez ê demançê berdîmê. Lê bê xisar bû. Qey zikê xwe têr kiribû û xwestibû ku hinekî bêhna xwe veke.

Min dî hêdika serê xwe danî ser telmeqûna min. Min jî di dilê xwe de got; ji bo ku çiyê wî hîn xweştir bibe, min hêdî hêdî bi awayê ku tê dernexe û nereve, min xwe li ser dev û rû kir. Her ku min xwe rast kir hukma wî xweştir bû, her ku min xwe rast kir hukma wî xweştir bû. Qederek bihurî di eynê xwe dernaxe. Ne him û ne gum. Xew û cî pê xweş hatiye, mîr ne bi halê wî ye.

Min nihêrt ku neyta wî tune ye rabe û here. Min jî qêmîş nedikir ku wî şiyar bikim. Min got; "ya Rebbî ev çi bû hat serê min?" A rast ku ne ji cot bûya heta roj biçûya ava, yan jî heta ku ew bixwe şiyar bibûya min ê ew şiyar nekira. Lê min xwest ku ew jî netirse û ez jî ji karê xwe nemînim.

Bîstikeke din derbas bû min nihêrt ku xurexur bi zikê min ket. Roviye me bi dengê xurexura di zikê min de serê xwe bilind kir û dîsa danî. Nebû! Hema min bi meyane meyane fisek dirêj kir. Bi bêhna fisê şiyar bû. Serê xwe bilind kir, der û dor tev bêhn kir û dîsa serê xwe danî. Ew jî nebû! Çend deqqe derbas bûn, îcar min fisek dirêjtir kir. Dîsa şiyar bû, serê xwe bilind kir, bi bêvila xwe bêhn gerand û ji şûna xwe rabû. Min deng nekir. Min got; "de va ew ê here." Dîsa hat şûna xwe, der û dora qûn û telmeqûna min tev bêhn kir. Vê carê baş fêm kir ku bêhn ji ku tê. Dîsa rabû ser pêyan, li der û dora min û xwe geriya, nihêrt ku fera sola min li rastê ye. Bi fera sola min girt û anî danî ser devê qûna min. Wî, li gor xwe êdî devê qûnê girtibû. Vê carê serê xwe danî ser fera sola li ser qûna min û dest bi pixîniyê kir.

Min nema zanîbû ne ku ez bi wî dilîzîm, ne ku ew bi min dilîze. Min nihêrt ku ji min nema diserife.

Her ku diçe dibe dereng û ez berbayî vî roviyê fenek ketime bilasebep. Min got; "ev ne tu aqil e." Hema vê carê ji nifşka min got zirrtrtttt... Bi zirtîniyê roviyê min veciniqî û hiloz bû. Çûûû... Qederê pazdeh bîst mîtroiyê dûr sekinî û li min nêrt. Min li çavên wî nihêrt wî li çavên min nihêrt. Ziravê wî qetiyabû. Weke ku xwe bi xwe bibêje; "ev çi bextreşî û tofan bû ku hat serê min." Heyirî mabû. Roviye me da rê û reviya.

De hûn dizanin meseleyên weha sosret bîn serê meriv, meriv bi xwe nikare ku nebêje. Te dî min ji yekî re, wî ji yekî din re, wan jî ji yekî din re got û belav bû, bû çîrok û meselok. Lê û pê ve yên kêfçî digotin ku rovî kapax daniye ser devê qûna Şêxmus. Ev navlêka min jî, ji vir tê. Niha der û dor ji min re dibêjin "Qûnqapax" Ê de ka ez çawa bikim? Min got; "de ka ez qenciyeke bi rovî bikim." Min xerabî bi xwe kir. Ev meseleya ku min ji we re got rast e û bi serê xwe ye.

## Xalê Çefyo

Ew kesê bi navlêka Xalê Çefyo ye, rojekê serê şevqê pezê xwe ji hevşê derdixê, dide ber xwe û dere li çiyayêkî ji çiyayên Qerejdaxê diçêrine. Pezê Xalê Çefyo pezê wî yê malê bû. Gellekî lê miqate bû. Ji bo ku têr biçêre, çêre û palaxa<sup>17</sup> xweş li ku derê hebûna xwe digihandê. Yekî emirmezin bû. Hema bibêjin 70 nebe jî çend sal jê kêmbûn. Lê hîna li ser xwe bû. Weke xortekî çardehsalî li pey pêz digeriya, baz dida. Betlandin lê tune bû. Digot ku:

- Ez li ser xwe negerim ez ê bikevim. Gava ku ez li ser xwe digirim him bêhna min derdikeve him jî bi şev ez rehet radikevim. Ji ber ku ez dibetilim xew li min naherime. Canê min rehet e.

Xalê Çefyo pezê xwe bi çêre çêre digihîne biniya sikurê, ji ber ku çêra wê derê baş e hema xurmînî bi pêz dikeve. Dengê xwe bi pêz nake. Xwe dide hêla jor ya pêz û li ser gomeyekî<sup>18</sup> mezin qûn dide erdê. Her ku pez diçêre ji kêfa eşq pê dikeve û ji xwe dere. Bîstek derbas dibe bala xwe didê ku kundekî, xwe li ser zinarekî li jorê wî daniye û zîq lê dinêre. Pîştî ku çav lê dikê îcar ji xwe re li kund dinêre. Xwe bi xwe dibêje; "tu ji xwe re li hikmê Xwedê binêre. Xwedê Teala her mexlûqatek bi awayekî xuliqandiyê. Tu çiqasî mezin î!"

Her ku ew li kund dinêre kund jî lê dinêre. Kund qet çavê xwe ji ser nade alî. Ew jî çavê xwe ji ser kund nade alî. Kêliyêk derbas dibe, herdu jî berê



xwe naguherin. Kund zêde ne dûrî Xalê Çefyo ye. Hema bibêjin navbera wan bi qasî deh mîtroyan encex he ye. Xalê Çefyo bala xwe didê ku awirên kund dişidên. Kund xwe bêtir dimelisîne, kiriye ku xwe bi erdê simandiye. Hîn were kund firreekê dide xwe, baskên xwe li hev dixê û bi esmên dikeve. Gellekî bilind difire. Xalê Çefyo jî têr lê mêze dike heta ku ji çav dikeve. Piştî wê rewşê awirên xwe bera ber xwe dide û diponije. Dihizire dihizire dihizire...

Ji nişka ve pê dihesa ku tiştêkî xwe bi serê wî kir û derbas bû. Hew dinire ku çefiya wî ne li ser e. Destê xwe li ser serê xwe, pişt stûye xwe, nav piştta xwe wan digerîne, sax dike, dipalêne dike nake nabîne. Li hawirdora xwe mêze dike, bala xwe didê ku çefî di nava pencê kund de ye û kund ew bi xwe re biriye esmên. Ê de kundê li wî çiyayê qir î qaf çefiyek spî û nerm mîna pembo dîtiye, li dinê bera dide? Îcar Xalê Çefyo him li kund dinêre û him jî hêdî hêdî, bi hemdê xwe gavên xwe davêje û ber bi aliyê ku kund pê de çûye dimeşe. Kund bi qasî sed mîtroyekî dûr dikeve şûn de datê erdê. Xalê Çefyo bi heyirîn him difikire, him ber pê dimeşe û him jî çavên wî zîq li ser kund e. Digihê nê-

zîkî kund û xwe di pişt gomeyekî de vedişêre. Dinêre ku kund çefiyê li gor mexseda xwe li hev dipêçe. Bîstek derbas dibe difire, dere hinek qirşik mirşik û palax tîne û tê. Bi kûja<sup>19</sup> çefiyê digire û ber bi zinêr ve dikişîne. Dîsa firreekê dide xwe û çefiyê dixê qula zinêr. Bîstikekê tê de dimîne piştê dîsa derdikeve. Tê, îcar ew palax û qirşik mirşik dibe dixê qula zinêr. Pezê Xalê Çefyo jî têr bûye û di şûna xwe de mexel hatiye. Hindik maye ku roj li Xalê Çefyo here ava, lê ew bi meraq e û jî dewsa xwe naleqe. Taliyê piştî ku tarî dikeve erdê kund dere biñê zinarê, her carê çêlikek xwe digire û tîne li hêlîna xwe ya nû datîne. Hemiyân dixê. Deng û hez nema jê tê. Xalê Çefyo, hêdî hêdî xwe digihîne cem zinêr. Bi zinêr radipeliqe heta ku bi çavên xwe hundirê hêlînê dibîne. Çawa ku kund çav lê dikê dibê firrrrrr û ji hêlîna xwe difire, dere xwe li ser



gomeyekî li binya hêlînê datîne. Xalê Çefyo li hundirê hêlînê dinêre ku çend heb çêlikên sorsemitî<sup>20</sup> di hêlînê de ne û kunda dêya wan çefiya wî xistiye binê qula ku ji xwe kiriye hêlîn. Dilê wî dike kizekiz bi wan dişewite. Di ber xwe de dibêje; "kezeb qey tu tiştêkî çawa yî? Tu li heywanê ker û lal binêre! Însanên ku dibêjin em însan in ev xizmetê ji zarokên xwe re nakin. Gunekooooo... Ku ne kezebşewêta dê be dê kî li zarokên xwe xwedî derkeve? Gunekooooo..."

Di cî de bê hemdê wî êstirên wî mîna hebên baranê tîn xwarê. Dibe kûrekûra wî û dide girî. Tê ba pezê xwe, pêz ji mexel radike û berê pêz xwe dide malê. Çawa digihê malê colê pêz dixê hevşê ber malê û bang li kevaniya malê dike, dibêje:

- Hurmê gelo goşt li malê he ye?

Kevanî dibêje:

- Bi qasî lepekî he ye.

Dibêje:

- Hema wî têxe kîsikekî û bîne ji min re.

Kevanî dixê kîsikî û digire tîne ku bide mêrê xwe. Jinik bala xwe didê ku çefiya wî ne li serê wî ye. Kevanî dibêje:

- Qe kanî çefiya te?

Dibêje:

- Ez ê li vegeerê ji te re bibêjim. Tu wî goştê di destê xwe de bide mîj ez ê herim û vegerim.

Jinik tiştêkî jê fêm nake. Li ser milê xwe difitile û vedigere dere nava zarokên xwe. Xalê Çefyo jî dikeve rê û bi bayê bezê xwe digihîne çiyê, dere binya zinêr. Ji bo ku kund û çêlikên wê ji xew şiyar neke bê deng û hez, bê pêjn bi zinêr radipeliqê û wî goştê bi xwe re aniye hinekî dixê devê hêlînê, hinekî jî bi dora devê hêlînê dizeliqîne û dadikeve. Dîsa bi bayê bezê dikeve rê û vedigere malê. Meseleyê ji jinika xwe re dibêje. Jinik ji wî henûntir û kawiktir e. Dibêje:

- Ma te çima negot ji bo kundê ye? Min ê tişt miştî din jî têxistana kîsik ji bo wê û çêlikên wê.

Mêrik dibêje:

- De îro bes e, Xwedê bê erê rojeke din.

Ev serpêhatiya Xalê Çefyo li der dorê diteqe û yek ji yekî re dibêje. Qala henûniya Xalê Çefyo dikin û pê re jî bi zimanekî qerfî dibêjin:

- Xalê Çefyo çêlikên kundan di nava çefiya xwe de xwedî dike. -

Û her yên ku wî dibînin bi henek jê re dibêjin:

- De ka çefyêkê bide me jî ji bo ku em çêlikên xwe di nav de bipêçin.

Xalê Çefyo dibêje:

- Jixwe çefyêke min tenê he bû, ez ê bidim kê nedim kê! "Serê kara bi çil û çara."

Bi saya vê meseleya kund Xalê Remezan dibe xwedî navlêkeke nipînû "Çefyo".

<sup>1</sup> Kun: Bêtir ji dewsa kesan a li ser nîvîn, doşek, mînderekê ku lê mîz kirine re tê gotin.

<sup>2</sup> Derin: Diherin, diçin

<sup>3</sup> Nig: Ling

<sup>4</sup> Hînî nanê ser mêzênê bûn: (biwêj) Hînî nanê rihet-hazir bûye

<sup>5</sup> Qedemke: Daşir, avrêj, taelet

<sup>6</sup> Mizawirî: Nehewînî

<sup>7</sup> Ca: Dê, dayik

<sup>8</sup> Zûya: Ziwa

<sup>9</sup> Asoxî: Soxîn, talîya talî

<sup>10</sup> Qenab: Cureyeke benî. Benekî stûr e.

<sup>11</sup> Xirbokî: Awayekî girêdanê

<sup>12</sup> Dalde: Talde

<sup>13</sup> Avrişî kirin: (Biwêj) Dilê xwe rihet kirin, dilê xwe hênik kirin, av bi dilê xwe reşandin.

<sup>14</sup> Herkê: Her yekî

<sup>15</sup> Xewmaş: Xilmaş

<sup>16</sup> Amin: Ewle

<sup>17</sup> Palax: Pelax, gîyayê hişk. Wek pûş û pelax

<sup>18</sup> Gome: Kevirê mezin ê ji zinaran biçûktir

<sup>19</sup> Kuj: Koşê

<sup>20</sup> Sorsemitî: Çêlikên nû xwedêdayî, yên bêpûrt

# SÊ QEWLÊRK

Lo lo kuro te kuranî kir  
Te heft sala şivanî kir  
Te dozdeh meha gavanî kir  
Te qelenê jinka jinebî kir

Ez xwe bi qurbana te bikim  
Ce û genim tevlihev bikim  
Li aşê Nebo hel bikim  
Pê daweta te û xalê te bikim

Ez qîza xwe nadim gend û menda  
Ez ê bidim dewlemenda  
Bila jê ra bînin xilxala piyan û bazinên zenda.

Herêm: Farqîn/Amed  
Dem: 2012

Berhevkar:  
Enes MEÇÎN





# SÊ LÎSTIK

Nûredîn VÛRAL

## Jimartina Tiliyan

Her dem û li her derê tê lîstin. Lîstika keç û lawan e. Kesên ku temenên wan di navbera 5 û 15 salî da ne vê lîstikê dilîzin. Carinan mezin jî vê lîstikê bi zarokan re dilîzin. Hejmara lîstikvanan ne diyar e. Lîstikvan çiqas pir bin lîstik ewqas xweş dibe. Herî kêr bi sê kesan tê lîstin.

Ji bo lîstikê lîstikvan di nav xwe de hakemekî diyar dikin. Dûre lîstikvan li ber hev rûdin û destekî xwe vedikin û datînin erdê. Hakem jî bi vê benda jêrîn tiliyên lîstikvanan dijmire. Peyva dawiyê li ser tiliya kê mabe ew tîlka xwe tof dike. Bi vê şiklî tiliya kîjan lîstikvanê herî dawiyê vekirî mabe lîstikvan giştik sîlekî li destê wî dixin. Lîstik bi vî şiklî dewam dike.

“Yeklo, diklo tema zê,

Şemsê, qûtê repa zê,

Geçê meçe, eraq çê,

Xirna qotik, fis bir cik.”

**Jêder:** Gulşen NAZLIER

**Temen:** 25

**Kar:** Karker

**Cî:** Xirawa/Sipenîk/Licê/Amed

## HÊLÊ

Havînê û payîzê li derve û li cîhkî rast tê lîstin. Lîstika lawan e. Kesên ku temenên wan di navbera 10 û 30 salî da ne vê lîstikê dilîzin. Ji bo lîstikê serî taximekî sê kevirê bi qandî çarpênc kîloya giran û serî lîstikvanekî jî hinek kevir lazîm e. Bi du gruban tê lîstin. Her grubek herî kêr du kes in. Her grub li hemberî hev cuda cuda her sê kevirên xwe yê mezî bi haweyî qûçan datînin. Navbera van qûçana metrekî dirêj e.

Bi lîstika şil û ziwa an jî bi bendeke gruba destpêker tê belîkirin. Her lîstikvanek dikare kevirê bavêje van qûçana. Lîstikvanê qûçekî dixîne dibe xwediyê kevirê din jî û dikare kevirê din jî bavêje van qûçana. Bi vî qeydî kîjan grub berê qûçên gruba din bixîne ew gruba ha, lîstikê qezenc dike û gruba din jî cilê xwe ji xwe dikin û tevî şort tenê dimînin. Gava kesê ku piçûk dilîzin carinan hev û din tazî jî dikin. Lîstik bi vî qeydî dewam dike.

**Jêder:** Cengîz TÛTAR

**Temen:** 45

**Kar:** Karker

**Cî:** Mezîrk/Farqîn/Amed

## Firandina Pîrê (Kêzkatûna)

Wexta ku bihokê deqdeqî-pîrê (kêzkatûn) tê lîstin. Lîstika keç û lawan e. Kesên ku temenên wan di navbera 6 û 13 salî da ne vê lîstikê dilîzin. Firandina kêzkatûnan di nava lîstikvanan de carinan wekî lîstikekî daxwazkî tê lîstin carinan jî bi haweyî pêşbazî tê lîstin.

Eger daxwazkî bê lîstin lîstikvan pîrikan datînin ser destê xwe û li benda firandina wan disekin. Hîn pîrikê wan nefiriyane lîstikvan bêdeng ji Xwedê tiştan dixwazin. Eger bi pêşbazî bê lîstin, di vê rewşê de ji Xwedê xwestin tune ye. Lîstikvan pîrika dadînin ser destê xwe û li benda firandina wan disekin. Pîrika kê zû bifire ev qezenc dike. Lîstik bi vî şiklî heta ku lîstikvan aciz dibin tê lîstin.

**Jêder:** Gulê KAYA

**Temen:** 52

**Kar:** Kebanî

**Cî:** Pîrejman/Pîran/Amed



# Rovî, Bet û Ker

Berhevkar:  
Wîldan SEVÎM

Hebû û tune bû. Hebû ker û rovî û bet. Her-  
sêya di nava hev û din de şikarte danîn. Her  
ro kerê diçû û dixwar. Rojekê rovî û kerê li  
hev civiyan go:

- Ka em herine hafê şikartê me, şîn hatiye  
an nehatiye?

Çûn ku va erda rût e. Rovî go:

- Kerê te xwariye.

Kerê go:

- Betê te xwariye.

Gotin:

- Heyra em ê herin devê çem sond bixwin.

Çûn devê çem wî got:

- Tu pêşî sond bixwe.

Ê din got:

- Tu pêşî sond bixwe.

Rovî got:

- Heyra ez ê pêşî sond bixwim.

Rovî got:

- Rov û rov rovîk û roveytê

rov û rov qaçil û enteytê

rov û rov xenîm û Ellah

rov û rov şakê madella.

Û rovî derbas bû ji çem hate dora betê.

Betê got:

- Bet û bet betik û bateyna

bet û bet qaçil û enteyta

bet û bet xenîm û Ellah

bet û bet şakê madella.

Bet jî ji çem derbas bû hate dora kerê.

Kerê got:

- Zirr û zirr zirik û zirreytê

zirr û zirr qaçil û enteytê

zirr û zirr xenîm û Ellah

zirr û zirr şakê madella.

Û ker gihişte nivê çem û pêve çû. Betê û

rovî gotin kerê te xwar, te nexwarr. Kerê go:

- Min xwariye heyra, min xwariye.

Çîroka min çû nav dara, rehme li dê û bavê  
gohdara...


Çavkanî: Hamîd SEVÎM

Temen: 60

Perwerdehî: Xwende

Herêm: Gundê Bleyder/Bişêrî/Êlih

Dem: Payîz/2014





# Sêva Mêxekrêj

Sêva Mêxekrêj bi mêxek û sêvê tê çêkirin. Ango qurnefilên (mêxek) hişk ên dirêjik yek bi yek di sêva sor de tîn çikandin û heya ku ew sêv bi qurnefilan were veşartin. Piştî ku bi qurnefilan hate nixumandin, ji bo ew sêva bi mêxik ava xwe ziwa bike divê çend rojan bisekine. Lê her cara ku ew mêxik sist bûn divê wan hinekî din jî di nav sêvê re werin çikandin. Herwiha ew ê bi vî awayî mêxik xwe bêtir li sêvê bişidînin û dê saxlemtir çêbibe. Çêkirina her Sêveke Mêxekrêj dikare wexteke zêde bigire. Tê gotin ku Sêva Mêxekrêj dikare heta sed salî jî bimîne.

Beroj  
MUKRÎYANÎ



Temenê hinek diyariyan ji temenê evîndariyan dirêjtir e. Dema mirov wê dibîne wek tiştêkî efsûnî li ber çavan şewq vedide. Cara ewil min ew di filmeke Halil Uysal Dağ de dîtibû. Di sala 2004'an de bû. Navê filmê jî "Dema Jin Hez bike" bû. Di filmê de gerilayeke jin ku nû beşdarî gerilla bûbû û wêne xêz dikirin, herwiha li dijî rakirina çekan bû û tenê dixwest doza xwe bi hunerê pêş de bibe, her serê kêliyêkê tiştêkî xemrî û gilover ji tûrikê xwe yê ku qelem û boyaxên wê yên xêzkirinê jî tê de bûn, derdixe û bêhn dike. Ew ê piştê çiroka wê jî ji gerilayeke bi navê Engîzek re bigota, lê belê çî ye çawa ye û çawa tê çêkirin evan agahî û hûrgulî hemû veşartî dimînin.

Sal bûbû 2010'an, min cardin li filmê temaşe kir. Rojê ez rabûm min hinek qurnefil û sêvên sor ên biçûk stendin û hatim malê, min dest bi çêkirina Sêva Mêxekrêj kir, dikarim bêjim ku nêzî du-sê saet wextê min ji bo çêkirina du heban çû.

Lê heya bi demekê jî min nedizanî bê navê wê yê rastîn çî ye. Yê rast di filmê de lehenga me behs kiribû ku berê tiştîne wiha dixistine nav cihêzên bûkan ji bo bêhneke xweş bidê. Lê ne tenê ev bû û min jî tenê dizanî ku xemleke wê ya xweşik heye, efsûnî ye. Herwiha diyariyeke nazik û mayînde ye jî. Lê piştî min hevpeyvîneke bi Seywan Saediyan re ya di Ozgur Polîtîkayê de xwend, ez hînî navê wê jî bûm. Beriya hevpeyvînê bi çend salan min ew Sêva Mêxekrêj bi destên xwe çêkiribû lê belê bêyî ku navê wê bizanim.

Piştî ku min hevpeyvîna bi Seywan re xwend him ez bi navê wê, him jî bi wateya wê hesiyam him jî qîmeta wê li bal min zêdetir bû.

#### **Diyariyek ji kevneşopiyên evîndariyên Kurdistanê**

Tenê bi dîtîne nayê nasîn. Divê yek dest bidê, bêhn bike û hinekî jî xwe bi destê wê efsûniya wê berde. Ew efsûnî mirov bi pey meraqekê jî dixê. Lê piştî mirov hinekî li ser lêkolîn dike, dibîne ku ev Sêva Mêxekrêj e, û wek diyariyekê ye ku di nav kevneşopiyên Kurdan de cih digire. Ew bûye sembola çend tiştine cihê jî. Yanî di çanda neteweya Kurd de wateyên xwe yên rengîn û cuda jî hene. Li hîj deveran li ser wê sond tî xwarin û gotinên giranbuha li ser tî kirin. Di gelek çîrokên evîndariyên kevin de roleke xwe ya girîng heye. Gava keçik dîldara xortekî dibe û nikare behsa evîndariya xwe jê re bike, gelek rêyên cuda û rengîn li ber hene û wan diceribîne. Sêva Mêxekrêj wek diyarî yek ji wan rêyan e. Lewra di evîndariyên berê de bilêv kirin û nîşandayîna wê evîndariyê ji ber normên civakî û bêderfetiyan, zêde ne berbelav bû. Lê dîsa jî ne neçar bûn, gelek rê û rêbazên cuda jî





hebûn ji bo evîndariya xwe pêşkêş bikin. Wekî nexiştandina destmalekê ya ji bo lawikî, û herwiha diyariyên din. Ev hemû nişane û sembola evîndariyên berê ne, Sêva Mêxekrêj jî yek ji wan diyariyan e ku keç pê merama xwe bi xortan re parve dikin. Ev çand demeke dirêj hinekî hatiye jibîrkirin an jî pir ne li ser bîr û bala kesî ye, herwiha li Bakurê Kurdistanê jî hema hema winda ye, lê dîsa jî li hin deveran zindî ye. Sêva Mêxekrêj ne tenê bo pêşkêşkirina evîndariyekê tenê ye. Herwiha ger diltengî û xeyidandinek di navbera du hezkirî û evîndaran de çêbibe bi rêya diyariya Sêva Mêxekrêj lihevhatina wan çêdibe. Ango ew aştîya evîndaran jî pêk tîne û evîndariya wan nû dike.

### **Sêva Mêxekrêj çawa tê çêkirin?**

Sêva Mêxekrêj bi mêxek û sêvê tê çêkirin. Ango qurnefilên (Mêxek) hişk ên dirêjik yek bi yek di sêva sor de tînin çikandin û heya ku ew sêv bi qurnefilan were veşartin. Piştî ku bi qurnefilan hate nixumandin, ji bo ew sêva bi mêxik ava xwe ziwa bike divê çend rojan bisekine. Lê her cara ku ew mêxik sist bûn divê wan hinekî din jî di nav sêvê re werin çikandin. Herwiha ew ê bi vî awayî mêxik xwe bêtir li sêvê bişidînin û dê saxlemtir çêbibe. Çêkirina her Sêveke Mêxekrêj dikare wexteke zêde bigire. Tê gotin ku Sêva Mêxekrêj dikare heta sed salî jî bimîne.

### **Sêva Mêxekrêj; wek sembola bibîrxistina jenosîdê**

Herwiha wek qasida aştîyê jî tê bikaranîn. Û herwiha ji bo malbatên ku di qirkirinan de kes ji wan hatine kuştin sêvên sor tîne belavkirin. Her sêveke mêxekrêj û mirîyek. Bi qasî hejmara kesên ku jiyana xwe ji dest dane sêv li nav malan tîne belavkirin û ew sêv bi mêxek tîne xemilandin. Piştî xemilandina wan, li malbatên ku qurban dane tîne belavkirin. Bi vî awayî sêva mêxekrêj dibe bibîrxistina jenosîdê û kuştinan.

### **Li Başûrê Kurdistanê: "Cejna Neteweyî ya Sêva Mêxekrêj"**

Divê hunermendên neteweyekê bikaribin ji

kevneşopiyên xwe hunereke nû biafirînin an jî wê çandê nûjen bikin û dîsa pêşkêşî civakê bikin. Belê em ê behsa vê yeke jî bikin.

Bi taybetî ji sala 2010'an ve ye ku ji bo bîranîna Qurbaniyên Enfal û Helebçeyê li Başûrê Kurdistanê wek "Cejna Neteweyî ya Sêva Mêxekrêj" bi awayekî fermî tê pîrozkirin.

Mîmarê vê cejnê jî Peykertiraşê navdar ê kurd Seywan Saeedian e. Seywan Saeedian bi xwe ji Rojhilatê Kurdistanê ye, bi saya Seywan Saeedian ev çanda jibîrbûyî car din geş dibe. Seywan Saeedian nêzî 11 salan li Başûrê Kurdistanê, li şarê Silêmaniyê maye, him xwendîye û him jî wek hunermendekî bi karê xwe yê hunerê ve mijûl bûye, gelek berhem û proje afirandine. Ji bo bîranîna jenosîda li ser Kurdên Başûrê Kurdistanê Projeya Sêva Mêxekrêj di 11 salan de bir serî û ew çanda nuxamtî û jibîrkirî cardin gi-hand roja îro û nifşê me.

Di Komkujiya Helebçeyê de gaza kîmyewî ya bêhna sêvan bûbû simbolek. Herwiha Qurnefil jî berdewamiya jiyana û pêşerojê temsil dike. Di heman demê de sembola aştî û hezkirinê ye jî. Ji ber hindê ji bo naskirin û bibîrxistina jenosîda li ser Kurdan jî bûye nişaneyek ku Sêva Mêxekrêj bi deh salan jî dikare wek xwe bimîne, efsûnî û xeml û bêhna wê jê naçe.

Li Başûrê Kurdistanê ji bo ev kevneşopî cardin bi bîr were û di nava nifşên ayende de belav bibe, ji sala 2010'an ve ye ku di roja hezkiriyên ya 14'ê Sibata de Cejna Neteweyî ya Sêva Mêxekrêj tê pîrozkirin.

### **Ev çand ji serdema Zerduştîyê ve gihaştîye roja îro**

Ev çanda kevna li Kurdîstana Rojhilat berbelav e. Li Rojhilatê Kurdistanê jî herî pir li herêma Mukriyan ev çand berbiçav e. Herwiha dibe ku çandek hevpar a Kurd û Farisan be. Li gor hin lêkolînan ev diyariya xweşik a nişane û sem-bola evîndariyê ji serdema Zerduştîyê ve gihaştîye heya roja îro.

### **ÇAVKANÎ**

- <http://yeniozgurpolitika.info/index.php?rupel=nuce&id=33941>
- <http://www.natgeokurd.com/seva-mexekrej-diyariyek-ji-kevnesopiyen-evindariyen-kurdistane>
- <http://www.semdinlihaber.com/guncel>
- <http://basnews.com/index.php/so/news/27520>
- Kovara Zarema, Hej: 6

Berhevkar:  
Onder  
DEMİRASLAN



## TERZÎ, MARANÇOZ Û MELE

Carek jî caran, rehmet li dê û bavê hazir û guh-dara...

Dibê hebû meleyek, marangozek û terziyek. Hersêk rabûn, herkesî eşyayê xwe hilda. Marangoz malzemê xwe hilda, mele jî kîtbên xwe hilda û terzî jî makîna xwe hilda û gotin:

- Vî gundî îşê me tu ne, em ê herin şehirek. (*Em bêjin Stanbolê*) Xwe ra îş bikin û belkî em piçek wira bazar bikin.

Rabûn çûn. Dibê çûn. Zehf çûn hindik çûn. Çûn, çûn derketin zozanekê. Êvar e. Nanê xwe xwarin û go:

- Gelî hevala, naha êdî em ê razên, yek me nobedariyê bike, dudu me jî razên, bira<sup>1</sup> eşyayên me xelk nebe. (*Ew zemana qaçaxa bûye zemana diza bûye. Wî çaxî peyatî bûye ne siwarî bûye.*)

Mele, terzî radizên, marangoz dibe nobedar. Marangoz dibe; "ka nobeta min ê çawa xilas

be lo? Ka ez xwe ra tiştêkî bikim, bira nobeta min ret bibe.<sup>2</sup>

Marangoz kelmelê xwe, eşyayê xwe derdixe, darekî diîne, ewî darî bi haletê xwe çêdike û lê dixê û dixemilîne û çêdike, dike şeklekî mervekî. Dadine wira disekne, heta nobeta wî ret dibe. Waxtê ret dibe, tê waxtê wan hişyar dibe deng bi wan dike. Dibê:

- Bira rabin nobeta xwe.

Deng terzî dike. Terzî radibe, dêhna xwe daye; hevalê wî darek bi şeklî merivekî çêkiriye û daniye wira. Ew jî dibê; "Xwedê îja dora min e." Ew jî makîna xwe tiştê xwe datîne wê derê dibê; "Xwedê ez ê destekî kinc bidirûm, lêkim, heta wan kincan ez ê lêkim, nobeta min ê ret be."

Ew jî makîna xwe dadine req, req, req lê dixê, lê dixê û lê dixê welhasil ji wî darî ra destekî kinc didirû; kincê jina. Didirû û lê dike, heta ret dike nobeta wî jî ret dibe, mele radibe.

Mele dêhna xwe dide hevalêkî wî dar çêkiriye şeklê merva, hevalê wî terzî jî kinc lê kiriye, ew jî mele ye dimîne bi duayê wî. Ew jî hema nimêj dike dua dike, nimêj dike dua dike û dibê: "ya Rebbî tu hema ruhekî bidê." Emrê Xwedê, Xwedê jî duayê mele qabul dike û ruhekî dide ew dibe qîzeke çardehsal. Wextê dibe qîzeke çardehsal şeveq davêje.

Dema şeveq davêje herdu hevalê wî radibin, dêhna xwe dayê ku qîzeke çardehsal. Dibên:

- Ew çi ye mela?

Mele jî dibê:

- Welle yekî we dar çêkiribû, yekî we jî kinc lê kiribû. Min jî dua kir, Xwedê ruh dayê.

Marangoz dibê:

- Ew ya min e! Ew dar min çêkir.

Terzî jî dibê:

- Ew kinc jî min lê kir.

Mele jî dibê:

- Law ew axir duayê Xwedê min kir! Ew bi duayê min bûye jin.

Hersêk li ser mucadele dikan. Mele dibê:

- Min ra.

Terzî dibê:

- Min ra.

Marangoz dibê:

- Min ra.

Dibên:

- Em li hev nexin, em herin şera xwe bikin.

Diçin, diçin, diçin, zehf diçin, pir diçin, hindik diçin, diçin rastî şivanekî tên. Şivanekî pir aqil bûye. Qizik jî bi wan re ye. Dibên; "em ê nanekî bixwin." Dibê:

- Birayê şivan! Dibê welle şereke me heye. Tu merivek pir aqil î. Hema barkê em ê te sual kin. Tu çi qirarî me, ra bidî em ê usa<sup>3</sup> bikin.

Dibê:

- Kerem kin.

Mele dibê:

- Ez mela me, ewa marangoz e, ewa jî terzî ye. Dibê nobeta marangoz da marangoz dar çêki-

riye şeklê meriv, nobeta terzî da jî terzî kinc lê kiriye. Nobeta min da jî min dua lê kiriye bûye meriv. Naha em hersê bi hev nakin. Ka wa qîzka kê ra bikeve?

Şivan dibê:

- Qurban! E'<sup>4</sup> we ra tiştêkî bêjim. Dibê bavo gere hûn hev aciz nekin. Dibê eva kumê min, eva bilûra min, eva şivika min. Ez ê a daynime wê derê. Hûn hersêk herin em bêjin dûr, filan derê birevin (*Rê wira kifş dike*). Kîjan revî peşî bilûr hilda qîzîk, ya wî ye. Tu kum destê xwe bavêjî, şaş kî tu jê ret. Tu yê şivikê jî destê xwe bavêjî tu jê ret. Lê ku te destê avête bilûrê, qîzîk ya wiya dibe. De herin birevin, kê xwe re zû hat.

Terzî, mele marangoz û mele dûr diçin (*Em bên kilometrekî wê da*). Şivan şivika xwe datîne, bilûra xwe û kumê xwe datîne. Hersê jî li meydanê tên xuyanê. Ewana direvin. Direvin, direvin, direvin û direvin. Emrê Xwedê, dibê mele jêhatî ye. Mele pêşiya wana destê xwe davêje bilûrê.

Şivan dibê:

- Qurban, welle ji mela ra ket. Madem Xwedê dayê rihmê ewa hez kiriye, ez jî hema ser zewacê we, bilûra min heye. Ez ê bilûre xim û daweta mela jî jê ra bikim.

Şivan li wê derê li bilûrê dixwe, daweta mele li wê derê dike û xatirê xwe jê dixwazin.

Ew çûne xêr-silamet, tu jî mayî xêr-silamet.

**Çavkanî:** Dengbêj Mehmet 'Elî

**Temen:** 65

**Perwerdehî:** Xwende

**Herêm:** Selehane/Ebex/Wan

**Dem:** 14.02.2014

<sup>1</sup> Bira: Bila

<sup>2</sup> Retbûn: Xilasbûn, qedîn.

<sup>3</sup> Usa: Wisa

<sup>4</sup> E': Ez ji

Ozlem  
EKİNBAŞ\*



## NEWALA ÇORÎ

Qezaya Riha Curnê Reş de, kewna mîyanê dewa Qenterî. Kewna destê rastê Feratî ser. Qenter şaqa roy dê Feratî ya, Newala Çorî zî hema kaleka Qenterî ya virazîyaya. Xet da Dengizi ra çaxarsey û nevay m (490) berzeri yo. Çayo ke kolayeyo û ci ra çî viciyayo, dergeya cj 100 m., herayeyo ci zî 50 m. ya. (Bnr: Wêne 1a-1b'yê)

Min waşt ke ez, na tepîya nuştanê xo, bi zuwan xo binuşa. Kêmaneya min bibo zî qisûr de min bewniyê. Ez do ewro ra nê hejmarîra tepîya cayên verananê ke bindê awda barajan de mendê, inan biyara çimanê şîma ver.

Mixeqaq cayên verênanê ke binê awa barajan de mendê vêşiyê, bekî ma nêşê tîya de pêkin bî-yare ziwan; feqet ma do, Mezopotamya ra bigîrê dest, ma şa xeta kotî berê, ma do berê.

Serera, ma do Mezopotamyaya Corên ra bigîrê dest û her hijmar de, cayêk yan zî didi cayan, o ke dest dê ma ra bêro ma do binuşê.

Merdimê verênî, wexto ke kenê xo rê cayên mendişî yan zî dewêke virazê, winênê çosmedê xo ra, aw esta çînya, goreyê ci virazenê. Bol finan zî, çosmeyê aw ra yan zî, kinardê aw de dewanê xo virazenê. Ney zî, ma cayên verênî ke heta nika

erdkologa kolayê û vijîyayê roj mîyan ma înan ra zanê. Ney serra ma şenê vajê ke Ferat û Dicle kandê merdimanê verênan nîmetêko gird o. Labrey însanê na dem, qîymetê çîyê nêverdayo. Senî nêverda yo? Tarîxê merdimahî sero de berajî viraştê û tarîxê însanî qedînyayo. Ma tarîx qedêno! Helbet nêqedêno. Hezar û newsey û şeştî (1960) ra tepîya, Ferat û Dicleye ser de Dewleta Tirk berajî viraştî. Sifte; Keban; baxdo, Karakaya; baxdo, Atatürk; baxdo, Birecug û Karkamiş. Dewleta Sûrîy zî berajê Tabqa viraştê û tarîxê merdimew aw bin de verdayo.


### NEWALA ÇORÎ

#### HERUN

Qezaya Riha Curnê Reş de, kewna mîyanê dewa Qenterî. Kewna destê rastê Feratî ser. Qenter şaqa roy dê Feratî ya, Newala Çorî zî hema ka-

\* Arkeolog

leka Qenterî ya virazîyaya.<sup>1</sup> Xet da Dengizi ra çaxarsey û neway m (490) berzeri yo. Cayo ke kola-yeyo û ci ra çî viciyayo, dergeya ci 100 m., herayeya ci zî 50 m. ya. (Bnr: Wêneyê 1b'vê)



### KOLAYIŞ

Prof. Dr. Harald Hauptman (Mektebê Heilderbergê Almanî ra yo) hezar û nevey û heşt (1980) an de, koletîşê reynayîşê ya Newalî Çorî de girweyayo. Qeflêya ci de zî, Klaus Schmindt zî estbîyo. Newala Çorî hezar û newsey û neway û didi (1992)yan de awa berajê Atatürkî de mendo.

### MUHIMBIYAYIŞÊ CI

Newala Çorî kande ke, verîya Çaxa Neolîtîkî de Mintikaya Mezopotamyaya Corên akena, hem coy ra, hem zî demeyo ke, merdimî koçerêy veradanê û xo rê dewî virazenê coy ra muhîm o.

Helbet merdimî winî bixb nêbenê wayîrê dewan. Verê Çaxa Neolîtîkî de Çaxa Cemedî (Holosen) estbî. Çend hezar seran de, qermê dinyayî şikiyêno, dinya beno germ. Dinya beno germ tepîya, cayo ke cemed girêdayo, helayeno yeno war. Cayên ke aw bena dol zî wucanan de û çosmeyê înan de, dewar beno babetin, şênayey bena babetin. No çî pêrko zî, verê dewan akeno. Merdimî, êndî kandê mirdkerdişê pîzeyê xo û rakewtişî rê hend zey verî nêgeyrenê, koçerêy nêkene. Hêdî hêdî erd zî qarêne. Newala Çorî de zî, erdê qaritîn û hêcetê erd qaritişî ameyê vînayîş.

### TARÎXDAYIŞ

Tarîxê Newala Çorî, Verê Zayînî heta heşt hezar û pansey ser zî şîno. Neolîtîkê Newala Çorî PPN Çaxa bêfiraq de panc hebî tabakay estê, tarîxê nînan verê Zayînî mîyan de 8500-7800 serran de yo.<sup>2</sup>

### ÇIYÊ VÎNAYIŞÎ

Merdimanê zanayan, çîyo ke şênayey, nebat, lem, terkê û heywanan ra mendo, înan sero lebaratuvar

de girweyayê. Goreyê nê girwenayîşî; Newala Çorî de, sey xezalan, koçpes, xozê kowîya bîyo û merdimanê wucay no babeta xo ver dayo: Nînan het, mî û bizî zî wayîr kerdê. Çiyê karitişî mîyan de zî, xelle, cev, fasuley, fistiqî û engûr ameya tespîtkerdiş.

Şiklê banan de Newala Çorî çar koşeyê û mîyanê binê banan de zî, erqî estbîye. Nê erqî zî bê siwax ê. Nê babet banan rê "Banê Erqinî" vajêno. Tayên banî estê ke, dêsê înan ê teberin nezdiyê 0.50 cm ê; dêsê ciyê zerîyin zî nezdiyê 0.40 cm ê.

Banê ke nê cay de virazyayê, şiklê viraştene ci ra ma zanê ke, nê keya mîyan de alfêtêndo xurt estbîyo. Karê xo pîya viraşto. Kesî tenya gorê sereyê xo gam nêçekerda. Dûriyê banan de zî perestgehê ameya vînayîş. Labrey, çirê na perestgeh banan mîyan de nîya, ma ey hewna nêzanê.<sup>3</sup>

No cayê Homayî (perestgeh) 14x14 m yo. (Bnr: Wêneyê 2.) Binê banê Homay bi terezzo<sup>4</sup> dawite yo. Nê terazzo sero zî, ca bi ca erqî estbîyê. Çosmeyê perestgehe dês bîyo, no dês, bi sîyê sipeyin virazyayo. Nê dêsanan dir cayê ronîştîşî sekuy virazyayê, nê sekuyî zî çorçoşmê de cay ra doş benê.



Nê sekuya sero zî juwendês hebî sîye denîşnayeyî (*dikilitaş*) ameyê vînayîş. Nê sîya vorte de zî ma vînenê. Vorte de didi hebî estbîye. Nînan ra jewa ci heta na roj zî pak ameya. Bejna na sîyer 2.35 m ya. Na sîye sero zî, kinaranê ci yê xerayan ra didi destî yenê

heta kinaranê tenga û wuca de yenê pê het. (Bnr: Wêneyê 3.) Qandê na viraştên, nê sî nîşanê pey-

<sup>1</sup> Tay

<sup>2</sup> Hauptman 1999; 2007

<sup>3</sup> Neolithic In Turkey Euphrates

<sup>4</sup> Terezzo: Babetê xercêk o, ci mîyan de sîye verdî û şênayey est a.



kerê merdiman kenê.<sup>5</sup> Fina çend parçeyî sî vîneyayê, nînan ra dîrêyê ci mirîçikî, didiyê ci sereyê merdiman o. Nê ardê pê het, nînan ra totem virazyayo. Didi cinîyan paştîya xo daya pê û nînan sero zî sîsalik (*mirîçika ke leşan wena*) esta.<sup>6</sup> Na sîya totem ra zî, dinyayê merdiman de Newala Çorî rê ma şenê vajê ke, merdimî û mirîçikî goreyê înan qutsî yê. (Bnr: Wêne yê 4a-4b'yê.) Bol vêşî figurê herrinî vicîyayê. Ninan ra sera nevay veşêrî ye ci e merdimanê. Çîyo ke pêra virazyayo; herr a. Şiklê viraştîşê ci zî plastik o.<sup>7</sup> Fina, nezdiyê girdeya sereyê de înanî de tenya sereyê amêyo vînavîş. Bêpor o û peynîya sereyê ci de, marê hetê corîya şino. (Bnr: Wêne yê 5.)



Hauptmannî sîye cayê Homayî (perestgeh) dayo topkerden, numreyî dayê sî pêrkinan, zerîya ci nê-girota ke aw bin de bimano coy ra min dayo arêkerdîş ma nêzanê, labrey bixo winî vano. Murat Akman nê sîya numre keno jew bi jew. Vîst û hîrê serrî tepîya, nika no cayê Homayî (perestgeh) muzeya Riha de da ronîştên. Hem zî merdimo ke sîyê perestgehî destan de xo ya numrey kerdibî Murat AKMAN, ey bi destanê xo viraşt. Nika no cayê Homayî bixo, şima şenê bivîne.

Fina, merdimê Newala Çorî, merdanê xo zê cayê Neolîtîk de Mezopotamya ye binan, sereyê ci cikenê, qandê mirîçika ke leşan wena (sisalik), tebera verdanê. Behdo zî beno ke tenya hesteyanê ci kenê tirb, serê ci zî keyeyî de verdanê û kutsîyetê danê ci. Ney rê vajêno ke; "kutsîyeta sereyan" û ma şenê vajê ke Newala Çorî de zî kutsîyeta sereyan esta.

Vînîyayîşê çiyê verdî mîyan de; hacetê ke biroj pa kar kenê estê, hacetê seydî este, çîyo ke qandê

zerî weşkerdîşî dayo pê, esto. Nê çî hema hema pêrko; sîya sipê, sîya adirî, kuartîser, sîya kirecî ra virazyayê. Fina nînan het, Newala Çorî de obsid-yen<sup>8</sup> çinîyo.

Fina Newala Çorî de, parçeyêkê de tas vîneyayo, no parçe sîya kirecî ra virazyayo û sero hîrê kesî estê Nê kesî vanê qey destê pê tepîştê û ê ye govend gêne. Nê kesan ra didi merdim ê, jew heywan o. Deme verî merdimî û xweza pîya bî, bi her babetî. Kes şeno vajo ke, aqilê jîyan de înan ekolojîk o. Ma fina aqeyrê tasêra xo ser; Hauptmann vano ke beno zî nê bibê sifteyê govende. Tarîxê govende o verêyin beno zî no bo. ( Bnr: Wêne yê 6.)

Aqilê kesî nêgîno ke no hendayê tarîx, binê aw de bimano. Labrey no cayo wina şênayeya tarîxê, nika awa barajî bin de yo û merdimêy tarî de mendo. Girweyê ma zî, çendik destê ma ra bêro, ma do ney bîyarê zîwan.

#### ÇIME;

- Schmidt 2007b; Klaus Schmidt, "Göbeklitepe-Yuvarlak Yapılar ve Kabartmalar", *12.000 Yıl Önce Anadolu, İnsanlığın En Eski Anıtları* Stuttgart: Theiss Verlag
- Hauptmann, H.2012; "Nevali Çorî", *Aktüel Arkeoloji*, Mayıs-Haziran 2012, 96-108,istanbul.
- Schmidt 2007; Klaus Schmidt, *Taş Çağı Avcılarının Gizemli Kutsal Alanı Göbeklitepe, En Eski Tapınağı Yapanlar*, İstanbul: Arkeoloji ve Sanat Yayınları.
- Hauptmann 2007c; Harald Hauptmann, "Nevali Çorî ve Urfa Bölgesinde Neolitik Dönem", M. Özdoğan ve N. Başgelen (Edt.), *Anadolu'da Uygarlığın Doğuşu ve Avrupa'ya Yayılımı, Türkiye'de Neolitik Dönem, yeni kazılar, yeni bulgular*, İstanbul: Arkeoloji ve Sanat Yayınları
- Tay; Türkiye Arkeoloji Yerleşmeleri
- Neolithic In Turkey Euphrates
- Özdöl 2011; Serap ÖZDÖL, *Tarih İncelemeleri Dergisi Cilt/Volume XXVI, Sayı/Number 1 Temmuz/July 2011, 173-199 'Çanak Çömleksiz Neolitik Çağda Güneydoğu Anadolu'da Din Ve Sosyal Yapı'*
- Terhorst 2012; Janina Terhorst; Philipps-Universität Marburg: *Die Ikonographie Bildlicher Darstellungen Des Neolithikums In Anatolien'*

<sup>5</sup> Arkeoatlas

<sup>7</sup> Terhorst 2012

<sup>6</sup> Schmidt, 2007

<sup>8</sup> Obsid-yen: Babeten sîya camina



Mahmut  
YUCEDAG

## KILAMA OSÊ HUSÊN AXA Û BEDEWÊ

### Destpêk

Meseleya Osê Husên Axa û Bedewê li herêma Semsûrê, li navçeya Kolikê (Gextê) pêk hatiye.<sup>1</sup> Evîna wan a ku him wek çîrok him jî wek kilam tê gotin, li gorî texmînan, di navbera salên 1925 û 1930î de qewimiye.

### Lehengên Meseleyê

**Osê Husên Axa:** Di sala 1890î de li gundê Horîgê yê Kolika Semsûrê ji dayîk bûye û di sala 1953'an de jî çûye ser dilovaniya Xwedê. Osê Husên Axa xwediyê gundê Horîgê ye û di rêvebirina herêmê de jî piştevaniya Mala Hecî Begê dike. Mala Hecî Begê xwediyên Kolikê yên wê çaxê ne.<sup>2</sup>

**Bedew:** Navê wê yê rastî Hor/Horê ye. Keçika Evdî Omer e. Ji gundê Keftira ya Kolikê ye. Ji ber ku pirr rindik û xweşik bûye, li şûna Horê jê re Bedew hatiye gotin. Wexta ku bi Osê Husên Axa re reviyaye, bûka şeş mehan bûye.

**Remê Çêrçeg:** Xulam/azepê Mala Hecî Begê bûye. Karên nav qonaxê kirine.

### Meseleya Osê Husên Axa û Bedewê:

Osê Husên Axa û Bedew li gundê Keftirê hevdu dibînin û dilê wan dikeve hev. Ji ber ku him Osê Husên Axa û him jî Bedew zewicî ne, pêkhatina mirazê wan ne hêsan e. Osê Husên Axa ji ber vê yekê qerar dike ku Bedewê bir-evîne. Bedew ji Osê Husên axa re dibêje, *'Ez jineke fodil im, dema te ez revandim min bibe bavêje paş maleke mêran, ku em xwe xelas bikin.'* Os jî dibêje, *'Min şûna te li cem Zê-*

*nelê (Zeynel) Hecî Begê hazir kiriye. Em ê xwe bavêjin paş wan.'* Bedew dibêje, *'Oso, ew mala dînreş, bêbext û gurniya êr, ez ê fodil im, ew ê min ji dest te bigrin û nedin te. Tu dixwazî min bibe bavêje paş Bozan Begê, ew mala mêra ye, xwediyê mêvanan û sifreya giran e.'*

Osê Husên Axa Bedewê direvîne û diavêje paş Mala Hecî Begê. Lê mixabin, gotina Bedewê rast dertê û ji ber hin nakokiyan (Xwesiya Osê Husên Axa, bi xatûna Mala Hecî Begê Zênew Xatûnê ve merivên hevdu ne. Xwesiya Osê Husên Axa naxwaze hewî were ser keçka wê. Loma ji Zênew Xatûnê re xeberê dişîne da ku Bedewê li zavayê wê mehr nekin) Mala Hecî Begê, Bedewê jê distînin û Osê Husên Axa hepis dikin. Mala Hecî Begê, Bedewê li azepê xwe Remî Çêrçeg mehr dikin.

Li gorî rîwayeteke din Osê Husên Axa, Bedewê ji bo Hemdiyê Mala Hecî Begê direvîne. Lê malbata Mala Hecî Begê vê revandinê qebûl nake, Zênel Beg dibêje ku: "Em sermîyanên vî welatî ne. Revandina jinên bimêr bi me ra şermeka mezin e. Zênel Beg dibêje ku: "Bedew, Hemdiyê Mala Hecî Begê nerevandîye, Osê Husên Axa revandîye." Osê sucdar dikin û Osê hepis dikin. Bedewê jî li qonaxa xwe dikin xizmetkar.

Di vê meseleyê de rîwayeteke sêyem jî heye: Osê Husên Axa dostê mêrê Bedewê ye. Şevêkê li gundê Keftirê, li mala wan dibe mêvan. Os, wexta şefeqê ji malê derdikeve ku biçe lê di rê de ferq dike ku Bedew li pey wî tê. Bedew ji Osê re dibêje ku: "Ji mêrê xwe xeyîdiye û diçe

mala bavê xwe. Os jî wê heta gundê wan Bevdolê dibe. Lê belê diya Bedewê hatina wan a bi hev re wek "rev" binav dike. Ji ber vê gotinê Osê Husên Axa fehm dike ku mesele wê şaş were fehmkirin û dibêje: "Çîngîni bi tasê ket êdî, revandin wiha nabe, wiha dibe!" Û Bedewê dir-evîne.

Osê Husên Axa tiştên ku bi serê wî de hatin distirê:

*"Halî daxa Bedew rindêy halî daxa*

*Soza te nedan kekê Nurê bavê Mihemed sekmanî mûdalye*

*Axayê Horîkê Osê Husên Axa*

*Berfêk barî Bedew rindê çiya dimiştin*

*Giregirê(n) Mala Hecî Begê li ser xaliyê Êcem rûdiniştin.*

*Hesreta çav û birûyên reş û belek, simêlên qeytan li hev û di re dihiliştin...*

*Bila Hecî Begê va yêka nekira serê mi*

*Bila xeber biçûya Horîgê*

*Bigotana lo lo Ded î malşewitiyo*

*Osê zêrîn, bavê Mihemed, kekê Nurê, heşaşê Horîgê, xortê çeleng*

*xwediyê simêlên kel, li qonaxa çinko, qapîyê zilmê*

*Dane ber qurşîna, bi ro kuştin..."*

Dawiya dawîn, evîna Osê Husên Axa û Bedewê têk diçe û di vê navberê de Mala Hecî Begê Bedewê bi darê zorê li azêpê xwe li Remê Çêrçek mehr dikin. Kilam ji aliye Osê ve bi devê Bedewê dewam dike:

*"Lo Oso qurba çima te ez nexwastim, te revandim*

*Te kirim mastekî ji mastê miya, (di) ser re qeymax xwarin, binve herimandin*

*Te kirim marekî nîvkuştî li çatiriya terikandim*

*Tu bi wê nesekinî, te birim ber Ça Gextê, Çemê Hamilê sê ro sê şevan digerlandim*

*Meraqa te bi wê jî def nebû, te anîm gundê Kolikê li qonaxa çînkî ji arê cin û periyan qelibandim*

*Te mînanî koçekê Dêlî Elîya li huzura*

*Zênew Xatûnê reqisandim"*

*Xwedê bişewitîne Mala Hecî Begê*

*Soza mi dane Remê Çêrçek;*

*Kusiyê kepira*

*Roviyê newala*

*Kundê kulîna*

*Beqa sitamî*

*Kavirê gêjekî*

*Pisikê va mitfaxa*

*Soza mi nedane bavê Mihemed, kekê Nûrê heşaşê Horîkê, xortê çeleng*

*Sekmanê modalyê, xwediyê simêlên kel Osê Husên Axa..."*

Di lêkolîna ku me kir de, du varyantên/guhertoyên kilamê hatin tesbîtkirin. Varyanta yekem dengbêj Mahmut Çinar, ya duyem Azyerî Remî Bekişê (Abuzer Aşkinses) distirê. Ew varyant digel taybetiyên devoka herêmê, bi Kurmanciya standart wiha ne:

### Varyanta Yekemîn

*Nemînim, nemînim, nemînim, nemînim, nemînim, nemînim*

*Osmano qurba, tu kevota oy min î kedî*

*Ez ê wele li va deşta jêrinî çex bûm, mi yêkî mîna Osê Husên Axa yî camêr î (bi) dert-kul nedî.*

*Lo zalimo were di zikê mepûsxana Meltiyê bê qetilo, lo çûyî ebedî*

*Mi li deşta jêrinî dest axlera de lo nemînim, law nemînim, law nemînim, lo mi bela xwe dî*

*De werêy, werêy, werêy, werêy, law mi bela xwe dî..*

*Ê lo bila deşta jêrinî para dilê min û te ra bişewite, way li min lo, ya bi kizin e*

*Cûzê welatê me berda bûn, nizam meşin bû, ku bizin e*

*Mi carê bidiya xelatên min û te va bela kirin*

*Dohla min û te ve Bed heyrano, lê dixine*

*Siyarê rabûne li mihebeta dilê min û te ra, li cirîdê hê dilzine*

*Ê carê mepûsxana Meletiyê xelkê qal dikir,*

*mi digo, min qeling sax kirîye; dusid mecîd, lo nod bizin e*

*Wele mi nizarî taliya xirab û bejna narîn, xelkê min î kubar*

*Serê soniye ji xelkê re siyar kirine*

*Ê lo zalimo çima te bi emrê Xwedê nexwastim, şerê Şeytên tew revandim.*

*Te kirim dîl(a) destan û der bi dera nav xelkê alemê, lo te gerandim*

*Te kirim pîra du goçerê biharê, li oqîşê Sincikê*



li welatê Gelgoçê, li dû qîzek û bûka, law te behicandim.  
 Law zalimo te kirime marê nîvkuştî, serê xaçiriya terikandim  
 Te kirim hevinê dest qîzek û bûka ay nemînim  
 Ser va xwarin, şiyar(?) bûn sarya sibê bin va herimandin  
 Te kirim dara orta mêşê, li Helûfê, ar berdayê, law şewitandim.  
 Te çima birim serê soniye xelkê, ê dû xatûna  
 Mîna azepê Remê Kekilê ra oy oy oy terikandim  
 Ay de nemînim, nemînim, nemînim Osmanok e' nemînim

Ê lo bila Horîg bişewite para dilê min û  
 te ra law Osmano qurban law bi neqew e  
 Ava çaw û kaniya têtê, ke nemînim law bi ser hew e  
 Eşq û muhbeta xelkê gî hat şûnê ya min miha çavê reş û belek,  
 bejna narîn, oy li min ku derew e  
 Ay de werê Osmano qurba derd-kulo, lo mi tew nedî...

### Varyanta Duyemîn

Osmano qurban gula berê bostana, lo li navî baxa  
 Bejna te min ra zirav bû, dîreka, kekul banû lo li ber çardaxa  
 Dişewitî çira zikê qesra, lo li ber qonaxa  
 Heyrana guliyê sor, bejna Bedê, peyayê Gêxteliya Osê Husên Axa

Bê Osmano qurba, Bed heyrano oy oy lo te helandim  
 Gowdê mi bu qeymaxê mêst û ber destê kewaniyê,  
 lo hêla biniyê herimandim  
 Ez heyrano te (bi) emra Xwedê nexwestim,  
 bo şerê Şeytên oy lo te revandim  
 Te kirim dîl(a) destan, (li) nav cim û cahîlan lo te gerandim  
 Şeva îne birim qonaxa cî welatê Gexta, xelkê ra oy oy lo terikandim

Ez bi qurbano deşta jêrinî Osmano hêla biniyê lo wer kizin e  
 Hoz û keriyê welatê me berda, ûy ûy, meşin mî lo wer bizin e,  
 Cê mi carê vemirikê bidiya dol û duguna Osê Husên Axa Bedê lo,  
 lê dixine  
 Gênc ê rabûne mihbeta dilê min û te, lo dilîzine  
 Qelingê mi sax kirin; dusid mecdî ye  
 Ez qurbano oy oy lo sed bizin e, oy oy oy...

Ez qurbano bira Horîka xopan hêlê biniyê,  
 lo dilo qurban oy oy lo wer neqew e  
 Ava ça û kaniya, genco, bi kurmatê (?) lo wer ser hew e  
 Sereka qîzek bûka l'welatê me şewitiya, lo gî Bedew e  
 Zewqa dilê gî hat şûnê, ya mi eşqa dila, oy oy lo bu derew e

Lo dilo qurban Diyarbekira xopan oy ûcê dinê  
 Lê rindêy zimanê mi qerimî, navî lê tew gotinê  
 Diwê destê xwe mi de em bigerinî çar paytexta hewesa dinê  
 Ar têkeve mala şeytanê xira bikin alixa mêr û jinê  
 Min derdê dinê gî rawartin,  
 eşqa mi derdê dila guliyê sor û lo raketine...

### NÎŞE

[1] Şoreş Reşî dibêje ku çîroka Osê Husên Axa û Bedewê ixtimal heye ku li Rihayê qewimî be. Ev texmîn şaş e, lewre mesele li Kolikê pêk hatiye. Bnr. Reşî, Şoreş, Stran û Awazên Anatoliya Navîn, Weşanên Ar, İstanbul, 2013. r.22.

[2] Mala Hecî Begê mezinên eşîra Rişwan/Reşî/Reşûyan in. Hecî Beg ango Hecî Bedîr Axa ku navê malbatê bi navê wî tê xwendin, di navbera salên 1872-1928'an da jiyaye. Wî di şerê rizgarkirina Anatoliyê de, bi hêza xwe ya çekdar alikariya Mistefa Kemal kiriye. Ji bo vê yekê ew di Meclîsa Yekemîn de bûye mebûsê herêma Meletî û Semsûrê. Siyasetmedar Hemreş Reşo û Dengîr Mîr Mehmet Firat neviyên wî ne.

[3] Bnr. Şoreş Reşî, h.b. r.22.

[4] Lawê Osê Husên Axa Omer Yildirim dibêje; bavê min dengbêj bû û kilama Bedewê, cara yekemîn ji aliyê bavê min ve hatiye gotin û ji pişt re jî dengbêjan ew kilam li gor xwe gotine û li heremê belav kirine.

### ÇAVKANÎ

► Şoreş, Reşî: *Stran û Awazên Anatoliya Navîn*, Weşanên Ar, İstanbul, 2013.

► Omer Yildirim, Lawê Osê Husên Axa ye, li Kolikê dijî.

► Varyanta Yekem, Mahmut Çinar, <https://www.youtube.com/watch?v=B9Dm uwMCJwI>

► Varyanta Duyem, Abuzer Aşkinses (Ayzerî Remî Bekişê) ji arşîva Evdî Hesqera.

# BERSİVDANK

Xaçpirsa Çekûyê Pêver

